

# folklor kurdan

Zargotin zêrgotin e,  
Zêrgotin zorgotin e!

Sal: 1  
Hejmar: 4  
Çiriya Pêşîn  
Çiriya Paşîn  
Kanûna Pêşîn  
2015



ŞAREDARIYA BAJARE  
MEZIN A AMEDÊ




KURDÎ-DER  
NAVEND

*Xelil Xeyali*  
(1865-1946)





- **Kovara Folklorê ya Sê Mehane**
- **Sal:** 1 **Hejmar:** 4
- **Xwedî:** Li ser navê Şaredariya  
Bajarê Mezin a Amedê,  
Gultan KİŞANAK
- **Edîtor:** Eşref KEYDANI  
Ronya BEWRAN
- **Redaksiyon:**  
Ridwan DÎZMAN
- **Berpirsa Nivîsan:**  
Zeyneb YAŞ
- **Desteya Weşanê:**  
Mahpûs SERHEDÎ  
Şemsa ÎLBAS  
Weysî ARCAGOK  
Asmîn ÜYANIK  
Mem MUKRIYANÎ  
Jêhat ROJHILAT
- **Berga Pêşîn:** Gazi ÇAĞDAŞ
- **Wêne:**   
Ferhat ASLAN  
Refik TEKİN  
Adem SÖNMEZ  
Fatoş KOYUNCUER  
Umut Bilal GEZER  
Abdurrahman GÖK
- **Xêz:**  
Yusuf ALKAN  
Kawa (Engin KAYA)
- **Çap:** Gün Matbaacılık  
Beşyol Mevkii Akasya Sok. No:  
23/A Küçükçekmece İSTANBUL  
Tel: 0212 580 63 81



## PÎNE

Pînehezino,  
Di hejmara me ya sêyemîn de, çîrokeke balkêş a  
bi navê "Pixco" heye. Me paşnavê amadekara vê  
çîrokê çewt nivîsiye. Navê di rûpela 36'an de divê  
Yasemin ERBAN ne, "Yasemin ELBAN" bûya.  
Her wiha di rûpela 47'an de, paşnavê berhevkarî  
ne "Bîlîz" divê "SERHEDÎ" bûya.  
Em wek "Desteya Weşanê" lêborinê ji wê û ji wi  
û ji we dixwazin.  
Bi hêviya ku pîneyên me tune bin.

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

## Têkilî:



- 3 Ji Edîtoriyê  
4 Cil (kinc) û Xemila Neteweyî ya Kurdên li Navenda Anadolê, Şoreş REŞİ  
10 Mele, Zozan BUDAK  
12 Dudî, Mehmed NÊŞİTE  
13 Kermê Birîsimî, Nazîf ÇAKIR  
14 Ferhenga Rezvaniyê (3), Dawûd Gulsun BAGÛRÎ  
18 Ebas û Heblê, Yasemîn ELBAN  
23 Gavan û Paşa, Ayhan YILDIZ  
27 Bizinê Meta Fatê, Mahpus SERHEDİ  
29 Dua û Zewt, Leyla GULTEKÎN  
31 Gotinê Pêşîyan ên li ser Payîzê, Ronya BEWRAN  
32 Li Mezopotamyayê Pêvajoya ji Niştebûna  
Warêن Ewil ber bi Bajarîbûnê ve, Özlem EKİNBAŞ  
36 Nifir, Asmîn ÜYANIK  
37 Di Gotinê Pêşîyan da Xwedê, Bahoz BARAN  
40 Seydayê Tirêj, Mem MUKRIYANÎ  
44 Mast û Sed Caran Mast, Dilan ŞEWÊŞOXLU  
47 Serpêhatiya Mala Kapreşîyan, Pinar Çakin YAMAN  
48 Dimsa Torê, Nasir ASLAN  
50 Eloyo Zirker, Derman UNGUR  
52 Peyayê Sivik, Kurdjan SORÎ  
60 Kela Dimdimê, Mustafa BORAK  
68 Birzo û Felemez, Rêdi SEÎD  
80 Gulal, Ridwan TAY  
82 Li Gundê Eynê Şanoyeke Gelêrî: Kurtê Kelaşan, Muhammed Hêja KAYRAN  
83 Hewt Beranî, Zehra GULTEKÎN  
84 Şah Îsmail, Feratê DENGİZÎ  
89 Kayê Çünçûwayî, Deniz MAYA  
90 Damîrî, Lorîn ZAZA  
91 Birayo Aqil û Birayo Delû, Zerweş ESNAW  
94 Pêşwaziya Zivistanê, Sevgul ŞAŞMAZ  
98 Çirokêن Navlêkan(3), Mem MUKRIYANÎ  
102 Xaçepirs, Ronya BEWRAN



## Xeberxwesino.

Payîza ewil, bi aîsor û şekoke/karçınan xwe da ber derîyê me. Û ji me dixwaze ku em ji avahîyên siftobûyî derkevin û li pelên zer û sor ên diweşin binêrin. Nêta wê ji ew e ku em bizanibin wa ye payîz hatîye û wextew e ku em "dewê payîzan bidin ber ezîzan."

Camêrîno, wextew xwe ye; de rahêjin das û bivir û tişt miştên xwe û herin hazirîya zivistanê. Ji bo firavînê ji nema bêñ. Dê dayîk an ji canikên we bi xêr wextê nîvro ji we re firavîna we amade bikin, di nav boxçikên gulgulî de girê bidin û dê bidin zarokelî û bişînin. Hinek ji berêñ xwe bidin cot. Lê ne bi traktor û nizam çi miyan; hema haletê xwe biavêjin paş gayen xwe yên bor, nîrêñ xwe bigirin û herin. Dê firavîn ji we re ji bê heyran. Ma çi gotine mezinên me an ji pêşiyên me; destê bikér bidin ser zikê têr. Piştî ku destê we bikér, zikê we têr bû; qurték ava cemidî ji kanîyeke welêt vexwin; ê de ji vê xweşteř!

Dayikino, de rabin! Şîr di pêz de jixwe nemaye, qene xwe bigihînin şîrê bizinan. Bizina kol ji li benda we ye ya bi boç/qiloç ji. Nebêjin em ê bi erebeyê herin, de rabin hespêñ kumêt berdin ji tewlan û kerên boz derxin ji axûran, berê xwe bidin çol û beyaran. De belkî di rê de hûn rastî darguhîjekê bêñ, rastî dartawîjekê bêñ û me hişyar bikin ji vê xewa mirinê. Lê hûn qedrê Xwedê dikin, hema mîna tibarekê hinekan bixin paşila xwe.

Canikino, nebêjin ne xema min ne wexta min çeqçeqa benîştê min e; welleh û billeh û tilleh wexta ji wexta we ye xem ji xema we. Em nabêjin bila qırçeqirça benîştî ji devê we kêm be, em dibêjin bav û birayên we çûne ji malan, hûn ji bikevin nav ka r û baran. Heke tîr û text hebe herin ber dîwaran bikevin ber şikeva heke tune be bikevin ber tenûran. Nebêjin em ê herin fîrinê bikirin. Na nabe, ma bav û birayê we yên ku bi gê çûye cot û bi das û bivir çûye daran; dîya we ya ku terka erebê kirîye û hesp ajotîye çol û beyaran bi nanê fîrinê razî dibe. Dibe ku hûn nizanibin lê bêhna nanê we niha di firnikên gellek kesan de bêhneke efsûnî ye. Wan gulîyên xwe yên badayî, mîna reşmaran bavêjin paş piştê û bêjin ya Xwedê û rabin.

Folklorîstino, camêr çûne nav dar û erdan, dayîkan ji bo bêrîyê hesp derxistine ji tewlan, canikan rahiştine tîr û text û teşt û beşan berê xwe daye argûn û tenûran; ava sar li cem camêran, guhîj û tawî li cem dayîkan, nanê me yên kurmançî li cem canikan û hûn ji rûniştine li malan; sibê heta êvarê dikin gazin û hewaran.

Pêñusek û kaxizekê, heke hebe denggir û qamerayekê ji hildin. Her çi tiştê we dît û bîhîst binivîsin û bikêşin û bişînin ji me re. Lê ji bîr nekin, wan ci got, wisa binivîsin; ne kêm ne zêde. Ü agahîyên derbarê camêr û canik û dayîkan de bêkê-masî binivîsin da ku navê wan li dinê bimîne. Cî û warê wan diyar bibe.

Bi hêviya ku hûn vê payîzê û hemû payîzan, vexwin ji wî dewê ku didin ber ezîzan.



# Cil (kinc) û Xemila Neteweyî ya Kurdên li Navenda Anadolê

Şores  
REŞİ

Cil û bergên Kurdan jî ji wê karesatê para xwe girtiye. Wekî tê dîtin li her aliye Kurdistan'ê û dervayî welêt Kurd, xwedî gellek cil û bergên cuda û rengin in. Her herêmê teybetmendiya xwe heye. Heta niha lêkolînê li ser van, sedemêن cudabûna wan, wate û rengên wan nehatine kirin û muzeyên pêwîst nehatine vekirin.

**g**elek kes hemfikir in ku Folklora Kurdan dewle-mend e. Bi rastî ji dema mirov li nav civaka Kur-dan digere û hinekî ji nêzîk ve dişopîne, dibîne ku folklora me ya devkî û civakî wek deryayekê ye, lê mixabin heta niha me ew wekî ji me tê xwestin derbasî ser kaxizê nekiriye, tomar û lêkolînê za-nistî li ser nekirine. Ji ber wê yekê gellek stran, çirok, metelok û serpêhatî winda bûne û dibin. Bi wê yekê re giredayî, gellek hunerên me yên des-tan, gellek cureyên kirarı û xalîçeyan, çinê wan û tiştîn jinan yên ji bo xemilandinê bi kar dianîn ji winda bûne û dibin...

Yênu ku winda dibin ne tenê yên ku me li jor anîne zimên in. Cil û bergên Kurdan ji ji wê karesatê para xwe girtiye. Wekî tê dîtin li her aliye Kurdistan'ê û dervayî welêt Kurd, xwedî gellek cil û ber-gên cuda û rengîn in. Her herêmê teybemendiya xwe heye. Heta niha lêkolînê li ser van, sede-mên cudabûna wan, wate û rengên wan neha-tine kirin û muzyeyen pêwîst nehatine vekirin. Gelo sedama cudabûna kinc û rengan ci ye?

Li ser bersiva vê pirsê, min lêkolîneke ilmî nedîtiye, lê mirov dikare wek sedemên bingehîn bandora erdnîgarî, olî, êlî, aborî û karê rojane bihêjmære. Heta mirov dikare bandora netewe-yên cîran ji lê zedê bike. Vana her yek ji aliye xwe de bandorekî li ser şikil û rengê kîncan dikin. Eger tu li herêmeke çiyayî dîji, gerek cil û bergên te li gor şertên çiyê bin. Ango pêwîst e rihet bin, fireh bin, ji helkiştin û dêhatina çiyan re müsaât bin. Faktora olê ji di alî reng û girtinê de xwe dide xuyakirin. Di hinek olan de hinek reng maqûl nayêñ dîtin. Wek mînak; eger tu Misîlman bî rengê sor zêde ne maqûl e; ew rengê kesk tercîh dikin. Eger tu Êzidî bî rengê şîn nayê tercîhkirin. Eger tu Sorsor an ji Elewî û Şîa bî rengê sor der-dikeve pêş. Sergirêdana mirovan bi taybet ji ya jinan ji bi wê yekê re girêdayî ye. Dîsa her êleké kîncêñ xwe taybet hene û mirov di cil û bergên wan re dizane ku ji kijan êlê ne. Aborî yan ji karê rojane ji li ser kînc û bergen bandoreke mezin çê-dike. Eger tu dewlemend bî qumaşê hevrîşim û zer wek tiştîn xemilandî bi kar tê, lê rewşa aborî ne baş be ew dibin zîv an ji pîlik û qumaşê caw. Bi karê rojane re girêdayî hinek herêm kin-can bixwe didirûn an dihûnin, lê hinek herêm ji cawê hazir bi kar tînin.

Di vê nîvîse de, Kurdên li navenda Anadolê dijîn ez ê têxim navenda çavderiyê û em ê awirekî

bidin cil û bergên wan. Kurdên li nava Anadolê di navbera bajarêni Eskîşehrî-Qeyserî û Sewas, En-querê-Qonya û Qeremanê de dijîn. Zaravayêñ Kurmançî, Kîrmancî (Dimîlî) û Şêxbizinkî-Kurdeki (Lekî yan jî Lorî) diaxivin. Nêzîkî du milyon Kurd in û herî kêm 320 sal in ku li herêmê dijîn. Dema mirov ji aliye dirokî, erdnîgarî û êlî de lê mêze dike; Kurdên li navenda Anadolê, yên Efrîn, Koban, Dîlok, Riha, Germiyan(Mereş), Semsûr, Meletî, Dêrsim, Qers, Erzîrûm, Agîrî, Kurdên li Sowyeta kevn, Xorasan (Îran) û beşek ji yên li Amedê ji heman êlan in û dîrokeke wan a hevbeş heye. Ango bi hev re tev geriyane û heman eşîr li ser wê erdnîgariyê parçê bûne. Niqta balkeş ew e ku Kurdên ji heman êlê, di nava wê erdnîgariyê de xwedî cil û bergên cuda ne.

## JIN

### a. Ser:

Jinêñ Kurd ên li navênda Anadolê, bi taybeti keçik û bûkan di serdema rabirdû (pêş salêñ 1950'î) de serê xwe wiha girêdida. Di destpêkê de kulavekî mîna kumekî bilind bi bendik tê amadekirin. Ew li bin çengê bi bendikan tê girêdan ku nelive û ne-keve. Navê vî li hinek herêman "şara dalfes" e. Ew carinan dibe "kum" û carinan ji dibe "tas". Li gellek herêmê Kurdistan û li Anadolê heman tişt wek "kofi" ji tê binavkirin. Navlêkirina "tas"ê, dema ew şara dalfes peyda nedibû, tasên malan bi kar dianîn û ihtiâmaleke mezin e ku nav ji wê tasê tê. Piştî şara dalfes tê serî, taseke ji zîv didin ser wê. Pêşîya vê tasê bi zêran an bi zîvan tê xe-milandin. Ew tas ji bi şarekê li serî dihatin girêdan. Şarê bisirmê (pîlik an ji bi moriyan dihat neqîşandin) bûne. Ji vê yekê re "riş dibûnan" ji tê gotin. Li hinek herêman ji şarêñ rengîn ên bi to-qazân gir didan dorê.

Bi ser cenîgan de ji zêr berdidan; lê ew li gor rewşa aborî tê guhartin. Ew tişt wiha tê amede-kirin: Zêr li ser kulavekî didirûn, ew kulav bi şara dalfes de tê pêvekirin û bi qasî dirêjîya tiliya navîn ew dadiket xwarê. An ji ew zêr li ser serî bi hev de girêdîdan, bi ser rûyêñ xwe (cenig) de berdidan û heta ser çengê dadiketin. Piranî zêr bûn. Ji van re ji "kasêb/kesa" tê gotin. Ji herdûyan re ji "ke-saba zêrîn" tê gotin. Carinan, dora zêrêñ kasêbê bi hinek xelak an ji pîlikêñ büyük dixemilandin û ji wan re ji "rişme" tê gotin.

Wekî min li jor nivisi, li ser kofiyê şareke din di-

Canbegi-  
Kurmanc,  
Qonya



Kirmanc  
(dimili),  
Aksaray,  
ji arşiva  
O. Yuce



Çenge,  
li Laîn  
a Xorasan



gerînin ku tasa zîvînî bigire û ew nekeve yan neşimite xwarê. Pêşıya tasê, gor rewşa malê ya aborî zêr, zîv an jî pîlîkên ji hesin pê de dihatin kirin. Li dora Efrîn û Kobanê ji van zêrên li ser eniyê re "çuqur" tê gotin, lê rastiye kî heye ku yên herêma Efrînê yên serdema dawî piranî ji Tirkân hatine girtin.

Dîsa gor rewşa malê ya aborî, stûyê xwe bi morî, mir-can û gerdanan dixemilandin. Li jêr ew morî, li ser sîng jî rext e ku zîvînî (parçeyekî zîv, pahn û dirêj) bi pîstê xwe ve dikirin. Ji vî rextî çar tewak zîncîr diavêtin ser milê xwe û çar jê dikirin bin pişta li navê. Xeynî wan, rişikê bi qasî tilive girikê dirêj bi rext de dikirin û serê wan jî pûlén zîvînî pê de dikirin. Qurişen zîvînî bi zîncîran bi rext de dihatin girêdan.

Wekî li jor di wêneyan de jî tê dîtin Kurmanc û Kirmanck li navenda Anadolê, serê xwe wek hev dixemîlinin.

Dema mirov bala xwe dide êlên Kurdên li herêmê din wekî Xorasan, Qafqasya, Efrîn'ê dijîn, lê girêdayî yên Anadolê jî heman dîmen derdikeve pêşberî me. Kurdên li Xorasan, Dêrsim û Rojavayê Kurdistan'ê dijîn jî bi vî rengî serê xwe girêdidin. Li Xorasan'ê, tenê li herêma Laîn jin, zêr an jî zîvîn ku bihev girêdayî, dirêj li ser serê xwe û bin cenga xwe girêdidin û jê re "Çenge" tê gotin.

Mirov dikare bandora çanda Kurd li ser miletên din jî bibîne. Wek mînak: li Fîlîstîn, Qafqasya, Macarîstan, Berberiyê Maroko (Jî Qafqasyayê çûne) û rojavayê Turkiyeyê (Herêma Egeyê) jî bibîne. Li ser vî bingehî mirov dikare bi dilrihîtî bibêje ku navend û kaniya wê çandê Kurdistan û Kurd in. Ew bandor ji cîrantîyê, têkiliyên dîrokî û ji hêza çanda Kurdan e ku ji hezaran salan de maye... Mirov şopa wê yekê li serdema kevn a Anadolê û li bajarê Truva'yê, di nava Hîtît û Hatîyan de jî dibîne.

#### b. Pê/Ling:

Kurdên li navenda Anadolê jî sol an jî pêlavaren re bi giştî dibêjin "meris". Demêñ berê ji hinek cureyên merisan re "çarix", "kalos", "lapçîn" û hwd. jî digotin. Di roja îro de navê giştî meris e û cureyên kalos û lapçînan jî holê rabûne. Wekî tê zanîn pêlava ku li herêma Hewraman tê çêkirin jî navê xwe "kilaş" e. Kalos formeke din a vî navî ye. Bi dîtina min navê meris, ji peyvîn "me" û "rîs" derketiye. Ango me bi rîs çêkir an jî ji rîs hûnand. Wekî kilaş a li Hewraman çêdibe. Wekhevbûna van navan mirov dikare di sê xalan de şirove bike. Ya yekem, yekbûna bingeha zimanê Kurdi. Ya din, Kurdên îro li nava Anadolê demekê li Şehîzorê (1265) jiyan û li wir fêri



Filistin



Xorasan-Kurmanc

jî belek bûn. Lê êlên Kurmanc ên mîna Canbeg û Sewêdiyan rengên sor û şîn tercîh dikirin. Li ser gûzikan, búzme bi lastikan dihate hev.

Bi ser wan de jî pêştmal-bervang berdidan û heta lin-gan dirêj dibû. Bi ser derpê de "zebûn" berdidan xwarê. Carinan jî wek "xeftan" bi lêv dikirin. Ereb jî jê re "keftan" dibêjin. Âlên li Anadolê demeke (1692) dirêj li Hama, Humis û Reqqa'ye jiyan... Ew nav, kê ji kê girtiye em nizanin. Zebûn jî sê beran pêk tê. Bera pan li paş û herdu berên din ên ziravtir jî li pêş, bi ser jûniyan<sup>(2)</sup> de dirêj dibil. Di lingan de jî keloş hebûn. Ji navê berjor jî binkirasek û kolcix-salte bizarî li xwe dikirin; salte piranî ji rengê sor dibûn û bi "qeytan"ê çîn çedikirin. Qeytan, zirriyê rengînî ku dibiriqû. Jinê Xorasan'ê, pêşîya saltên xwe hemû bi pîlikan (zîv an tenikê) dixemîlinin û ji wan re "pîst" tê gotin. Ango li ser sîng û navê pîlikan pê de didirûn û pir giran e.

vî navî bûn. Ya dawî jî, hatina Konfederasyona Cafan a bakur e... Di serdemâ berê de, di nava Kurdên li Anadolê dijîn de navên çarix, kaloş û lapçînê bi kar dihatin. Hema hema têyek wateyê. Li nava Kurdên Xorasan'ê heta roja îro li gundan xelk vana bi kar tîne û dike pê. Piranî ji çermê gayî çêdibin û bi çerbendikan li çîpa mirov tê girîdan. Di bin de gorê rîsînî dîkin pê, dişidînîn û pêla-veke qevî ye. Pêşîya wan zirav, tûj û pozxwar e. Em di tablo û heykelên jî Hîtît û Hatîyan manî de jî vana dibînin. Tê wê wateyê ku ew amûr û kevneşöpiyeke ji kalên Kurdan de maye.

**Goreyên Rîsînî:** Bixwe dihûnandin, piranî spî dibûn û bi rîsî reş jî çînê wan dikirin. Çîn piranî di kêlekan de, li ser gûzikan de dibûn. Ji bo zivîstanê sar destkireka<sup>(1)</sup> mu-kemel e. Dema ew goreyên qalind di kaloş, çarix û lapçînê xwe de dikirin pê, çerbendîkên wan li dor çîpa xwe, li ser goreyan digerandin ku berf û serma derbasî hundir nebin. Li Xorasan'ê ji goreyan re "kurik" tê gotin û piranî bi rengê sor tê çêkirin.


#### c. Dest:



Wekî goreyên rîsînî, ya ji bo destan têyî hûnandin re navên mîna: "pêçik", "lepir" an jî "destkêş" bi kar tînin. Ji rîsî hiriya pêz çêdikin. Rengê wan piranî spî û reş e.

#### d. Beden/Laş:

Jinan di bin de hévalkiras-der-pêyekî dirêj li xwe dikir. Ew; dirêj, fireh, rihet û piranî rengê reş an



Şêxbizîn

Li ser zendar jî "qolcix" hebûn Ew, him ji bo xemilandinê him jî ji bo parastina qirêjê bûn. Dema kar dikirin qolcix dikirin ser zen-dên xwe ku saltê û kirasen wan qirêj nebin, lewra qolcix şûştin hîn hêsanter e. Gellek caran ne tenê di dema kar de, di jiyana rojane de jî bi kar dia-nîn. Navê "qolcix" dibe ku ji Tirkî hatibe. Lewra "kol" bi Tirkî tê wateya mil.

Nav jî bi pişta terêbûsê dipêçan. Piranî rengê wê sor û bi çîn bû. Keçik û bûkan piranî zîncîrên zîvînî didan nav-tengê xwe. Bi ser wan de jî bervangeke pahn û dirêj didan pêş xwe.

Mirov wê niqtê jî bide ber çavan baş dibe ku ew kincen em tarîf dîkin ji bo jinan e. Dema keçik, genc an jî ezeb bin zebûnan li xwe nakin. Wê demê tenê fîstanê rihet, zêde ne dirêj, ne jî qut bûn. Fîstanê jinê li Xorasan'ê pir giran in û bi dehan mîtro dirêjîya (25 m.) wan li ber hev tê şîkandin û dibin çirtik. Dîsa li Xorasan'ê keçik devê xwe nagirin lê dema diherin mîr an jî dizewicin çarika xwe didin ber devê xwe û digirin.

[1] Karê destan, hunera destan

[2] Cong

Di nava Kurdên li Anadolê de hinek cudahiyên kincan jî derdikevin pêş. Kincêñ Kurmanc û Şêxbizinan wek hev in. Yêñ Şêxbizinan yên pêş salêñ 1950'an dişibînin yên konfederasyona Cafan. Piştre, bi hinek guhartinêñ biçûk ew wek yên Kurmancan xuya dikin. Li hember wê yên Dimiliyan cuda ne. Li cem Dimiliyan zebûn nîn e, şal hene û wek donan e. Ew jî bi erdîgariya jê hatine ve girêdayî ye, lewra şal hem pratîk, hem sivik û hem jî rihet in. Zebûn pir bi zahmet, giran û xérce wan zêde ye. Şalêñ Dimiliyan wekî yên Dêrsim, Amed û Mereşê ne, lê yên Kurmancan dişibînin yên Sêwas, Dêrsim, Xorasan'ê û pir nêzîkî hev in. Ferq di cudabûnêñ hindik û ren-gan de derdikeve holê. Kurdên li Anadolê rengê sor pir hindik li xwe dikin, lê parçeya elâ wan a li Dêrsim, Sêwas û Xorasan'ê rengê sor tercîh dikin, lewra ew Sersor-Elewî û Şia ne... Rengê sor li cem Kurmanc û Şêxbizinan winda bûye. Li cem Kirmancan pir kêm be jî maye. Keçik û gencêñ Dimiliyan sor tercîh dikin û hema hema wek yên li Xorasan'ê ne. Temen mezin rengên tarî li xwe dikin. Ew jî bandora dînî ye, lewra Kurmanc; Sunnî-Hanîfî, Lek; Sunnî-Şafîî ne... Dîrokzanê Kurd Îzadî dibêje: "Eger Kurd misilman nebûna, iro kincêñ xwe dê wek Kurdên li Xorasan'ê bûna." Bi dîtina min jî ew rast e. Bi bandora ol, jinan xwe zêde pêçaye û kincan rengên xwe orîjinal-resen winda kirine.

Di sala 1960'an de qaymakamê li Cîhanbeyîl yê Tirk bangî keyayan-muxtarêñ gundan dike û jî wan dixwaze ku ew zebûnê jinan qedexe bikin û di cîhê wan de "don"an li jinan bikin. Ji wan salan bi şünde em dibînin ku êdî zebûn rabûne; iro bi temamî donê mîna çalan jin li xwe dikin.

## MÊR:

### a. Ser:

Piranî mîrân kum dida ser serê xwe û dora wî bi şareke dirêj û qalind dipêçan. Carinan jî kecêñ <sup>(3)</sup> zer didan serê xwe. Yen kal û piranî jî yên çûne Hec'ê ew rengê zer tercîh dikirin. Mîrân di demêñ berê de piranî kumêñ ji kulêv û sertûj didan serê xwe. Li Xorasan'ê, kumêñ wiha yên bi hiriya reş têñ çêkirin, dewlemend didin serê xwe û jê re "kumê qerê kol" tê gotin. Di serdemâ Med'an de jî ew kumêñ serê wan dirêj ên ji kulavan çêdikin hebûn.

### b. Pê/Ling:


Merisêñ xwe jî keloş û lapçîn bûn. Keloşêñ ji çerm dikirin

lingêñ xwe, ew hişk in, li ser goreyan bi çerm-bendê wê ve li dor çîpan girêdidin. Wekî me berê jî go-tibû pozê wan xwar e û ji serdemâ Hîttitan vir de tê bikaranan. Li Xorasan'ê, mîr parçeyeke qumêş a hattîye neqîşkirin li ser bewşî <sup>(4)</sup> ling li dor gore û derpêyên xwe dipêçin. Jê re "pêtav" tê gotin.



### d. Laş:

Mîrên Kurmanc, berê şalêñ navranfireh li xwe dikirin û "çûxên sê etek" bi ser şalwar-derpêyên xwe de berdi-



Xorasan

(3) Cureyekî kefî û pûşlyê  
(4) Derdora gûzeka lingî

dan. Derpê piranî ji cawê gewr çêdi-bûn. Ew etekê xwe heta textikî jûniyan an jî ji güzeakan dirêj dibûn. Ew kinc bi nexên rîsînî dihatin hûnandin û paşê jinan bi şijûnê bi hev ve kêt dikirin û li xwe dikirin. Ji jor de jî kirâs û êleg-ceket li xwe dikirin. Piştê terebûsên bi reng didan navêن xwe. Dîsa, "Yamçi" li xwe dikirin, ku ew kulavê bêmil e; li pişt û pêşiyê pişkov/bışkok lê dikevin û bi çerm hatîye qewîkirin; şivanan li xwe dikirin. Di heman şê-wazê de "Hewran/Hewramî" jî heye û hema hema herkesî li xwe dikir. Hewran jî çûx an jî ji kulêv dihatin çêkirin û piyên xwe qol in. Hem ji sermayê hem jî ji barêن giran mirov diparast. Navê wî balkêş e, lewra îro ew li Kurdistan'ê herêma Hewreman tê bikaranîn û nav ji wir tê, lê ew çawa hatîye nava Kur-dêن li Anadolê? Ev beşa Kurdan dema ji Xorasan'ê derbasî herêma Şehrîzûr bûn (1225) li wir fêrî hewran bûn... Di roja îro de ew jî nemaye.


Kincen mîrên Dimîlî cuda ne; wekî yên dora Amed û Dêrsim'ê ne. Û rengê wan reş e. Yên mîrên li Xorasan'ê bi cudabûneke gellek kêm wek yên ser-dema berê ne. Piranî rengê sor tercîh dikin, destkir û hevrîsim in. Dema di-zewicin li xwe dikin û ew kinc bi temamî sor in. Mirov dibîne ku hinek guhartin pêk hatine. Di wêneyên li jêr de jî mirov dibîne ku Kurdêن Dimîl û Kurmancêن li Xorasan'ê piranî kincen sor li xwe dikin.

Mirov dikare li wê yekê Kurdêن li dora Sêwas, Dêrsim'ê Sorsor-Elewî yên li Loristan'ê Şa jî zêde bike... Di demên berê de, li navenda Anadolê, kincen sor tenê êla Sewêdî li xwe dikirin ku ew jî Kurmanc in. Guman nîn e sor-bûna kîncan têkiliya xwe bi ola Sorsor-tiyê re heye. Dema ew Kurđi bo serokê xwe Eba M. Xorasanî rabûn serhildanê ala sor wek sembola tolhil-danê bilind kirin, kumê xwe sor bûn û ew kevneşopî di kîncan de hîn jî ber-dewam e.



# Mele

Berhevkar  
Zozan BUDAK



Zozan D.

Berê xelkê dan û savarê xwe bi destaran dihêra. Di wan deman de ji, jinikek û mîrê wê hebûne û bi jinikê û mîrê wê nebûne ku dan û savarê xwebihêrin. Jina mîrêk ji yeka zana ye. Jinik ji mîrê xwe re dibê:

- Tu işev heya berdestê sibê neyê malê, ez ê savar bi mele bidim hêran. Tu zanî ku nefsa melan tenik e zû têx xapandinê.

Dibe şeveq jinik li ber derî li hêviya mele ye. Wexta ku mele derbas dibe, çav pê dikeve dibê:

Lo meleyo, lo mele yo!

Îşev were mala me yo!

Ji te re xêr e ne gune yo!

Mele pey van gotinan hew dise û dibe êvar tê cem jinikê û li dor jinê diçe û tê. Jinik dibê:

- Meleko qurbana te bûmo! Ka heta ev savar li erdê be nabe. Gere em ewîlî savar bihêrin hê...

Û jinik kêt û nîv savar bi mele dide hêrandin. Mele indî ji pertal dikeve û reqîn ji bi derî dikeve. Jinik ji mele re dibê:

- Eman, yeman ku mîrê min te bibîne kes nizane wê çi bike ji me, zû xwe veşêre, têkeve pişt derî heta ku mîrê min derbas bibe. Bila ew tişt bîmîne rojek din.

Û ser de çend roj derbas dibin, jinik ji mîrê xwe re dibê:

Lo meleyo, lo meleyo!

Îşev were mala me yo!

Ji te re xêr e ne gune yo!

Roja din jinik dîsa çav bi mele dikeve dibê:

Lo meleyo, lo meleyo!

Îşev were mala me yo!

Ji te re xêr e ne gune yo!

Mele ji indî ne ew mele ye fam dike ku savar bi kevir e, dibê:

Herê hayê, belê hayê!

Te kêt û nîv savar bi min da hêrayê,

Qê nîv kêt maye ji qûna te û diya te nayê.

**Çavkanî:** Gulistan BUDAK

**Herêm:** Farqîn/Amed

## DUDÎ

Cinîya Silêman Pêxemberî ey rê vana ti mi rê pirçê teyran ra yew koşke virazenê? Pêxember na waştena cinîya xo ser o veng dano herme teyr û tûran. Înan rê vano bêrê gureyê mi şima dir esto. Teyr û tûri herme kewenê yewbînî dima heb bi heb bi dore yenî. Verê Goyina ride (beno ke kelaynak bo) yena pirçê xo nana ro şona. Dima keno ra dudî dima, dudî nêno. Hewa dijine reyna xebere wesêneno. Şinê reyna veng dano ci. Dudî reyna nêno. Vano: "Şêrê bikşenê mi rê bîyarê." Dudî ew-nîyeno ke kişîyeno yeno. Vano: "Ya Pêxember ez ameya ti dewa çî kenê? Ti vanê se?"

Pêxember vano: "Biewnî pêro teyrî ameyî pirçê xo do ro ti néameya."

Dudî vano: "Gelo nê teyr û tûri seba çî pirçê xo do ro."

Pêxember vano: "Ez cinîya xo rê pirçê teyran ra yew koşke virazena."

Dudî fetelêno ser

Vano: "Mi hisab kerdêne coka ez néameya."

Pêxember vano: "Hisabê to çî yo, to hisabê çî kerdênê?"

Vano: "Mi hisabê "Gonîyan û Merdan" kerdênê. Coka ez néameya."

Vano: "Merdî zaf ê yan gonî zaf ê?"

Vano: "Wile yewê gonan zaf o sey merdan. O zî ho binê emrê cinîya xo de."

Vano: "Heyyyy! Demek o zî ez a û ha binê emrê cinîya xo de. Wile raşt a."

Vano: "Wile ti yî. La ti çi şinê kenê ra no zimistan de veng danê teyran anê pirç kenê. Nikâ herme xeneqîyenê. Gunakî nîy. To heme ardê, pirç kerdê. Nikâ tek tira nêmaneno heme huşk benê şinê."

Dudî dano ra ke şoro, Sulêman Pêxember dest keno vano: "Bê!"

Vano: "Ti zaf biaqlî. Ez yew taca zerrênen nana sereyê to ser."

Taca zerrênen nano sereyê dudî ser, dudî şino. Dudî ke vazdano dano ra şono tûtî/domanî kewenê dima. Agêreno. Şino pêxemberî ver.

Vano: "Ney na tace mi sere ra we da. Tûtî nikâ mi kişenê."

Pêxember zî a taca zerrênen gêno û puşik nano sereyê ey ser.



# Kermê Birîsimî

Kermê birîsimî Îsayî ra verî Çin de dest bî mîqat kerdişî kerdo. Dî welate ma de emrê mîqat kerdişê kermê birîsimî 1500 serrî yo. Zafenî zîretî re yew gureyo hetkarî yo. Sermayegozarî yê ko pîl hevce nêkeno.

Keye de kede heme xort û extîyaran no gûreyî de ca gîyeno. No gûre mabênen 35 û 40 rojî de keye rê yew ameye yo baş arenô. Caye ko tuyerî est e. Ê cayan de kermê birîsimî yeno mîqat kerdiş. Sarçeyê Pasorî deme Osmanîlî de mîqatkerdişê kermê birîsimî de caye ko taybet girewtibe. Seba şerê ko Kurdîstan de vecîya. Welatê ma de mîqat kerdişê kermê birîsimî rapey şî. Agerayışê dewan ra pey şarçeyê ma no gûreyî de reyna aver şî û Tirkîye de cayo yewin girewt. Welatê ma de hakanê kermê birîsimî Kozabîrlîk tenê berardeno. Zafenî aşma gûlane de mîqat kerdenê. Cayê ko hâkî qip kunê , germ û rewayê ewca munasîp bo. Ganî odeyê de çî ko boy dano çinê bo. Hakî yenê ganî kerdenê û êy kê wazenê dayenê ïnan. Termê werînan de kermî 4 rojî baş mîqat kerdiş ra pey 1 roj rakewenê. No term ra wextê ciwanî yeno watiş. No term de pelî yene werdî kerdişî û dime ra dayenê kermî. Semedê ko kermî nêweş nêkewe. Kermî kîngâ rakewenê kils rişnenê ïnan ser. Kermî hewn ra seynî bene heşyar caye ïnan bedelyeno, gîyenê cayo paqîj û hera.

Dime ra wextî termê kermê birîsimî yê risayışî yeno. Henî kermî bîyi pîl semede mîqat kerdişî zaf pel wenê.No semed ra pelê xişnî yay ke xîlfê xişnî deyenê kermî. No term de zaf hewcê germî çin yo. Mîqat kerdişê ko baş ra dim kermî rakewenê hewna peyin.No hewno peyin 2 rojî yo. Raynê semede nêweş nêkewe serê ïnan kils rişnenê.Kermê kê heşyar benê ïnan gîyenê caye ko hera.No term 7 û 8 rojî yo û no dem de çîqa paqîji kermî û cayê ko hera bibo en kerm xûrt beno.Henî kîngê miyanê kermî de nîşanê birîsimî aseyâ, kermî gîyenê cayê kozî. Serê ïnan bi şawler, çeqçeqo, gez û yayke plastik erzenê serê kermî û hîwîyekê kerm henî bibo kozê. Kîngê kerm açerya be koze ïnan kom kenê û miyanê ce ra pirpirik nêweçîyo erzenê firne.

Nêweşî yê kermê birîsimî:

Weşkerdişê kermê birîsimî çin yo. Qeybê kermê ko xûrt tay gûreyî estê kê ma bale xo bi dê ïnan.

- 1) Germîyê ka zede
- 2) Serdiyê ka zede
- 3) Rewayê ko zede
- 4) Odeyê ka bê hewa
- 5) Cayê ko teng
- 6) Weyşanîyê ka derg
- 7) Pelo xirap
- 8) Ganî kermî bibo birîndar

Sarçeyê Pasorî û dorê ce de qasê 50 tonî kozê arêdayeno.

Ameye ko baş kuno destê dewican. Semedê no gûreyî ra Sarçeyê ma her serr avêr şina.

Nazîf ÇAKIR



# FERHENGÀ REZVANIYÊ<sup>(\*)</sup>

(3)

Amedekar: Dawûd Gulsun BAGÛRÎ  
Herêm: Erxenî / Amed

(\*) Ev beş, beşa dawîn a ferhengê ye.

Ev ferheng wek çar beşan hat weşandin. (Desteya Weşanê)



**Rawûk:** Ew şalê ku tirî tê de diguvêşin.

**Reqan:** Cureyekî tiriyyê reng e.

**Reşê tahnebi:** Tireyekî tahm miz e, mewijê wî şîrîn e.

**Reşik:** Ji babetê tiriyyê reş e.

**Reşmîw:** Mêwa tiriyyê reş; tiriyyê reş ê ku zû digihîje.

**Reşmîrî:** Babetekî tiriyyê reş e.

**Rez:** Bax û baxçeyê mîwên tirî, baxê ku çandinî û hibernandina tirî jê çêdibe.

**Rezber:** Meha ewilîn a werza payizê ye, ku gihiştina tiriyyê şîre di wê demê de temam dibe.

**Rezberdan:** Kandêlkirin.

**Rezeqî:** Tiriyyê dane gir ê hêkanî ye, şîrîntir e.

**Rezê merê:** Ew rezê ku baranên wî dirust nîn e, seran-ser tê merkîrin.

**Rezik:** Rezê bicûk.

**Rezin:** Cihê baxêñ tirî.

**Rezvan:** Kesê ku kar û barê wî li ser rêz be, xweyîkerê rezê tirî.

**Rezwar:** Rezvan.

**Rêhanî:** Cureyekî tiriyyê reng e.


**Rêzel/Rêzele:** Kimêyeka[parazit] giyayı ên badekîn e, wekî mü şîn dibe xwe li gulyan bi taybet şaxêñ teze di-pêce û pêve dizeliqe, heftekî de bi qasé benê qirnap qallind dibe, eger neyên temîzkirîn, wan hişk dike.

**Saban:** Cawê spî yê kinar dirûtî ye, ji bo bastêq malêzê têdidin.

**Sadanî:** Çeşidê tiriyeke xweş e.

**Saqol:** Seviya tirî.

**Saplê/Saplî:** Alaveka lajwerdî ye; bi wê malêzê ji sîtilê dertînin, şîre û mot berdidin firaxekî din.



**Sarme:** Zadêñ bi pêlmêwê şedandî.

**Satîl:** Amrazek derdana av û şîreyê, bi wê tirî jî dikêşin.

**Sepet:** Alavek tirî kişandinê ye.

**Serçimk:** Serê şaxêñ teze ye, ger dirêjtirîn bin havînê têñ jêkirin.

**Serî:** Tiriyyê di şal de guvaştî û bûbe hefil, ji her yekî re serî tê gotin.

**Serpene:** Ew darêñ serçetel in ku didin bin gulî û serte-yan.

**Serpeşiken:** Tiriyeke gûşiyêñ wî mezintirîn e, dane sert e, heta zivistanê dimîne.

**Serte:** Guliyen qalind in bi qurm ve ne; tiriyyê mîwên bê serte këmtir in.

**Sêlimate:** Hefla tirî ye paşî guvaştinê.

**Sim:** Parçeyên piçûk yên hişk in, ji şaxan yan jî ji gulyan dimîne, dema birînê têñ jê kirin.

**Simarte:** Hefil.

**Sincêri:** Cureyek tiriyyê ser navê Kurdan tê xwendin.

**Sincûq:** Kakîlêñ benvekirî ên malêzkerî ye, çend rojan de hişk dibe.

**Sindoq:** Amrazek textîn e, bi wê tirî dikişînin.

**Siney:** Cureyekî tiriyyê zû digihêje.

**Spîke:** Cureyekî tiriyyê spî ye.

**Sitewîn:** Baş gihaştina tirî.

**Sivnik:** 1) Cureyekî tiriyyê reng e. 2) Giyakî ji bo paqîkirina der û beran e; di nav zewiya rêz de şîn dibe, rîçika wê zortir kor dibe.

**Sixme:** Ew gûşiyê ku daneyên wî bi hev ve kîp be.

**Sîronge:** Tiriyyê mor ê hûr e, mewijê wî xweş in.

**Sîtil:** Beroş e, bi piranî sıfîrîn in.





**Sîtila ber kurn:** Ew beroşa ku didin ber çironeka guvaşgehê ye; li ber guvaşgeha textin welî curn jî dibe.

**Sîtila kergê:** Ew beroşa ku şîre tê de dikelînin, sîtila meztintir e û dora bîst lîtiran digire.

**Sorava:** Babetekî tiriye sor e û dane gir e.

**Sorbelek:** Cureyekî tiriye misewiq.

**Sorê bêdane:** Cureyekî tiriye sor e bêdendik e.

**Sorik:** Cureyekî tiriye sor e.

**Şal/Şalî:** Torbeya ku tirî tê de tê guvaştin.

**Şamî:** Ji babetê tiriye reng e.

**Şax:** Guliyêñ îsalî ne.

**Şehne:** Nobedarî û pasvaniya rezan.

**Şekirê tirî:** Gilîkoz.

**Şekrok/Şekirok:** Tiriyeke dane gilover e, hebêñ wî sixme û sert e, mewijê wî xweş in.

**Şeqşeqe:** Cureyekî tiriye reng e.

**Şerab:** Ew vexwarina serxweşker e ku ji ava tirî jî çê dikin, bi pirani ji şerabî tê hilberandin.

**Şerabî:** Tiriye reşê qaşık qalind e, ava wî zêde ye, şerabê jî jê çedikin.

**Şerbet:** Vexurka ku dims û av tevlihev kirine.

**Şingil:** Gûşikê tiri yê daketî yê piçûk.

**Şirt:** Gezika devî ye ku pê leng tê lihevxitin.

**Şitil:** Şaxên teze û yeksale ne.

**Şiv/Şivik:** Şitil.

**Şivanî:** Ji çeşidê tiriye serek e.

**Şilan:** Gula biyanî ye ku ji bo perçinê li der dora rezan datînin, fêkiyêñ wê jî wekî çay dikelînin û vedixwin.

**Şile:** Ava tirî ye.

**Şili:** Ava tiriye guvaştî.

**Şîr:** Adana dewar û pezan e, hinek berdidin nava şîreyê.

**Şirazî:** Babetekî tiriye reng e.

**Şire:** 1) Cureyekî tiriye spî yê qaşık tenik e, şîraniya rêz bi taybetî jî tiriye şîre çê dibe.

**Şîredar:** Tiriye ku şîreya wî zêdetir be.

**Şîrodims:** Şîraniya ku ji şîr û dimsê hişkirî çedikin.

**Şûvag:** Heflén tirî ye ku datînin kêleka guvaşgehê; jê sîrke û tîrşî çêdibe.

**Tahlik:** Ji babetê tiriye spî ye.

**Tahlîebî/Tahnebî/Tahnewî:** Tiriye spî yê zû derdikeve, qaşık tenik e, tam xweş û navdar e.

**Tanok:** Nanê li ser rêz tê xwarin.

**Tayfi/Tayfî:** Tiriye reşê hebdirej e, mewijê wî baş in.

**Tebax:** Meha raxistina tirî.

**Telbîs:** Nekmeya binê erdê ye ku bi baranê digihê qatê serê erdê.

**Teraf:** Hilkirina pîncikên ber qurma mîwê.

**Ternebî:** Babetekî tiriye reng e.

**Teş:** Legan.

**Tevir:** Alavekî asinî yê du dev û boç darîn e, pê çavî tê vekirin û qurm tê jêkirin.

**Tevrik:** Tevrê biçûk e; bi wî eşêv dibe, qurmik tê jêkirin û çavî vediye.

**Tewergejîle:** Ew tiriye ku kêmav û rengê wî spîcole ye.

**Tewrêzî:** Cureyekî tiriye reng e.

**Teyan/Teyman:** Xizmetkarê rez û bistanan.

**Têzav:** Zirk.

**Tihok:** Gûşîya tirî di dema gihiştinê de eger li ser mîwê wekî mewijî hişk bibe dibe tihok.

**Til:** Daneyê tirî.

**Tilik:** Gûşîka tirî, çıqêن tirî.

**Tilîzeyneb:** Ji babetê tiriye reng ê zer e.

**Tilî:** Parçeyên tirî yan jî çend hebêñ wî.

**Tilîdirêj:** Ji babetê tiriyê reng e û daneyên wî dirêj in.

**Tilîrêvîk:** Tiriyên hebêن wî hûr in.

**Tilîxatûn:** Cureyekî tiriyê spî yê dane dirêj e.

**Tilmisk/Tilmist:** Parçeyek ji gûşiyê tirî yan jî gûşiyê büçük.

**Tilote:** Gûşiyên tirî yên ku heta serê zivistanê dimînin.

**Tilove:** Ew mîwa ku tirî zêdetir girtiye.

**Tiriyê çîvîkan:** Tiriyê heb hûr û reş e, bêdendik e.

**Tiriyê çûçê:** Ew mîwa ku gûşiyên wê sêrek û dane hûrîn e, ango wekî moriyan e, nav de tek tûk hebêن gir hene.

**Tiriyê mor:** Tiriyê sorê tarîtir e û dane sêrek e.

**Tiriyê reş:** Tiriyê rengreş e, li mewûjî dere lê belê wekî wî gewreg nîn e.

**Tiriyê roví:** Seydoke.

**Tiriyê sor:** Cureyekî tiriyê sorê baş e û mewi-jan jî çê dikin; navê tiriyên rengê wî ser so-riyê be.

**Tiriyê şivanan:** Tiriyê dane sêrek.

**Tirî:** Fékiyê dara mêmê.

**Tirîçin:** Kesê ku tirî diçine.

**Tirîdan:** Li teniştâ guvaşgehê cihê kom-kirina tirî ye.

**Tirîfiroş:** Kesê ku karê wî firotina tirî ye.

**Tirîqurêf:** Tirîçin.

**Tirîreşik:** Cureyekî tiriyê reş e.

**Tirîrêvîk:** Seydoke.

**Tirît:** Şîva zadîn e ku bi pelên mîwan tê xwarin.

**Tırşî:** Hefla tirî li seradê dixin, dendikan jê derdixin, hefla mayî dixin kûp û avê bera ser didin, 40 rojî tê de dihêlin, dûvre derdixin û dipaşînin, hinek xwê, îsota tûj û sîr di-xinê.

**Tîrka mêmî:** Tayê mîwa tirî.

**Topspî:** Cureyekî tiriyê spî yê heb top e.

**Torçan:** Rezê ku ji bêxwedîtiyê yan jî ji nexweşiyê wê-rane bûye.

**Torik:** Zincîra şaxên teze ye ku bi gulîyan ve dipîçike.

**Tortor/Tortorî/Tortork:** Tiriyê reşê tilîhûr ê biyanî.

**Tuhmer:** Babetekî tirî yê reng e.

**Tûrtûr:** Ji babetê tiriyên rengê dane hûr e.

**Wankî:** Du cureyê vî tiriyê reng he ne; sor û zer.

**Weris:** Şîrîta mûyîn e bar pê tê girêdan.



**Werşî/Werşîk/Weşî/Wîşî:** Gûşî.

**Xanok:** Cureyekî tiriyê reng e.

**Xaşîlok:** Xuşîl.

**Xecit:** Xaniyê sade û yekçavî yê rêz.

**Xerz:** Rezê du sê salîn e, hîn tirî nagire.

**Xirpek:** Babetekî tiriyê reng e.

**Xopan:** Ew rezê ku ajotin, birîn û digel lêmêzekirin ne-hatiye kirin û bi vî halê sal ser re derbaz bûye.

**Xulf:** Şaxên teze ên ku ji qurman davêjin der, yên zêde ji bin ve têن jê kirin.

**Xumrî:** Tiriyê deqsor û reng spî yê dane sêrek e.

**Xuşîl:** Cureyek giyazerik e, mêsên hingiv jê hez dikin; ji bo zerkirina rengê dimsê bi çend têlên wê dema dikele hinekî tevdidin.

**Xweliya spî:** Ew axa ku wekî kilsê ye; bi wê qeşa şîreyê tê girtin, ji gend û gemarê tê paqîkirin.

**Xweşav:** Şerbeta mewij û qaxên kelandî û şîrînkarî.

**Xweşnav:** Ji babetê tiriyê reş e.

**Yarme:** Kesmê dan.

**Zelal:** Dawerivandîy qeşa şîrê ye; eger rokin temsiyekê û çend rojan bidin ber tavê, dibe wek hin-givê helandî.

**Zembûl:** Tilmiska tirî.

**Zeng:** Nexweşiya pel û tirî ye.

**Zengal:** Cingil.

**Zerdezêr:** Çivîkek rezan e, li ser mîwan hêlîna xwe çê dike, gelek deng xweş e.

**Zerik:** Tiriyeğî zor xweş û reng zer e, misawiq e.

**Zexel:** Biharê dema şaxdaniyê gulî qîsran nade movik cî de şîn dibe û ges nabe.

**Zeytî:** Nikulqijik

**Zilkê:** Cureyekî tiriyê reng e.

**Zirk:** Hinek xweliya daran li nav rûnê zeytûnê dixin û pê mewijan çêdîkin.

**Zîpîk:** Tofana esmanî ye ku qeşayê girover e; pir caran dema ku tirî di kepegê de ye dibare û rezan telef dike.

**Zulfi:** Şîrîniya ku ji mewij, findîq, kakilê gûzan û arvan çê dikin.

**Zûres:** Cureyekî tiriyê reng e, zû digihêje.

*folklor  
KURDAN.*

# Ebas û Heblê



Amadekar  
Yasemin ELBAN

Y. Elban

Carek ji caran xêr û xweşî bibare li ser hazır û guhdaran, bi tevê sêwî û bêmalan ji xeynî mişkên qulê dîwaran. Hebû jin û mîrek. Navê jînîkê Heblê û navê mîrik jî Ebas bû. Tenê keçeye wan hebû, ew jî li gundekî din dabûn mîr. Panzdeh rojêن wê qediyabûn ku mîr kiribû, divê biçûna serdana wê.

Wê rojê di serê sibehê de Heblê û Ebas radibin, diçin sûkê ji keça xwe re neh-deh metro çalisto, neh-deh metro pazêن û cotek qondere distînîn. Heblê, teşteke kade dipêje. Piştî kade pehtinê, sítileke tolme dipêce dixe hundirê tenûrê. Dibêje:

- Gava, ku em vegeerin bê, bila xwarina me amade be.

Têkberêni ji bo keça xwe kiribûn û bi tevî kadeyan, dixin nav boxçeyekê, didin piştâ xwe û dikevin rê diçin... Diçin, digihêjin binê gund, du-sê jinêñ mitrib rastî wan têñ. Heblê dibêje:

- Oxir be ji we re. Binêrin; em diçin panzdehiya keça xwe. Mala me wê li binê gund e, di tenûrê de sítilek tolme pehtî heye, nebe hûn biçin bixwin ha!

Mitrib dibêjîn:

- Na, na xwişkê ma tiştê wisan dibe!

Ji mitriban derbas dibin. Qasekî dimeşin, rastî kosiyeñkî têñ, Heblê bi dilekî şewat, dibêje:

- Ebas, binêre ev rebena han, di vê sir û sermayê de, bi lingêñ pêxas digere. Ka ew qondereya me ji keça xwe re kiribû, em bixin lingêñ wî, guneh e!

Qondere ji boxçê derdixin û dixin lingêñ kosî. Dibe tiqerîqa kosî. Heblê û Ebas rêya xwe didomînin. Kêm diçin, zêde diçin; nêzîkî gundê keça xwe dibin. Ba û bahozek radibe, darêñ hewran dihejîne. Heblê dibêje:

- Ebas, ka binêre, darêñ hewran, çiqas dicemidin. Ji serman diricifin, ka ew çalisto û pazênen me kiribû, em li wan bipêçin, guneh in!

Boxçê vedikin çalisto û pazan ji boxçê derdixin û tev li dorêñ hewran dipêçin. Dûre meşa xwe didomînin diçin. Kêm diçin, zêde diçin digihêjin biniya gundê keça wan lê ye. Seyen gundiyan dibezinê wan. Heblê dibêje:

- Wax, wax, mîrik tu dibîni? Ev seyen han, çiqas birçîne, tequez wan bêhna kadeyan ji me kirine. Ka em wan kadeyan biavêjin ber wan, bila bixwin guneh in!

Boxçê vedikin ew kadeyên ji keça xwe re anîbûn, tev hûrhûr dikin û diavêjin ber seyan. Se li dora kadeyan ba-

leçe dikevin. Ew jî rêya xwe didomînin û diçin... Diçin diğihêjin mala keça xwe. Sedema hatina bi dest valahiya xwe ji keça xwe re vedibêjin. Keçik bi hatina wan kêfxweş dibe, lê xem naxwe, ji ber ku mala mîrê wê pir dewlemend bûn. Piştî îkram û sohbeteke xweş şev bi ser wan de tê. Keçik, di nav odaya têxek mewij tê de ye, ji wan re cihê razanê amade dike. Heblê û Ebas dikevin odayê ku razen, çavêñ Heblê bi loda mewijan dikeve. Dibêje:

- Çavêñ keça min kor bin, wê çawan dil daye em di nav peyinan de razandine. Ebas, rabe em bi hev re van peyinan biavêjin ser sergoyê.

Radibin di tariya şevê de, mewijen di odayê de tev diavêjin ser sergoyê, dûre diçin radizên. Heblê bi şeveqa sibê bi qarewara qazan şıyar dibe. Diçe koxika qazan li qazan dinêre. Dibîne ku pûrtêñ wan ên spî, pir qirêj bûne, gemar bûne. Xwe bi xwe dibêje:

- Çavêñ keça min kor bin. Wê xîret nekiriye serê we bişo. Bise ez ê anîha serê we tertemîz bişom.

Diçe agirekî gur vêdixe, qazanekê tiji av dike, dide ser êgir. Gava av dikele, diçe yet bi yet qazan digire, serê wan dixe nav ava kelijî, diço û yet bi yet datîne ser refê.

Keçik ji xew şıyar dibe. Gava derdikeve derive ci bibîne; ku wê têxa mewijen wan li ser sergo û qazan wan tev mirar bûne. Ji dayika xwe re dibêje:

- Ez ji we hêvî dikim hema hûn zû bi zû terka vir bikin û biçin. Hêj ku malbata mîrê min bi kiryarê we nehesiyane.

Heblê û Ebas berê xwe didin rêya mala xwe. Ber êvarê bi zikê birçî digihêjin mala xwe. Sîtila tolmeyê ji tenûrê derdixin, lê dinêrin, ku ci bibînin; heram be, yet serî tolme jî tê de nemaye. Wê şevê bi zikê birçî radizên.

Dotira rojê, Ebas şalê xwe yê qetiyayî li xwe dike, ku biçekar. Ji Heblê re dibêje:

- Hinex rîs birêse, bide şalçêkerê, bila ji min re şalekî çê bike.

Heblê teşiyê digire destê xwe, bi şev û roj dirêse dirêse. Gurîf ekê têra şalekî hirî dirêse. Gurîfa rîs digire destê xwe dike ku biçekar. Berî bigihîje wir gurîfa rîs ji destan dikeve erdê, gîlîl dibe, diçe dikeve nav goleke biçûk. Gava gurîf dikeve golê, dibe qêr û hewara beqên di golê de.

Heblê dibêje:

- Ev ci ye, hûn dibêjin; Kengîr, kengîr pîrr û pîrr, bûye qêr û hewara we. Hûn ê şalê mérê min çêkin? Hûn ê kengîr teslim bikin... Roja çarşemê... Baş e. Ez ê roja çarşemê bêm, şalê mérê xwe bibim.

Vedigere diçe mala xwe. Ebas dibêje:

- Te rîs da şalçêkerê?

Heblê dibêje:

- Belê, ji min re gotin roja çarşemê were bibe.

Heblê roja çarşemê, diçe dinêre ku ne şal û ne gurîfa wê ya rîs xuya dike. Di ser wan de diqîre. Gava ew diqîre, qêr û hewar bi beqan dikeve. Heblê dibêje:

- We go ci? Hûn ê duşema bê çêkin? Baş e.

Vedigere diçe mala xwe, ji Ebas re dibêje:

- Wê duşema bê çêkin.

Roja duşemê Heblê diçe ser golê. Dibêje:

- Ka şalê mérê min?

Deng ji beqan dernakeve. Heblê li der dorêñ golê digere û nagere ne şal dibîne û ne gurîfa rîs dibîne. Bi hêrs dibeje:

- We şalê mérê min çênekir û gurîfa min a rîs jî winda kir. Ez ê jî mala we xera bikim.

Diçe, ji mala xwe tevirekekî tîne. Wekî dînan dikeve ser axa der û dorêñ golê, dikole dikole, dibîne ku di bin axê de kûpek derket, şâ dibe, kûp dide ber sînga xwe û dibêje:

- Ez ê ji ber gurîfa xwe ya rîs, kûpê jaîj û penêrê wan bibim.

Danê êvarê Ebas tê malê ji Heblê re dibêje:

- Te çû şalê min anî?

Heblê dibêje:

- Ez çûm, lê wan çênekiribûn û gurîfa me ya rîs jî winda kiribûn. Min jî devila wê kûpekî jaîj û penêrê wan anî.

Ebas, devê kûp vedike, lê dinêre ku ci; kûp tijî zêr û zînet e. Newêre ji Heblê re rastiyê bibêje. Jê re dibêje:

- Jinik vî kûpê han ji Remezanê re veşêre.

Heblê kûp dibe vedîşêre. Çend meh di ser de derbas dîbin. Rojekê çerçiyek tê li ber deriyê wan barê xwe datîne. Ji muşterîyan yek, navê çerçî dipirse:

Çerçî dibêje:

- Navê min Remezan e.

Gava ku Heblê dibihîze ku navê mîrik Remezan e, hema bi lez û bez diçe, ji mala xwe kûpê zêran tîne, dide destê çerçî û dibêje:

- Birayê Remezan kerem bike emanetê xwe bigire.

Çerçî bi matmayî kûp ji destê wê digire, gava devê kûp vedike, ci bibîne; tijî zêr û zînet e. Pir şâ dibe, ji ber kîfx-weşîya xwe, du-sê top qumaşan dide Heblê û barê xwe kom dike û bi bayê bezê direve diçe. Heblê topa qumaş dibe mala xwe, qet û qet dike. Hemû sexefêl û kinoşeyen malê, wekî bûka baranê dixemilîne. Her yek ji wan datîne kuncikekî malê. Danê êvarê Ebas tê, li derî dixe. Heblê dike qêr, dibêje:

- Keçê Eyşo, Fato, Rewşo, Qûrişo, zû herin ji xezûrê xwe re derî vekin.

Ebas şas dimine, lewra ji keçekê wan pê ve weledê wan tune bû. Ebas dibêje:

- Keçê zû were derî veke. Ezê bêm serê te bişkînim. Ew ci Eyşo, Qûrişo ye.

Heblê ji tırsan dibeze diçe derî vedike. Gava Ebas dikeve hundir dibîne ku di her kuncikekî malê de bûkek heye. Dibêje:

- Te ev qumaşen han ji ku anîne?

Heblê dibêje:

- Îro çerçiyekî bi navê Remezan hatîbû taxa me, ew kûpê ku me jê re veşartibû, min bir teslimî wî kir. Ew pir şanaz bû, ji ber vê wî jî du-sê top qumaş dan min.

Ebas, ji hêrsan dîn dibe, çovekî digire destê xwe, çîqas Xwedê qewet dayê, dikeve ser pişta Heblê û lê dixe. Heblê bi destê zorê xwe diavêje derve û direve. Êpê ji malan dûr dikeve, dibîne ku qijihekê xwe li ba wê danî û diçêre, ji qijihekê re dibêje:

- Ci ye tu dibêji: "Qij, qij, qij." Tu hatî pey min? Qet nemîne hêviya min, ez êdî nayêm.

Qijihekê dengê wê ditirse, fir dide û diçe. Di demeke şûn de dibîne ku deveyek tê ba wê disekine û diçêre, ji deveyê re dibêje:

- Baciya pê pehno, tu jî hatî pey min? Li vir li hêviya min bimîne. Ez ê vegekim bêm.

Ji deveyê hinek dûr dikeve, li ser du rêyan rûdîne, bele-mizka xwe diavêje ser wê rûyê û ser vê rûyê. Di wê de, du karkerên qral derbas dîbin. Li deveyê digerin. Ji Heblê



dipirsin, ka gelo wê deve dîtiye yan na. Heblê qet bersiv nade wan. Ew bi belemîzka xwe re mijûl e. Ji belemîzka xwe re dibêje:

- Şelûl di vir re, bilbil di wir re.

Her du mîrik ji hev re dibêjîn:

- Dibe ku ev jînik rîya deve çûye nişanî me dide? Tu here wê rîyê, ez ê jî herim vê rîyê.

Her yek ji wan bi rîyekê re diçe. Piştî ku mîza Heblê di-qede, diçe ba deveyê, serê deveyê digire û dibe mala xwe. Ji Ebas re dibêje:

- Bi Xwedê, ez sedema xatirê baciya pê pehno hatim. Ew nehatibûya pey min, ez nedihatim.

Ebas gava deveyê dîbîne ji kîfî, hîrsa xwe ji bîr dike. Deveyê dixe hundîre malê, ser jê dike, goştê wê qet û qet dike dixe hundîre denan. Ji Heblê re dibêje:

- Nebî, nebî tu ji tu kesekî re bibêji goştê deveyê li mala me heye. Ku tu bibêji wê qral serê min û te jê bike. Heblê dibêje:

- Baş e, ez ji tu kesan re nabêjim.

Xebatkar û xîzmetkarên qral, çiqas li der û dorêن bajêr digerin nagerin deveyê nabînin. Qral delal dide gazîn, dibêje:

- Kî deveyê bibîne ez ê beranberê wan zêr bidim wan.

Pîreke nehs, diçe ji qral re dibêje:

- Qralê min, hebe tune be, deveya te ser jê kirine, loma winda bûye, tu bi ya min bikî, xwe bi nexweşî deyne, ez ê herim kolan û kolan bigerim bibêjim: "Dermanê qralê me goştê deveyê ye." Dibe ku em bi ví awayî ser bibînin.

Qral bi gotina pîrê, xwe bi nexweşî datîne û dikeve nav nîvînan. Pîrê ji diçe kolan û kolan digere heya rastî Heblê tê. Jê re dibêje:

- Xwişkê, te bihistiye? Derdek li qralê me bîter bûye .Hekîm û loqman dibêjîn: " Dermanê vê nexweşiyê goştê deveyan e." ger ku goştê deveyan negihije, wê qral bimire.

Heblê bi xemgînî dibêje:

- Xwedê qralê me biparêze. Were ez ê bidim te, mal tiji goştê deveyê ye, ji qralê me re bibe bila jê re bibe derman.

Pîrê dibe mala xwe, pêşa wê tiji goşt dike. Pîra nehs ji mala wan derdikeye û diçe ji qral re dibêje. Leşkerên qral tê, Ebas digirin ku bibin, Ebas ji Heblê re dibêje:

- Te gotina min nekir! Va ye min dîbin, teqez wê qral serê min jêke, qe nebe hay ji xwe û deriyê xwe hebe.

Ebas dîbin diavêjin zindanê. Du-sê roj şûnde bîryar tê dayîn ku bê xeniqandin. Heblê dîbihîze ku wê mîrê wê dardê bikin. Dixwaze biçe dîtina wî.

Hêj ku neçûye, gotina Ebas bîra wê dikeve, ew jî diçe deriyê malê ji terxîçekan derdixe, dide piştâ xwe û diçe dîtina Ebas. Gava Ebas dîbîne ku Heblê deriyê mala wan daye piştâ xwe û aniye wir Ebas dîbêje:

- Jinik ev ci derî ye, te anîye vir?

Heblê dibêje:

- Mîrik te ji min re got: "Hay ji derî hebe." Min jî bi xwe re anî vir.

Ebas serê xwe dihejîne, nizane wê ci bibêje, bang dergevan dike û dibêje:

- Ez dixwazim bi qral re biaxivim.

Daxwaza wî jî qral re dibêjîn. Ji ber ku daxwaza wî ya dawî ye qral hevdîtina pê re qebûl dike. Ebas Heblê û deriyê piştâ Heblê nîşanî qral dike û çiroka wê jê re dibêje. Gava qral li rewşa Heblê dinêre, wî dibexşîne. Ebas û Heblê diçin mala xwe... Ebas ji jîna xwe re dibêje:

- Jinik Qûtqût hatine li nav bajêr. Ew te li ku bibînin wê te bixwin.

Heblê pir ditirse, ji tîrsan diçe dikeve tenûrê. Ebas te-nekeyekê datîne ser devê tenûrê, hînek garis diavêje ser tenekeyê û gazî mirîşkan dike. Mirîşk bi nikulên xwe dikevin ser garis. Dema ku ew li ser tenekê garis dixwin, deng ji tenekeyê derdikeye, weke; "Qût, qût, qût!" Ji Heblê ve ye ku Qûtqût hatine dê wê bixwin. Ji tîrsan rîj ji bedena wê diçe û dimire.


Çiroka me çû nav devîyan, rehmet li dê û bavê we hemûyan.

**Çavkanî:** Edalet TAN

**Temen:** 54

**Herêm:** Gundê Çorsêm/Tetwan/ Bilîs

**Sal:** 2010



# Gavan û Paşa

Gavanek hebû, li ber dewaran bû. Rojekê de-warên xwe bir beyaran, dît ku sê heb kevok, ji aliyê keviya behrê hatin, hatin ser kaniyê, postê xwe yê kevokiyê ji xwe kirin. Îca her yek ji wan kevokan bû keçeve wisan ku mirov nikare bi çavê seriyan li wan binihêre û ketin gola avê, xwe şûştin, careke dî postê kevokiyê li xwe kirin û çûn. Wî jî li wan nihêri, ev kevok wisan zêde xweşik bûn ku tu ne bikî ne bixwî, hema ji xwe re li wan û bedewiya wan binihêrî. Şewq û şemal ji wan diçe. Dilê wî li wan xerab bû, ji xwe re got ku ez ê ji xwe re çalekê, li ber vê gola kaniyê çê bikim û gava ew careke din bêñ xwe bisûn, ez ê potênek yekê

ji wan bikşînim ba xwe, belki yekê ji xwe re bigrim. Hema rojtirê rabû, hat li ber gola kaniyê çalekê ji xwe re vedâ, hejikekî dirêj anî danî ba xwe, ket çalê û ser xwe bi pûş û palaxê nixumand û li benda kevokan sekînî. Bala xwe dayê ku dîsa ew kevok, ka ji aliyê keviya behrê, ka ji kû hatin, rast berê xwe dan ser gola kaniyê, postê kevokiyê ji xwe kirin, dîsa şewq û şemal ji wan çû û mîna cara din, ketin avê û wan xwe şûşt. Gavanî, hema nermerm, bi dizika postikê yekê ji wan, bi wî hejikê xwe, kişand anî ba xwe. Ev keçikêñ ha ji avê derketin, duduyan jê postê xwe careke din li xwe kir, lê yekê ji wan çîqas çavê xwe

Berhevkar  
Ayhan YILDIZ

gerand, postê xwe yê kevokiyê nedît. Her du xwişkên wê wisan bê çare man, bi ser xwişka xwe de sekinîn. Ev xwişka wan jî, tırsiya û bi vî awayî ligligî. Vê keçika reben, gazi kir:

- Ya eslo, ya cisno, tu kî yî, tu bidî xatirê Xwedê û Pêxember, tu postikê min bidî min, ez jî xwe re biçim.

Gavanî, ji binê çalê got:

- Bawer bike ez nadim.

Keçikê got:

- Heyran, ez bela me. Gerek tu min nebî.

Gavanî dîsan got:

- Welehu bela bî jî, ez kincê te yê kevokiyê nadim.

Keçikê bala xwe dayê ku ev însan postê wê nadiyê, xwişkên xwe fetîlî û got:

- De Xwedê nehêle, hûn êdî herin, ez çi bikim ka?

Her du xwişkên wê çûn. Gavanî jî ev keçik gîhîştand xwe û êvarê, bi xwe re anî û hat malê. Diya gavanî jî, êdî pîr bûbû. Gava çav bi vê keçikê ket, şaş û metel ma. Jê pîrsî got:

- Keça min tu kî yî?

Keçikê got:

- Ez Gulperî me.

Bû êvar, keçikê, bi şewq û şemala xwe, hundirê wan ê tarî ronî kir... Wisan çendakî xweş, rojêن wan bi vî awayî bîhûrîn û çûn...

\*\*\*

Paşayê wî welatî jî, ji xwe re qazek ser jê kiriye, purtakandiye û dixwaze ku bike goşte bistê. Rabû ji xulamê ber destê xwe re got:

- Lawo ha ji te re vê qazê, li şîşê bixe û bibe here malekê ku agirê bîxêriya wan xweş e, li wê derê bipêje û bîne.

Xulam rabû, cû li şanesînê bala xwe da malan ka ji kuleka kê dû bilind dibe. Dît ku tenê dûman ji kuleka gavanî diçe. Vegeriya hat hundir û ji paşayê xwe re got:

- Paşayê min, wa ye dû ji kuleka gavanî derdikeve.

Paşa jî got:

- Rast e, xuya ye ku wî ji xwe re ézing û hej ji çolê anine, lewre agirê bîxêriya wî xweş e. Hema tu jî rast bibe wê derê û bipêje.

Xulam jî, hema rabû, nerm û delal bi goşte qazê girt û

bir mala gavanî. Gava ku derî lê da, diya gavanî derî jê re vekir û ew jî tevî qaza xwe derbasî ba bixêriyê bû û goşte qazê danî ser bizotên êgir. Carekê gava ku çav bi pîreka gavanî ket ku çi bibîne, şewq û şemaleke wisan jê diçe ku di vê tarîtiya vî kavîlî de, li ber husn û cemala xwe, neqşê kerge çê dike. Xulamê paşê, li ber bedewiya vê pîrekê, ew mabû ku ji hisê xwe ve biçe. Hema bêyî ku her du aliyê vî goşti bipêje, bê serî û bê çav, rabû bi goşt girt û rast berê xwe da qesra paşayê xwe. Gava hat wê derî, ji devgeriyê ketiye, hema goşt da destê wî. Paşa bala xwe dayê ku aliyekî goşt şewitiye; aliyê din hîna xwîn e. Hêrsa paşayî rabû, tepek di serî de lê da û got:

- Îca ev çi ye?

Xulam qet teke peke nekir, got:

- Serê te bixwe, bi paşayıya te ve, bi halê te ve û bi mala te ve!

Paşa li hev şâş bû û pîrsî:

- Çima?

Xulam got:

- Mal heye, mala gavanî û jin jî heye jina gavanî.

Paşa got:

- Çawa?

Xulam got:

- Hema wisan...

Paşa rabû, ser û merê xwe kur kir, xwe li hev hilû kir û berê xwe da mala gavanî. Li derî da, wan derî jê re vekir û ket hundirî, gava ew çav bi pîreka gavanî ket, ew jî jê ma heyirî damayî û xwe negirt, got terp li ser taqê piştê bê hiş li erdê ket, heriqî. Ev her du reben rabûn, wan ser dilê wî mîz da, av bi ser û çavê wî ve wer kir, heta hisê wî hat serê wî. Gava tevger bi zimanê wî ket, hema yekser ji pîreka gavanî re wiha got:

- Keçê ez ê biçim malê, êvarê gava ku mîrê te hat malê, jê re bibêje paşa hatiye mala me û xwestiye ku ew bê qesrê.

Bû êvar, gavanî hat malê. Pîreka wî jê re got:

- İro paşê tu xwestiyî.

Gavanî şâş bû, pîrsî, got:

- Xêr e gelo?

Gulperî got:

- Ez nizanim, wî got bila mîrê te êvarê bê qesrê.

Gavanî, piştî şîvî, rast berê xwe da qesrê. Çû hafa paşa û pîrsî:

- Paşayê min te xêr e gelo, te xwestiye ku ez bêm vê derê? Kerem ke.

Paşa hema bêsekin got:

- Sê şertên min hene ku ez ê ji te bixwazim. Eger tu wan şertan pêk bînî, jixwe te pêk anî, eger te pêk neanî, ez ê serê te bidim pekandin.

Gavanî, ji neçarî got:

- De çîka bibêje, çî ne ew şertên te?

Paşa xwe pik kir û got:

- Tu yê herî berrekê bînî ku ev bajarê ha tev bikeve binê wê û tê de biheşire.

Gavanî ji xwe re mit û mat bû û rast hat malê, bi diya xwe de girî. Diya wî got:

- Xêr e lawo, çî bû? Tu çîma dignî?

Wî jî hal û meseleyê xwe û paşa jê re got. Gulperî, li wê derê li wan temaşe dike û wê got:

- Ka min roja ewil jî ji te re negot ku navê min Gulperî ye, ez ji te re nabim. Qey min ji te re negot min neyne ez bela me. De îca Xwedê ji te re nehêle, rabe here keviya behrê, gazî xwişka min a Nazlîxan bike, bila ji me re wê berra me bişîne. Jê re bibêje li me sar e, em davêr ser xwe, bila bide te û bîne.

Gavanî quesda behrê kir, bala xwe dayê ku wa ye berrek bi ser avê ket û ber bi keviya behrê ve hat. Ji xwe re got; "heyra ev berra ha têra du mirovan nake, ka wê çawa be?" Axirkî bi berrê girt anî malê. Rojtirê çû qesrê, ji paşa re got va ye min berr anî. Paşa jî xelkê derdora xwe da hev û derketin şaneşînê û gavanî, li ber çavê wan berr vekir, Xwedê teala wisan kir, ev berr mezîn û fireh bû, heta ku temamê vî bajarî ket binê wê. Paşa û cemaeta dora wî hemû ji xwe re mit û mat man. Paşa got:

- Lawo ev şert bû, lê belê du şertên min mane, divê tu wan jî pêk bînî. Îca şertê min ê duduyan ew e ku tu gûşîyekî tirî bînî, temamê xelkê vî bajarî jê bixwin; lê belê heblûr û liben wî neqedin.

Gavanî got:

- De ka biçim malê, Xwedê teala mezîn e.

Gavan hat malê, dîsa bi diya xwe de girî, diya wî got:

- Lawo îca paşa çî xwest?

Gavanî got:

- Wele wî îca gûşiyekî tirî ku têra xwarina temamê xelkê bajêr bike xwest.

Diya wî reben ji pê de giriya. Gulperî, li wê derê li wan temaşe dike û wê got:

- Ka min roja ewil jî ji te re negot ku navê min Gulperî ye, ez ji te re nabim. Qey min ji te re negot min neyne ez bela me. De îca Xwedê ji te re ji, ji paşê re ji nehêle, rabe here keviya behrê, gazî xwişka min a Nazlîxan bike, bila ji me re, ji wî rezê me yê bibîn û bibereket, gûşiyekî tirî bişîne. Jê re bibêje ez nexweş im, ecele bila bide te û bîne.

Gavanî quesda behrê kir, hat ber keviya behrê û gazî kir, got:

- Xwişka te ya Gulperî, gotiye, bila ji me re, ji wî rezê me yê bibîn û bibereket, gûşiyekî tirî ji min re bişîne.

Bala xwe dayê, ha ku dît, wa ye gûşiyekî tirî bi ser avê ket û ber bi keviya behrê ve hat. Ji xwe re got; "mala min mîrat nebû, heyra ev gûşiyê tirîyê ha, têra min, diya min û jîna min nake, ka wê çawa têra xelkê bajarekî bike?" Axirkî bi gûşiyê tirî girt û ket rê. Bi rê de heblûrek ji gûşî kir û avêt devê xwe, bala xwe dayê ku hema di cî de heblûreke din kete şûna wê. Di dilê xwe de got; "mala Xwedê teala ava be, gelek baş e." Axirkî wî ew gûşî anî malê. Diya wî, pîreka wî, tevan jê xwar, dîsa mîna xwe ma. Rojtirê çû qesrê, ji paşa re got:

- Va ye min gûşiyê tirî anî.

Paşa jî xelkê derdora xwe da hev û derketin şaneşînê û gavanî, li ber çavê wan, ev gûşiyê tirî derxist, heta ku temamê xelkê bajêr hat, ji wî gûşiyê tirî xwar, hîna neqedîya. Paşa û cemaeta dora wî hemû ji xwe re mit û mat man. Paşa got:

- Lawo, ev şertê min jî çû. Ma yek şertekî min. Îca tu yê herî sebiyekî sêrojî bînî weřî, divê ku xeber bide, ku xeber da, ji xwe temam, ez û te ji hev qetiyan, îca ku xeber neda, serê te diçê. Gavanî got:

- De ka biçim malê, Xwedê teala mezîn e.

Gavan hat malê, dîsa bi diya xwe de girî, diya wî got:

- Lawo îca paşa çî xwest?

Gavanî got:

- Wele wî îca sebiyekî sêrojî ku xeber bide ji min xwest.

Diya wî reben jî pê de giriya. Gulperî, li wê derê li wan temaşe dike û wê got:

- Ka min roja ewil jî ji te re negot ku navê min Gulperî ye, ez ji te re nabim. Qey min ji te re negot min neyne ez bela me. De îca Xwedê ji te re jî, ji paşê re jî nehêle, rabe here keviya behrê, gazî xwişka min a Nazîxan bike, ev du roj in ku Xwedê teala sebiyek daye wê, bila ji me re bişîne, sebra min pê tê.

Gavanî quesda behrê kir, het ber keviya behrê û gazî kir, got:

- Xwişka te ya Gulperî, gotiye, bila ji me re, wî sebiyê xwe bişîne, sebra min pê tê.

Bala xwe dayê, ha ku dît, wa ye hinek paçikê pitikan bi ser avê ket û ber bi keviya behrê ve hat. Axirkî bi wî sebiyî girt û ket rê. Di dilê xwe de got; "mala Xwedê teala ava be, gelek baş e." Axirkî wî ew sebî anî malê. Diya wî, pîreka wî, tev pê şâ bûn; feqet sebî qet xeber neda. Rojtirê çû qesrê, ji paşa re got:

- Va ye min sebî anî.

Paşa jî xelkê derdora xwe da hev û derketin şaneşînê û xelkê bajêr hemû li wan civiyan. Wan di nav xwe de got ku; "gelo ev gavanê reben çiqas gunê ye, vê carê îca

paşa jina wî jê distîne û serê wî dipekîne." Axirkî gavanî, li ber çavê wan, ev sebî deranî, heta ku temamê xelkê bajêr hat, li wan guhdarî kir.

Paşa got:

- Sebî!

sebî dengê xwe nekir. Paşa car din deng lê kir, sebî deng nekir. Paşa cara sisiyan ku got:

- Sebî!

Îca ev sebî bi ziman ket û wî got:

- Sebî û quredar!

Heye sakî min î qol î sor,

Te xwarî takî du kulor,

Ez di diya wî paşayî dinim ku

Jina gavanî jê distîne bi kotek û zor.

#### Çavkanî: Xefîlî HÊLÎNÊ


Temen: 70

Perwerdehî: Nexwende

Herêm: Gundê Hêlinê/Hezo/Batman

Sal: 2004





Berhevkar: Mahpus SERHEDÎ  
Çavkanî: Mezher UZUN  
Temen: 53  
Perwerdehî: Nexwende  
Herêm: Qerebxarê/Tatos/Erzirom  
Sal: 2015

# Bizinêñ Meta Fatê

Jinikeke bî hebûye, zar û marê wê kesekî wê tune bûye, hema donzdeh heb bizinêñ wê tenê hebûne. Biraziyekî jinikê hebûye, li gomê bûye (goma gund), ev biraziyê pîrê li vê goma çiyê dimîne, giha û alifê wî bol bûye, hal û wextê wî li cî bûye, zengin bûye.

Dibe payız jinik dibê; "heyran ka ez ê çawa li van bizinêñ xwe binihêrim? Dibê heyran welle hema ez ê bizina biherim gomê, mala biraziyê xwe, hela ew van bizina ji destê min nagire, ji min ra xweyî nake?" Dibê "wê ji min ra xweyî ke, biraziyê min nîn e?" Jinik radibe diçe mala biraziyê xwe. Dibê:

- Lawo roja we bi xêr.

Biraziyê wê dibê:

- Xêr û silamet Meta Fatê tu ser çevan ra hatî.

Paşê biraziyê wê jê dipirse, dibê:

- Meta Fatê de xêr e, tu hatî ci?

Meta Fatê dibê:

- Welle deh û donzdeh heb bizinêñ min hene min gotiye hela hûn ji min ra ïsal xweyî nakin, bi biharê naxin?

Biraziyê wê dibê:

- Meta Fatê eyb nîn e tu vê gotinê dibêjî? Dibê bîne têxe nava pez, em ji te ra xweyî bikin.

Meta Fatê piştî ku vê sozê jê distîne tê diçe mala xwe. Bizinên xwe dide pêşîya xwe dibe tevî pezê biraziyê xwe dike dibê:

- Ez ê biharê werim biherim.

Biraziyê wê dibê:

- Temam metê ser çavan.

Bizin jî avis in. Dibe bihar Meta Fatê dibê; "êdî wexta zayına bizinan e, ez herim bizinê xwe bînim bira li serê zar û zêcê wan nebin bela." Metê radibe tere goma çiyê mala biraziyê xwe. Metê dibê:

- Lawo roja we bi xêr!

Biraziyê wê jê ra dibê:

- Meta Fatê xêr û silamet.

Biraziyê wê dibê:

- Meta Fatê tu ji boy wan her çar bizinên xwe hatî?

Metê dibê:

- Erê welle lawo! Min go ez herim bizinê xwe bînim bira li serê zar û zêcê wan nebin bela.

Dibê:

- Erê welle Meta Fatê gotina te ye.

Birêziyê wê jê ra dibê:

- Meta Fatê!

Metê dibê:

- Ha layê min!

Birazî dibê:

- Metê!

Sala parîn em cûn Warê Kelmîzokê,

Çar heb bizinên te mirin li wir xwezî bi payizokê,

Em ji wir hatin, dagerian,

Bizina Xişt guran kuşt,

Bizina Kol min da bi cotik sol,

Bizina Sor mir bi zor,

Bizina Kir mir bi gir,

Bizina Hêşîn mir wan demên pêşîn,

Em man Bizina Banî,

Bizina Banî banzda ser xanî,

Min çowek tê weranî,

Qoçık şikan çevek deranî,

Min şer jê kir goştê wê xwar,

Helal kir li vî canî,

Postê wa li wira ye,

Dibî jî tu zanî,

Nabî jî tu zanî.





Arekerdox  
Leyla GULTEKİN

# DUAYÎY

- Awê kewserî bibo qismetê to
- Adirê cehnimî to ra dûrî bo
- Awa sîpê bo, ro to bigeyro
- Bi xeyr û silamet şo û bê
- Bela û tifaqî şima ra dûrî bê
- Cê to cinnet bo
- Çimê to roşnî bê
- Destê to anû pirê bê
- Ena dinya 'd çi miramê to estê, Homa bero seri
- Ez tora çendêk razîya Homa'yık endêk to ra razî bo
- Fêne roşnê aşm bêro vernî to
- Homa to dir bo
- Homa anû bido to, fenê varitê nîsanî ro to bi varo
- Homa nanêko rehet bido to
- Homa to raştê bêbavan niyaro
- Homa joy nêkero miyanê dest û lingan
- Homa dadî û babê şima, serê şima ra kemî nêkero
- Homa bûke kero
- Homa hewt hebî lacî û keynêk bido to
- Homa miradê to bikero
- Homa tifaqêk niyaro şima rê
- Homa bûka sûr kero, kê mi'd rono
- Homa malo heram nêkero gismetê ma
- Homa to ra weşbo
- Homa miradêko baş bido to
- Homa tengayî nêmocno to
- Homa to pîl kero, wayrî lacî û keynan kero
- Homa to rê verdo (tût)
- Homa ro ma hemin bêro rehm
  
- Homa joy aqil ra nêkero
- Homa joy vînayê çiman ra nêkero
- Homa to raştê başan biyaro
- Homa joy îman ra nêkero
- Homa firstet nêkero destê zaliman
- Homa joy miheyrlê nêverdo
- Homa to hewcê joy nêkero
- Homa merdimî dest û lingan ra nêkero
- Homa to, to û tûtanê to rê verdo
- Homa joy bêsermiyan nêkero
- Xaliq hetê to bo
- Xeyrê Homay ro to bo
- Kamco bixeysra Homa ay bikero
- Miramê to şêrô seri
- Qyyî işalla ti şêre awê kewserî ser
- Roşnê çila bo, vernî to de bo
- Rehmê Homay ro ci bo (merdan rê)
- Ro to bimbarekî bo
- Rayê to akerdî bo
- Seyin bixeysra Homa anû bikero
- Şima piya kal û pîr bê
- Ti cîrane Fatma Nebî bê
- Ti cîrane pêxember û ewlîyan bê
- Ti çirey tengayî nêvînê
- Ti bixeysra amey
- Ti ci biwazê Homa bido to
- Ti anû raştê başan bêrê
- Ti welî Homay bê.

# ZEWTİY

- Adirê cehnimî bo
- Awa sîya bo
- Bîvikê to vecyê
- Boxçikê to kêt bimano (ezebanrê)
- Bexteres
- Bîvikê to bi teqê
- Boro, nêkero teber
- Bextê to sîya bo
- Beqaqî to çinêbo
- Birûskê aşmê gulanî tor o do
- Canê to bihelesyo
- Cigerê to fekê to ra bêrê teber
- Cigerê to bitêqê
- Çimê to kor bê
- Çopilmi şîma ro do
- Çimê to bêrê teber
- Derd û kûlî pîzê to ra nêvecyê
- Dest û lingî bîşikyê
- Ezraîl to wedaro
- Ezman ro to bêro xezeb
- Erd aqelesyo ti pedi şêrê
- Fekê to bîşikyo
- Fek û pirnikan ra bêro
- Feleqê to sîya bo
- Felatî to çinêbo
- Feleqsîya
- Fekê to çewtbo
- Gulî pero gunayî
- Gilê çimanê to birişyê
- Guli to ro guno
- Goştê wehşî bo
- Homa belê şîma bido
- Homa to ker û kor ko
- Homa ro to bêro xezeb
- Homa to ro do
- Homa to wedaro
- Homa to wedaro û ero do
- Homa to bigero
- Homa nêmocno to
- Homa rihê to bigero
- Homa nêdo
- Îflahî to çinêbo
- Jan to ro guno
- Jehr û ziqquûm bo
- Jehr û mirin
- Jehr bo
- Jehrê marî bo
- Kezbebê to bêrê teber
- Kê to bixerepyô
- Keskîzer bo
- Lîlikê to vecyê
- Lîlikê to biteqê
- Loqelê to bivisylê
- Loqelê to bêrê teber
- Loqelê to qinê to ra bêrê teber
- Qur'an tor o do
- Qeda dinya ro guno
- Qeda tor o do
- Qiriked bimano
- Mar to ceno
- Marî cena wo
- Mezel to boro
- Mêjî to birişyo
- Mêjî to bêro teber
- Milê to bîşikyo
- Mirad û mexsedê to çimanê to'd bimano
- Miyanê to bîşikyo
- Nefes ro to bîşikyo
- Oyyî dil û gurçikê to bêrê teber
- Oyyî ti ker û lal bê
- Oyyî ti şêrê binê erdî
- Oyyî ti bi masê
- Hal ra nêvecyê
- Pirnikanê to ra bêro
- Pîzed bimano
- Roşnê çimanê to bibiryê
- Ro to jehrê marî bo
- Rihê to vecyo
- Siyî to ro bivarê
- Şiyayışo peyin bo
- Şêro, weto nêro
- Şêro nihat
- Şo cehnimi
- Ti dinya de bê û ax bikerê
- Ti ada sîya'd şêrê
- Ti adiro sûr'd şêrê
- Ti bimrê
- Ti nêfeletyê
- Ti bimrê, nêfeletyê
- Ti bimrê, şêrê binê linganê mi
- Ti erdo bimanê
- Ti bi teqê
- Ti nêrisê ewca
- Ti nêkerê teber
- Ti awe'd şêrê
- Ti a dare'd şêrê
- Ti zama nêbê
- Ti nêrisê kê
- Ti bê mi bimanê
- Ti nêrisê a heyam
- Top to ro guno
- Warê to kor bo
- Wa boro nêkero teber
- Vergî(cinawir) to borê
- Xezeb to ro bivarô
- Ziwanê to lal bo
- Zerî to sîya bo

# Gotinê pêşîyan ên li ser **payîzê**

Amadekar  
Ronya BEWRAN

- Biharan rakirin, payîzan dakirin.
- Biharan xwe têr neke, payîzan xwe gêr neke.
- Ciwantî bihar e, pîrî her payîz e.
- Payîz xweş e, lê pel weş e.
- Pîrî payîz e.
- Mastê payîzan bidin ezîzan.
- Ji xelkê re bihara sorgul û rengîn e, ji min evdalê Xwedê re pîr e, payîz e.
- Payîzê li me kir gazî, dar man rût û tazî.
- Biharê girt û lê kir, payîzê jê kir.
- Biharê pez, payîzê rez, zivistanê ez û ez.
- Biharê birçî nemîne, payîzê dereng nemîne.
- Biharê zû hilkeve, payîzê zû derkeve.
- Dewê payîzan bidin ezîzan.
- Biharan xwe şil nekin, payîzan xwe gêro nekin.
- Dewê payîzê bide ezîzan, dewê biharê bide neyaran.
- Dizê talokan payîzê diyar dibe.
- Mastê payîzan ber ezîzan, mastê biharan ber neyaran.
- Tava payîzan li serê ezîzan.
- Biharê xwe têr neke, payîzê xwe gêr neke.
- Havîn hat tişt û mişt, payîz hat li ser rûnişt, zivistanê got:  
"Ka te ji min re çi hişt?"
- Payîz e, zik têr e, dinya xêr e.
- Şîré biharan bidin neyaran, şîré payîzan bidin ezîzan.
- Biharê xwe tirtire neke, payîzê xwe debeng neke.
- Biharan xwe bikişîne binê daran, payîzan xwe bikişîne binê gûzan.
- Çêlikên mirîşkan payîzê têr jimartin.
- Bihar bi gulê; payîz bi kulê.
- Çol û çoristan, ber û berbostan, payîz çû hat zivistan, em ketin xakê giran...
- Çirî çirîstan, payîz çû, ma zivistan.
- Payîz e dew ezîz e.
- Payîzê got çiya: "Bila rêwî ranewestin li ser riya."
- Pirê payîzê çi liqatê.




# LI MEZOPOTAMYAYÊ PÊVAJOYA JI NIŞTEBÛNA WARÊN EWIL BER BI BAJARÎBÛNÊ VE

Piştî pêvajoya Epi-paleolîtik serdema Neolîtik geş dibe, em dibînin ku di vê serdemê de cih û warên ku lê nişte dibin bi heman awayî peresan bûne/hatine guhertin, herwiha em dîsa dibînin îstasyonên Neolîtik ku em dikarin wan wek gundên ewil bi nav bikin derdikevin holê. Di serdema Epi-paleolîtik de mirovan bi nêçîrvaniya ajalan û berhevkirina xurekan debara xwe kirîye, di encama kolin û lêkolînên li deverên ku lê bi cih bûne ev yek xwe nîşan dide.




## Destpêk

Piştî serdema dawî ya cemserî qediya û nermahiya kişwerê destpê kir, pergaleke ekolojik a nû derketiye holê. Di vê serdema ku em ê wek Epi-paleolitik (B.Z.18.000-10.000) bi nav bikin û mirov dê xwe li gor şert û mercen vê Eko-Sistêmê adapte bikin, em dibînin cih û warê ku lê nişte bûne; rasterast bi avhewa û şewaza jiyînê re eleqedar in.



Sikefta Shanidare



Li Çatalhöyükê  
plana niştecibûnê

Mirovên serdema Epi-paleolitik; li hin deveran di şikefîn xwezayî de, stargehêن bin taht û zinaran de, li hin deveran jî di qonaxên ji konan bi cih bûne, li gel vê li hin deveran jî di çalêن kûr an jî kolîten ji daran de jiyanê. Sedenê bingehîn ên bicihûwarbûnê hêmanên wek; ekolojî, erdnîgarî, kişwer, bilindahî hwd. ne.<sup>(1)</sup>

Piştî pêvajoya Epi-paleolitik serdema Neolitik geş dice, em dibînin ku di vê serdemê de cih û warênu ku lê nişte dibin bi heman awayî peresan bûne/hatine guhertin, herwiha em dîsa dibînin ıstasyonên Neolitik ku em dikarin wan wek gundêñ ewil bi nav bikin derdikevin holê. Di serdema Epi-paleolitik de mirovan bi néçîrvaniya ajalan û berhevkirina xurekan debara xwe kiriye, di encama kolin û lêkolînên li deverênu ku lê bi cih bûne ev yek xwe nişan dide. Lê belê heman model a debar û aboriya bi néçîrvaniyê, lê hinekê din têkilhev li deverênu wek; Girê Çemê Hola, Girê Kûvi, Xerawreşk, Qetê Berçêm, Ebu Hureya, Girê Kortikê jî derdikevin pêşîya me, ligel ku ev never li gor encamên daneyen lêkolînan ên serdema niştecihêñ Neolitik in.

Mijara sereke ku em ê li ser bisekinin; ji van mînak û modelên niştecih ên ewil çawa derbasî mekanizmaya bajarêñ ewil bûye? Pêngavêñ bajarîbûnê yên ewil, li

kîjan herêmên Mezopotamyayê bi awayekî aşkere derdikevin pêş? Komên mirovan bi kîjan hincetan ber bi bajarîbûn û dewletbûnê ve peresan bûne/ hatine guhertin?

## Warêni Niştecih Ên Ku Li Gor Şertêñ Çandîniyê Ava Bûne:


Piştî çandîn û kedîkirin û xwedîkirina ajalan berbelav bû li Mezopotamyayê cih û warênu ji hev cuda ava bûn. Ji van waran hin jê ji yên beriya serdema xwe bi çanax û firaxên ku hatine çekirin tên ciyawazkirin. Lê wekî din van waran ji gundêñ çandîniyê yên wisa pêk tênu ku temamê jiyanâ wan a rojane jî dişibe hevdü. Li warênu din jî ci di warê çekirin û bikaranîna amûran de, ci jî di warê xwerêxistina civakî de geşedanen berbiçav hene.

Van geşedanen piştire gav bi gav ber bi encameke karteker ve çûye û xwe gihandiye bajarîbûnê, vê veguhe-rîna ku li Başûrê Mezopotamyayê B.Z. bi 4 hezar salî pêk hatiye, bingeha civakên hemdem daniye.

## Ji Kom û Komunan Veguherîna Komên Polîtik; Derketina Holê Ya Bajaran

'Şoreşa Neolitik' û 'Şoreşa Sar/Bajêr' ev herdu têgeh ji aliye arkeologê navdar ê Awistiryayî Gordon Childe ve

(1) Metin KARTAL; 2009:28 Konar; Ji Jiyanek Koçeriye Derbasbûna Jiyanek Niştecih



Li Mezopotamyâ  
îllüstrasyona jiyanâ gund a neolitik

li ferhenga arkeolojiye hatine zêdekirin. Childe dibêje ev herdu şoresh di dîroka mirovahiyê de jî veguherînên herî girîng in. Childe pêwendiya derketina civakén dabeşkirî û otorîteya sazmendî bi hilberînera zêde ya çandînî û cotkariyê re girêdide û dibêje ji bo kara zêde ya ser hilberîneriya çandînîyê sazî ava bûne, herwiha vê pêvajoyê jî wek 'Şoreşa Şarî/Bajêr' bi nav dike. 'Şoreşa Neolîtik' jî wek derbasbûna hilberandina xurekê û belavbûna bîcîhbûna li gundan pêname dike, vê pêvajoyê jî pêngavek amadehî ya bo 'Şoreşa Bajêr' dibine. Childe li gor 'Teoriya Weha' ku bo derbasbûna hilberandina xurekê rave bike bi xwe avetiye holê, wiha dibêje: "Di dawiya serdemâ cemserî ya dawî de bi germâhiya gerdûnî çolbûn pêk hatiye, herwiha tevî mirov û ajalan, nebat û riwekên bênen xwarin jî tenê dikarin li der û dorêni bi şêweya 'wa-ha'yan bijîn. Li van derûdoran/nîvengan mirov, ajal û riwekan dest bi têkiliyeke raçavkarî kirine û kedîkirin jî bi vê sayê pêk hatiye. Komên din ên ku çav li derfetên ji-yana bi kedîkirina ajalan û riwekan dikevin ew jî derbasî jiyanekî niştecîhî û çandînîyê dibin. Li gor Childe bi Şoreşa Neolîtik ve wê rîbaza hovane ya berhevkirin û belavkirinê bi dawî dibe, mekanîzmayeke bêtir tevlihev a bazirganî li şûna wê tê, û dibe sedema avakirina cîvakeke dabeşkirî. Ev pêvajo di warê Arkeolojîk de dikare bi; cih û warêni ku gelheyek mezin lê dijî, bi çomlekvanîyê, amûrên xwedî prestij û teknolojîk ên wek meta-lûrjî, bi avahiyê abîdeyan û bikaranîna nivîsê were râvekirin." <sup>(2)</sup>

Her wekî ku Wooley li Ûr'ê avahiyê abîde û gorêna qralan ên debdebe derxistin holê, ev jî cih û war û dema Şoreşa Bajêr ispat dike. <sup>(3)</sup> Piştre encama xebatêna hatine kîrin, nîşan dide ku Bajarbûn B.Z. di navbera 5000-3000 salan de hêdî hêdî lê bi awayekî berdewam li Başûrê Mezopotamyayê derketiye holê.

Gava em li pêvajoya navbera herdu şoreshen ku Childe behs dike dinêrin, B.Z. bi 7000- 5000 salan li erdêni bo çandiniya bêav ên Bakurê Mezopotamyayê hin komên ku bi koçberî dijin mîmariya wan û warêni ku lê bi cih bûne pir dişibin hevdî, bi komên xaneyen pev ve û bi kolan û riyêni ku wan komên xaneyan ji hevdî vediqetînin xuya dikin. <sup>(4)</sup> Ev şêwaza mîmariyê li deverên wek Sabi Abyad, Domuztepe, Kurdu jî xwe nîşan dide. <sup>(5)</sup>

Ji destpêka B.Z. bi 4000 salan ve li temamê Mezopotamyayê em veguherînek xwerêxistinî dibînin. Pêvajoyen kûr ên civakan ku dikevin şêweya xwerêxistinî li demen ber bi dawiya B.Z. bi 4000 salan ve rast têni û bi pêngaveke nû derdikeve pêşberî me. Ev pêngav li temamê Mezopotamyayê têkiliyên politîk, aborî û cîvakî ji binî ve bi awayekî xurt diguhere û ev yek jî hînek encaman bi xwe re tîne. Êdî bajarêni bi avahiyê mezin û abîdeyên debdebe ku bibin navend û bikarîbin hêzkekê li derdora xwe bîcîvînin, têni xuyakirin. Hilberîn jî bi awayekî xurt berbelav dibe ev jî bikaranîna mohr û hînek sembol û amûrên din ên birêvebirinê bi xwe re tîne. Firaqen bo belavkirina xwarinê li ser hev têni çêkirin, hin amûrên metal û biqîmet, hunerên destan, û di dawiya vê serdemê de nivîs jî derdikeve holê, ev hêman hemû encamên van pêngavan in. <sup>(6)</sup> Ev çanda ku bi awayekî xurt vediguhere, em di Serdema Uruk a Dereng de B.Z. nézî 3500-3100 salan de rast lê têni.

Di vî warî de em dikarin bibêjin ku hemû guherîn û veguherînên şenber cara ewil li Uruk û derdora wê çêbûne. Bajarê Urukê li ser qadeke li derdora 2,5 kilometre qatî hatiye avakirin. Di derbarê nufûsa wê demê de delîlên rasterast tune ne, lê belê li gor daneyen etnografîk serê hektarekê 100-200 kes dikeve. <sup>(7)</sup> Heke em bifikirin ku avahiyê rîvebirî yên giştî di qadek 20 hektarî de cih bigre, naxwe 230 hektarê mayîjî ji bo niş-

(2) Journal Of Anatolian Prehistoric Research, Ankara, 2015

(3) Wooley, 1934

(4) 2013; Akkermans

(5) 2013; Akkermans


(6) Frangipane Marcella, 2002:207, Li Rojhilata Nêzîk Çêbûna Dewletbûnê

(7) Van de Mieroop, 1999:96


tecihan hatiye bikaranîn, herwiha li gor hisaban ber bi dawiya B.Z. bi 4000 salan ve nufûsa Urukê di navbera 25.000- 50.000'î de tê texmînkirin. <sup>(8)</sup>

Uruk haya çaryeka ewil a B.Z. bi 3000 salan jî ne bajarekî ku derdora wî bi bircan hatibû dorpeçkirin. Lê belê di encama lêkolînên li Mezopotamyaya Jêrîn de ku gelek dewlet derketine holê û di çavkaniyêni nivîskî de jî bi awayekî zelal bi belgeyan hatine ispatkirin ku ji ber rakêşî û qeyışkêsiyê derdora bajêr bi bircan hatiye bilindkirin. Ji ber parastinê û gelheya zêde a ku li bajaran civiyaye bêtir hişt ku erdên nêzîk û derdora bajêr werin çandin û rakirin. Li ser erdên dûri bajaran tu kare çandîniyê nekirine, ev yek him di navbera dewletêni bajaran de bûye herêmek tampon, him jî bûye herêmeke step cep (herêma etnik) bo yên ku ajalan xwedî dikin û jiyanekî nîv koçber dijin.

Li bajarêni Mezopotamyaya Jêrîn avahiyêni giştî yên herzû derdikeyin pêşîya me perestgeh in. Tebeqeyen Kompleksa Perestgeha Eanna ya ku li bajarê Ûrukê hatiye dîtin û Perestgeha Anu (Perestgeha Spî) nîşanî me dide ku ji Serdema Uruk a Dereng ve ev perestgeh hebûne. Evan perestgehêni Abîdeyî ji aliyekî ve serdestiya perestgehan a li ser cîvakê nîşanî me dide. Her wekî em ji diyariyên giranbiha ên wek guldank û peykerên bo perestgehê hatine dayîn jî vê yekê têdighîn.



Çavkaniyêni bingehîn ên debara perestgehan, erdêni dest wan de bûn. Di van Peresgehêni ku wek sazûmanîn ên xwerêxistina aborî, cîvakî û siyasi derdikeyin pêşîya me, ixtimaleke mezin ên ku ev sazûman birêve birine jî rehîb in. Rehîban ev erka xwe jî hêza xwe distandin, ji ber ku xwe wek nûnerên Xwedawend û ser rûyê erdê diditîn hêza xwe jî ji wir distandin û him meşru dibûn, him jî bingehîya îdeolojiya ku bikarîbin vê



mekanîzmayê birêvebibin datañîn. Wê daxwaza birêvebirinê ya van kom û aliyan, keşfa amûrên kontrolkirina vê hêzê jî bi xwe re anîne. Em di Serdema Uruk a Dereng de ewil mohrêni gindorî, piştre nivîsa piktografîk û herî dawî jî pergala nivîsek bêkemâsi ya Mîxi ya Sumeran dibînin ku evana pêşdeçûna rê û rîbazân kontrolkirinê nîşanî me didin.

### Encam:

Wek encam em dibînin ku bi riwek û kedîkirina ajalan, bi xurek û xwarinan ku debara xwe pêk bîne, tevî jiyanekî niştecihî û hilberînê zêde gelek hevsengî guherrandine. Herwiha vê yekê rê li ber pêşdeçûn û gesedanê teknolojik vekirine. Belkî vê yeka hanê di warê pêwendiyen xizmî de hinek bêteşeyîbûnî/deformasyon pêk anîbe. Pişti di warê aborî de dabeşîya cîvakî dest pê kir, bajarêni mezin ên nufûsa wan zêde ava bûne. Ev gesedanê dabeşkirina civakê kûrtir kirin û civak wek rahîb, cotkar, karmend, bazirgan û hilberînerîya xusûsî ji hevdî ciyawaz kirin, ev jî nîşane û taybet-mendiyêni heri aşkere yên bajarîbûnê ne. Dîsa avahî û perestgehêni pîroz, di vê çarçoveyê de qismê birêvebir ê civakî, bo danîna bacê û jînûvelavkirina hilberanan, nîşan û elametên bajarîbûnê ne.

### Çavkanî:

- Metin KARTAL; 2009, 28 Konar, Ji Jiyanek Koçeriyyê Derbasbûna Jiyanekî Niştecihî
- MİCHEAL ROAF 1996 İSTANBUL- (1) Ansiklopediya Şaristaniyêni Mezin a Mezopotamyaya û Rojhilata Nêzîk a Kevin
- Journal Of Anatolian Prehistoric Research, Ankara, 2015
- Frangipane Marcella 2002; 207, Li Rojhilata Nêzîk Çebûna Dewletbûnê
- Özlem ÇEVİK; 2005; 26, Bi Delîlêni Arkeolojîk Di Dîrokê de Bajarêni Ewil û Pêjajoya Bajarîbûnê

[8] Çevik Özlem, 2005, 26, Bi Delîlêni Arkeolojîk Di Dîrokê de Bajarêni Ewil û Pêjajoya Bajarîbûnê

# NIFIR

Amadekar: Asmîn ÜYANIK



- 1) Canzerî biyo!
- 2) Carika(laçika)spî li gewriya te biale!
- 3) Cî û war bi destêne te nekevin!
- 4) Cegera te biperite!
- 5) Cegera te ji devê te de bê xwarê!
- 6) Cegera te di pozê te de were!
- 7) Cegera te pirtî pirtî bibe û devê te de were xwarê!
- 8) Cegera te qul bibe!
- 9) Cihimiyo!
- 10) Cegera te bişewite!
- 11) Cîranê te mîratxwarê te bin!
- 12) Ciye te yê şînê tune be!
- 13) Cinazê te ji vir rabe!
- 14) Canê te ji kul û derdan xalî nebe!
- 15) Cîrma xelkê were ber derê te!
- 16) Cûcîka wî pirç pê ve neyê!
- 17) Cil û palas te nehewînin!
- 18) Ciye te cehnem be!
- 19) Ciye te orta quncikê cehnemê be!
- 20) Çav rijiyayo!
- 21) Çav derketiyo!
- 22) Çavên te birijin ber piyên te!
- 23) Çavên te birijin ber lepênen min!
- 24) Çavên te birijin!
- 25) Çavên te derkevin!
- 26) Çavên te kor bibin!
- 27) Çavên te li deriyan be!
- 28) Çavên te li mista min bikeve!
- 29) Çavên te tim li rêyan be!
- 30) Çavên te tim li deriyan be!
- 31) Çavên te reş bin!
- 32) Çavtarî bibî!
- 33) Çavtariya mirinê bi te bigire!
- 34) Çengê te bişikê!
- 35) Çûyina te hebe vegera te tune be!
- 36) Çira te vemire!
- 37) Çavên te li destêne xelkê be!
- 38) Çavên te bipekin!
- 39) Çingin li tasa te bikeve!
- 40) Çavson bibî!
- 41) Çira te bitefe!
- 42) Çavên te piyî hevalan bin!
- 43) Çavên te ji girî xalî nebin!
- 44) Çika te agir pê negire hey!
- 45) Çırûsk bi ber çiraya te nekeve!

# DI GOTINÊN PÊŞÎYAN DA XWEDÊ >


Xwedê du tiştan bi hev ra  
nade însan. Îllim tiştek kêm  
dimîne, carna jî parsê dide  
lê tûr nade. Wextê Xwedê  
berê xwe ji meriv biguhere  
îşê meriv zor dibe,  
meriv çi bike jî bi ser nakeve.  
Pel, bê fermana  
wî jî darê naweše.  
Xezeba wî bi ser meriv da  
bibare, meriv paşopê dibe,  
îşê meriv rast naçe û meriv  
tu lezzetê ji dinyayê nabîne,  
diranê meriv di  
pelûlê da dişike.  
Lê wextê Xwedê ji  
meriv ra yar be,  
dinya tev neyar be  
jî ne xem e.



Di gotinê pêşîyan da, me Kurdan gellek caran berê xwe daye Xwedê. Carna mezinahiya wî, carna comerdiya wî, carna rehm û alîkarîya wî û carna ji hebûna wî ji me ra bûye star. Ew, xwedîyê bêxwedîyan e, qismetê gewrîya ku qul kirîye daye û dide. Hêlinâ teyrê kor ew çêdike. Ew e piştevanê mîvanan, mîvan li ser hesabê wî ne. Lewma ji tim gotine û dibêjin, mîvan mîvanen Xwedê ne. Comerdiya wî her li ber çavan e, lewma ji Kurdên me yên ku ji pesindayînê hez nakin her dibêjin pesin ji Xwedê ra, bila kes nav di xwe mede ji Xwedê pê ve. Ew herî pirr ji neheqîyê aciz e û heq navê Xwedê ye. Dibêjin du kes bi hev ra rast bin yê siséyan Xwedê ye. Ew heqê bizina kol ji ya biqiloq ra nahêle.

Berê dua û nifirêne me her li wî ne, ci baş ci xirab gellek meriv berê xwe didin wî. Meqamê wî meqamê rehmet û piyarê ye. Qeda û bela her ji wî ne, xêr û xweşî ji her wisa. Korê wî çawa li wî binêre, ew ji wisa li korê xwe dinêre. Carna însan bi xwe nagirin û gazarin jê dikin. Geh bi réya mirîskê, geh bi réya mîrikê gundî yê ku berê wî ketîye bajêr û geh ji bi réya dînekî teşe digirin ev gazarin. Lê tu kesî zû bi zû rasterast berê xwe nedayê. Carna hinek kesen bêxîret xwe diavêjin çehlê û dibêjin, Welleh Xwedê wisa li enîya me nivîsî, de ka em ci bikin? Eger yek xwe ji Xwedê bike, dibe bela serê însanan, tîrsa Xwedê, rî li ber zilmê digire. Xwedê he ye û xem tune ye, însanan xwe li Xwedê girtîye. Ciye tirs û xofê ye dinya, her kes ketîye nava vê çiroka xemgîn. Xwedê xemê direvîne. Pişt e ew ji însanan ra, piştekî pihêt. Xwedê ji sebrê hez dike, lewma ji mala wî bi sebrê hatîye avakirin.

Me xwe tenê li wî negirtîye, carna hebûna wî têr nekiyîye û me gotîye, bê Xwedê dibe lê bê xwedî nabe. Xwedê dilê me rehet nekirîye û nake lewma ji me gotîye, Xwedê du tiştan bi hev ra nade însan. Îllim tiştek kêm dimîne, carna ji parsê dide lê tûr nade. Wextê Xwedê berê xwe ji meriv biguhere îşê meriv zor dibe, meriv ci bike ji bi ser nakeve. Pel, bê fermana wî ji darê naweşê. Xezeba wî bi ser meriv da bibare, meriv paşopê dibe, îşê meriv rast naçe û meriv tu lezzetê ji dînyayê nabîne, diranê meriv di pelûlê da dişike. Lê wextê Xwedê ji meriv ra yar be, dinya tev neyar be ji ne xem e. Heke ew bide ji yek û nîvê dide. Lê heger meriv tevdîra xwe neke ew ji teqdîra xwe nake. Xwedê gotîye, tu de-wara xwe bi lingekî girê bide, sê lingan bispêre min. Xwedê dibêje, ji te hereket û ji min bereket. Lê wextê



meriv bû mîr, gerek Xwedê neke ji bîr. Carna ji meriv bala xwe didê û dibîne ku hinek kesen ku ne li hev in, Xwedê bi têra xwe daye wan. Dayox û standox her ew e. Ew carna derîyekî digire û heft derîyan vedike, lewma dibêjin hêvî Homa. Wî derd daye, derman ji daye. Ji danêne wî yek jê aqil e ku em pê debara xwe dikin û li vê dînyayê bûne serwer. Xwedê dide û daye, ew ji destgirtî û çikûzan hez nake, dayîn zayîn e, heke meriv bide meriv zêde dibe, Xwedê ji meriv hez dike. Xweda "xwe" da ye, xwe bexşî dînyayê kirîye; lewma ji me Kurdan navê wî ji "xwe" û ji "da-yîn"ê çêkirîye. Bêhna Xwedê fireh e û ew yarê bêhnfirehan e. Xwedê dijminê tu kesî nîn e, ew kerîm e û kerîm bîrtûj e ji bîr nake. Hinek gotinê n pêşîyan ên li ser Xwedê ev in:

- Bê emrê Xwedê pel ji darê naweşê.
- Bila kes nav di xwe mede ji Xwedê pê ve.
- Bê Xwedê dibe bê xwedî nabe.
- Bereketa her tiştî di destê Xwedê da ye, bereketa dew di destê dîya min da ye.
- Berxa ku Xwedê xweyî kir, guran nekuşt.
- Bila Xwedê dijminê me jî paşopê neke.
- Bila Xwedê yar be dinya hemî neyar be.
- Bitirse jî wî kesê ku ji Xwedê natirse.
- Bîzin bîzin e, Xwedê mezin e.
- Dan û standin di destê Xwedê da ye.
- Derewîn dijminê Xwedê ne.
- Du kes bi hev ra rast bin, ê sisêyan jî Xwedê ye.
- Du kes ji hev hez bikin yê sisêyan Xwedê ye.
- Ê Xwedê jê ra xera bike diranê wî di pelûlê da dişike. Gava Xwedê bide ha rakeve, ha rakeve, gava nede ha li ba keve, ha li ba keve.
- Gotin pîso tu çîma pîs î, got Xwedê li enîya min nivîsî.
- Heke Xwedê bide, ji yek û nîvê jî dide.
- Hêlinâ teyrê kor Xwedê çedike.
- Kesê bêkesan Xwedê ye.
- Kesê Xwedê jê ra xera bike xewnê pîs pêşê dikê.
- Kevrûşk dibeze, tajî li pey dibeze. Herdu jî gazî Xwedê dîkin.
- Kor çilo li Xwedê dinêre, Xwedê jî wilo lê dinêre.
- Mehra evîndaran Xwedê dibirre.
- Meriv tevdîra xwe dike û Xwedê teqdîra xwe dike.
- Mévan mîvanen Xwedê ne.
- Pesin ji Xwedê ra.
- Qedrê mîvanan qedrê Xwedê.
- Rast bi Xwedê ra, xwar bi erdê ra.
- Ruhê Xwedê nestîne naçe.
- Tu çîqas bibî mîr, Xwedê meke ji bîr.
- Wextê Xwedê da nabê tu kurê kî yî.
- Xeysetê xerab xezeba Xwedê ye.
- Xweda Xwedakî mezin e.
- Xwedê ahê destê çepê ji yê rastê ra nahêle.
- Xwedê alîkarê rastan e.
- Xwedê aqil daye ku meriv pê bijî.
- Xwedê bide ji tehtê hişk dide.
- Xwedê bide ji xet û nîvê dide.
- Xwedê carinan parsê dide tûr nade.
- Xwedê çi got wer dibe.
- Xwedê çîya dibîne, berfê lê dîbarîne.
- Xwedê du tiştan bi hev ra nade însan.
- Xwedê da Xwedê stand.
- Xwedê delîlê bêdefîlan e.
- Xwedê derd daye, derman jî daye.
- Xwedê derdê bêderman nedaye.
- Xwedê derîyekî digire heftan vedike.
- Xwedê dijminê çekûsan e.
- Xwedê dijminê kesî nîn e.
- Xwedê dikare qîrr jî bike pirr jî bike.
- Xwedê dikare vî girî bi ka ke, bîne di ciherê serê kerê min da ke, lê tiştê ku nekirîye, nake.
- Xwedê dûr dixîne derewîn naxîne.
- Xwedê gotîye dewara xwe bi lingekî girê bide, bi sê lingan jî bispêre min.
- Xwedê gotîye ji te hereket ji min bereket.
- Xwedê gotîye xwe ji ber dîwarên ketî bidin alî.
- Xwedê gwîza dide yê bêdiran.
- Xwedê he ye xem tune ye.
- Xwedê heqê bizina kol ji ya biqiloç ra nahêle.
- Xwedê ji bo dilê xizanan şâ bike pêşî cila wan winda dike paşê dide dîtin.
- Xwedê jî dijminê kesîban e.
- Xwedê jî şirîkan hez bikira dê ji xwe ra jî yek çêbikira.
- Xwedê jî yekî bistîne pêşî aqilê wî jê distîne.
- Xwedê kerîm e û bîra kerîm jî gellekî kûr e.
- Xwedê korê xwe nas dike.
- Xwedê ku bike mela dê çi bike?
- Xwedê meriv hîvz bike di hundirê kîs bike.
- Xwedê meriv ser nehş neke wehş.
- Xwedê nede bi zorê nabe.
- Xwedê paşakî mezin e.
- Xwedê risqê gewrîya ku qul kirîye dide.
- Xwedê yar be bila şûr dar be.
- Xwedê yarê bêhnfirehan e.
- Yekî xwe ji Xwedê kir, serê sed heban jê kir.



(1923-2002)

## Seydayê Tîrêj

Mem MUKRIYANI

Navê wî yê rastî Nayif e.  
Ew kurê Heso ye. Gava ew  
dighê şes saliya xwe, bavê wî  
koç dike û li gundê  
Sêmitik'ê bi cîwar dibin.  
Tîrêj li wê derê, li cem Mele  
Birahîmê Golî, Qur'anê û çend  
pirtûkên olî dixwîne. Wek  
gellek helbestvanê Kurdan,  
ew jî li dibistana olî, li ber  
destê seyda û aliman dest bi  
xwendin û nivîsandinê dike.

### Jînenîgarî

Li gor lêkolînênu ku me li ser Seydayê Tîrêj  
kirin û çavkaniyênu ku jî me re dibêjin; ma-  
moste û helbest-vanê helbesta resen,  
nemir Seydayê Tîrêj di sala 1923'yan de  
li Hesîçe'yê(Hesekê) gundê Nicîm'ê ha-  
tiye dînyayê. Navê wî yê rastî Nayif e. Ew  
kurê Heso ye. Gava ew dighê şes saliya  
xwe, bavê wî koç dike û li gundê Sêmi-  
tik'ê bi cîwar dibin. Tîrêj li wê derê, li cem  
Mele Birahîmê Golî, Qur'anê û çend pir-  
tûkên olî dixwîne. Wek gellek helbestva-  
nênu Kurdan, ew jî li dibistana olî, li ber  
destê seyda û aliman dest bi xwendin û  
nivîsandinê dike.

Ew di sala 1937'an de hatiye bajarê  
Amûd'ê û li wê derê wî dest bi dibistanê  
kiriye. Pênc salan li wê dibistanê xwen-  
diye, lê jî ber mercên aborî xwendina xwe  
nedomandiye. Li wê derê, têkiliya wî bi  
helbestvanê mezin yên wek Cegerxwîn,  
Qedri Can, Hesen Hişyar û Nûredîn Zaza  
re çêbûye û her ku çûye xurt bûye. Bi pe-  
roşî û bandora wan jî, evîna helbest nivî-  
sandinê di dilê wî de şax daye. Bi wan re  
xebata niştimanperwerî kiriye û wek gel-  
lek welatperwer û ronakbîrênu Kurdan,

Seydayê Tîrêj jî, di nava civata Xoybûn'ê de cihê xwe girkiye. Ligel nîvîsandina helbest û çîrokan têkoşîneke ramyarî jî meşandiye. Dîsa Sêydayê Tîrêj di bin bandora Cegerxwîn de dimîne û di navbera salên 1948 û 1952'an de di partiya Qomonîst a Sûrî de kar dike.

### Girtîgeh û Tîrêj

Seydayê Tîrêj di sala 1952'yan de bi destê parastina Sûrî tê girtin û dîwanek ji helbesten wî yên ne belavbûyi jî tê talankirin. Helbestvanê gewre û bi nav û deng Cegerxwîn di dîwana xwe ya "Kî me Ez"ê de, li ser Seydayê Tîrêj, bi navê wî yê rastî "Nayifê Heso" helbestek nîvîsandiye û hêviyên xurt û hêja ji wî kirine.

Ev xwendin û bîzanebûn

Nêzîk dikin serxwebûn

Xortêñ wek te pir zana

Gerek bêjin; Nezana

Bira destêñ hev bigirin

Di vê rê de em bimirin...

Ew, ji neçarî demeke dirêj xwe li nav Erebêñ Cibûran'ê diparêze û di sala 1973'an de berê xwe dide bajarê He-sîçê'yê û li wir bi cîwar dibe, heta ku ji nav me koç dike.

### Seydayê Tîrêj û Helbest

Rêjîmîn şovenîst digel talankirina dewlemendiya serxak û binxakiya welatê me, bi dijwariyeke mezin êrîşî ser ziman, tore û Folklora Kurdî jî dikin, lê herwekî xuya ye, ev armanc û daxwaza wan heta niha neçûye serî û di dilê wan de bûye kuleke mezin. Ji bo em ji bin destê van rejîmîn şovenîst derkevin, bi sedan serhildan û berxwedanêñ bi rûmet me dane; bê hejmar law û keçen xwe di vê riyê de gorî kirine. Ev şer, di warê parastina ziman, tore, û Zargotina Kurdî de jî, bi dijwârî dom dike û roj bi roj gurtir dibe. Ronakbûr, nîvîskar, helbestvan û hozanêñ Kurd yên birûmet di nava vî şerê ha de, cihekî taybet digrin. Xebat û têkoşîneke giranbiha didin. Yek ji wan helbestvanêñ bi navûdeng jî, Seydayê Tîrêj e. Seydayê Tîrêj, li ser şop û riya helbestvanêñ Helbesta Klasik ya resen helbesta xwe ristiye. Bi van çend gotinan nêrîna xwe di helbestê de diyar kiriye.

"Ez li helbestê bi nezim, awaz, qafiye (serwe), û nave-roka wê dinêrim. Ev her çar şert wê dikin helbest".

Seyda, rûmet, ronahî û cewherê helbestê jî weha dibîne:

Ma rûmeta şî'rê çi ye, ned' kar û bara netew de bî

Ronahiya şî'rê çi ye, pesnê welat kû têd' nebî

Çi bikim ji wê şî'ra rijî, danegire dilketin û mejî

Derdê dil û jan nekûji, çaxê kû cewher têd' nebî.

Ew, li gor dîtina xwe van mercan ji bo helbestê dibîne, û ji xwe re dike mîna per û baskêñ teyrekî baz ku bi yek firrê baskê xwe li esmanê helbesta resen dide û xwe di kûrahiya dilê xwendevanê helbesta Kurdî de cîwar dike. Germahiya tîrêja helbestê, pencêñ xwe di dil û hestê xwendevanan de rewa dike, û xwendevanê xwe di nav tevna wê de dil dike. Bi vê raza nepenî, tevzinokêñ xweşî coş û peroşiyê xwe li dil, hest û derûniyê digire. Li pişt vî bazê serbilind, bazezkî şêt û bêhempa di qada helbesta Kurdî de heye. Ew baz jî Seydayê Nemir Cegerxwîn e.

### Seydayê Tîrêj û Cegerxwîn

Tîrêj, di bin baskê helbesta Cegerxwîn de berz û mezin dibe. Hînî perwaze û firrê dibe. Di behra Cizîrî û Xanî de hînî melevaniyê dibe. Li nik wî, bejna helbestê pir bilind, bi xeml û xêz û bi kês û serwe ye, bi zimanekî rawan, pesin û halan, gazin û hêviyên rewşa gel di jîna jiweriyê de, di yek hest û hîzîrî de, li ber tîrêja ronîkirina rîya his-yariyê tê meyandin. Wek ku me got, bi awayekî klasik helbesten xwe dihone, kêşa helbestan li ser movik û bi bare ne. Çawa Seyda di bin baskê helbestvanêñ me yên klasik de mezin bû, wiha reng e ku gellek helbestvanêñ me yên kilasîknîvîs jî di bin bandora Seydayê Tîrêj de mane, û bandoreke xurt li nîfşê pey xwe kiriye.

### Azîz û dibistana helbestê bû

Ew, bi reng û bûyerên gelê xwe ve pir girêdayî bû. Eger mirov li rêzkirina naveroka helbesten Seyda bi hûrgulî binihîre, mirov xeleyen dîroka gelê xwe, bûyer û serpê-hatiyên wan gav bi gav, dem bi dem dibîne. Ji wan bû-yerên a herî balkêş a ku bû sedema xweşîr û şîrîntirîn helbest, ku bi Seydayê Tîrêj re da der. Ew kuştîyarî, talankirin û malwêrankirina ku bi serê gelê Kurd hatibû. Têkçûna peymana 11'ê Adar'ê bû. Seyda, hêtûna derûniyâ wî, kelandin û lihevketina hundirê wî, sergêjî û pi-zotêñ hest û hinavên wî bi hev re ew dane ber pêlan û peqikan, li esmanê toreya Kurdî helbesta "Ey bilbilê dil-şadî" hat vejandin. Ev helbest nûzayeke nû bû di dîroka

helbesta Kurdî ya resen de. Em dikarin bibêjin Seyda bi vê helbesta xwe derbasî gerdûna xweşirîn helbestên Kurdî dibe.

### Naverok û mijarêن helbestên wî

Ew, di helbestên xwe de, zor û gazinkariya li ser nete-weyê Kurd, hoy(şert) û sedemên bindestiya gel, û ji bo rizgariya Kurdistanê pêwîstiya têkoşîneke yekdest û canbêzariyeke bêsinor didit, bi hunermen-diyeye mezin û bi zimanekî şîrin û zelal ev rewş anije zimên. Têra xwe, bi derd û hesret, xweşî û nexweşî, peşketin û pêşve-çûna gelê xwe ve dijiya. Digot; bi lavlavan mirov nagihê armanca xwe. Têkoşîn şana hebûnê ye. Bi baweriyeke bêbend û sînor rizgariya Kurdistanê bi şerê çekdariyê dibîne, û dibêje:

Ez nerevim nerevim pêşmerg im ez nerevim

Wek hîm û tehtê çihê tû car ji cîh nalivim

Bi zaroktî dayê min şîr daye min bi xwînê

Dinya li min bî yek bî ji ya xwe danakevim

Bi rastî Seyda, heta bi roja dawîn di jiyanâ xwe de, ji ya xwe nehat xwarê, û digel ku ew bixwe ji malbateke xizan û perîşan bû ji, lê wê yekê tu carî nekarî çavkaniya helbestên wî ziwa bike û bîmîçiqîne, yan jî berê pênuşa wî ji bîr û baweriyeñ wî biguherîne. Bi pênuşeke bejin-bilind û zimanekî rewan û zelal, her çavkaniyê wî diherikin û dizan. Seyda, li ser ax û haveynê welatê xwe mezin dibû, û pirr ji xweza û xweşikiya welatê xwe hez dikir. Girêdaneke xurt di navbera Seyda û xwemaliya welatê wî de hebû. Di helbestên xwe de pirr li ser av û dar, gul û giya, deşt û çiya, mîrg û kanî, bihar û zivistan, dehl û zevî û tebayêñ welatê xwe digot. Navên her sê dîwanêñ wî jî navêñ ciyayêñ Kurdis-tanê ne. (Xelat, Zozan, Cûdi). Binavkirina dîwanêñ wî pirtir ji me re diyar dike bê Seydayê Tîrêj çîqasî bi xweristiya welatê xwe ve girêdayî bû.

Ew, di temenê xwe de kalemîr bû, lê berê dara evîna wî naz e, ciwan e. Xweşir û ciwantirîn helbes-têñ evîniyê honandine, û li ser hezkirin û evîndariya keç û xor-tan û yar û dilberan lorandiye. Seyda ne tenê li ser hezkirina keç û xor-tan nivisandiye, lê belê rola keç û xor-tan xwendevan di rêvehirina kar û xebatê de mîna serê rimê dibîne û bi dengekî bilind hawar û gaziya xwe digîhîne xor-tan xwendevan û ji wan dixwaze ku bi rola

xwe ya dîrokî rabin. Seyda, gellek stranê folklorî bi kêş û serwe û bi hunereke pirr mezin û bilind honandiye.

### Tîrêj û folklor

Li gor Weşanên Kovara Zanîn 1'ê ku pêşgotina wê Ebdul-baqî HUSEYNÎ nivîsiye, bi navê Serpêhatiyê Kurdistan ku li Enstituya Parîsê, di sala 1992'yan de hatiye derxistin de hatiye gotin ku; "Seyda berhev-kariya gellek serpêhatiyê Kurdistan kiriye." Serpêhatî rastî bi xwe ne. Têna nivîsin da ku mirov ji xwe aqil ji wan bigire. Di nav berhema Serpêhatiyê Kurdistan a ku Seydayê Tîrêj tomar kiriye de cih daye serpê-hatiyê gellek kesen bi navûdeng ku her yek bi serê xwe belgeyeke dîrokî ye. Ji wan kesan hin jê ev in: Elî Axayê Millâ, Hesen Kêfê ku navê wî li Heskîfê hatiye kîrin, Ferhoyê Kurê Ezér Axa, Mîrê Hekaryan, Bedir-Xan Beg, Elî Remoyê Axayê Eşîra Rama, Temir Paşa, Mezinekî eşîreke Kurdistan Serhedê İbo Beg, Mezinê eşîra Zîla Hisen Azayê Zîlî, Mîrê Millâ, Mîrê Cizîra Botan Mîr Zeynedîn, Şêx Saîd, û gellek serpêhatiyê din di nava xwe de dihe-wêne ev berhema Tîrêj. Seba vê yekê em dikarin bibêjin ku Seyda bi vê danheviya xwe roleke baş lîstîye. Û em dikarin bibêjin ku Seyda daye ser şopa çend kesen hêja yên berê xwe. Mîna: Mîr Celadet, Cegerxwîn, Heciyê Cindî, Erebê Şemo, Sadiq Bahadîn Amêdî, Pîrêmerd û hwd. Van kesan xwe bi berhevkarîya folklorê mijûl kîrine da ku karibin çand, ziman û edetên Kurdistan ji windabûn û diziyê biparêzin.

Danheviya serpêhatiyan karekî girîng e û neteweşî ye, divê tu carî sistî nekeve vî karî. Seydayê Tîrêj jî texsîr nekiriye û di şevbuhêrkan de ci tiştîn ku dibihîstin di-nivîsin û kom dikirin. Heta ku hejmarên serpêhatiyan gîhiştiye 45 heban. Şanikeke büçük heye dibe ku Seyda ji bîr kiriye. Gellek bûyer di van serpêhatiyen de hene, dem û deverêñ wan di dîroka gelê Kurd de diyar in lê mixabin Seyda xwe nebîlîndiye û dem û dever nîşan nekiriye. Tiştekî din heye Ebdul-baqî Huseynî dibêje: "Dema me ji Seyda dipirsî ka te ev serpêhatî ji devê kê girtine?" Wî gotiye: "Min ji civatan girtine." Bêyi ku navê kesekî/ê bibêje. Û herwekî ku di wan serpêhatiyen de dixuye zimanê wan zimanê devkî ye. Mîna van çend go-tinêñ jê... mi=min, dibê=dibêjin, wa=wân, dî=dît, hwd. Huseynî dibêje herdem me ji seyda re digot: "Zimanê nivîsandinê ne wek zimanê devkî ye, lê Seyda ji ya xwe danediket." Û digot: "Wilo bihêlin." Ev rîbaza ku Seyda

Ew, di temenê xwe de kalemêr bû, lê berê dara evîna wî naz e, ciwan e. Xweştir û ciwantirîn helbes-tên evîniyê honandine, û li ser hezkirin û evîndariya keç û xortan û yar û dilberan lorandiye. Seyda ne tenê li ser hezkirina keç û xortan nivisandiye, lê belê rola keç û xortêñ xwendevan di rêvebirina kar û xebatê de mîna serê rimê dibîne û bi dengekî bilind hawar û gaziya xwe digihîne xortêñ xwendevan û ji wan dixwaze ku bi rola xwe ya dîrokî rabin.

di berhevkirinê de bi kar anije di dema wî de nehatiye famkirin, lê îro em dizanin ku ev rîbaza ku Seyda di desifrasyonê de pejirandiye û bi kar anije yek ji rîba-zêñ berhev-kirina berhemêñ folklorik ên zanistî ye.

Dema ku Kovara Zanînê jî derxistine ji bo Kovara Zanînê jî ev angaşt armanc kirine û gotine: "Folklor armenceke ji armencêñ Kovara Zanîn'ye. Parastina Zargotina(folklor) )Kurdî û nîvîsandina wê yek ji armencêñ kovarê ye." Dîsa Ebdul-baqî Huseynî gotiye ku: "Seyda berhema xwe ye bi navê Serpê-hatiyêñ Kurdan bi tîpêñ Erebî nîvîsandibû, lê me guhert tîpêñ Latînî."

### Xatirxwestina Seydayê Tîrêj

Seydayê henûn û kezebşewitê welatê xwe, bê râwestan piştî ewqas kar û barêñ siyasi, çandî, edebî û folkorî ku li pey xwe hiştin û di dilê peymayîna xwe de cihê xwe çekir pê ve roja Şemiya 23'yê Adar'ê ya 2002'yan de berî niha bi 13 salan li Nexweşxaneya Dr. İsam Bexdê ya li bajarê Hesîç'ye çû ber dilovaniya Xwedê. Hezar rehmet li gora wî be ku mîrate û keleporeyek li pey xwe hişt û çû.

#### Çavkanî:

- S. Tîrêj, Serpêhatiyêñ Kurdan 1., Pêşgotina Ebdul-baqî HUSEYNÎ ya Kovara Zanînê 1
- Azadiya Welat, Hejmara 24'ê Adarê 2015'an
- Wikîpediya, Murat Bora(Xerzî Xerzan) Ji bo bîranîna helbestvanê mezin Seydayê Tîrêj, 24'ê Adara 2015'an.

#### Berhemêñ wî yên çapkiri ev in:

- Dîwana Xelat, pêşgotin: D. Zengî, Beyrût, 1985
- Dîwana Zozan, pêşgotin: D. Zengî, Beyrût, 1990
- Dîwana Cûdî, pêşgotin: D. Zengî, Beyrût, 1998
- Serpêhatiyêñ Kurdan (1)
- Dîwan (Xelat, Zozan, Cûdî)
- Weşanêñ Peywendê, Stenbol, 2014
- Serpêhatiyêñ Kurdan(1-2), Weşanêñ Peywendê, Stenbol, 2015
- Mewlûda Pêxember, Weşanêñ Peywendê, Stenbol, 2015

#### Berhemêñ wî yên neçapkiri ev in:

- Dîwanek ji helbestan.


#### Herwiha Seyda sê caran jî hatiye xelatkirin

- Xelata Roja Helbesta Kurdî li Sûriyê 1995
- Xelata 100 Saliya Rojnamevaniya Kurdî, Hewlîr, 1998
- Xelata Koma Helebçe ya Folklorê Kurdî li Cizîre, Hesîç, 2001



# MAST

## û Sed Caran Mast



Amadekar  
Dilan ŞEWÊŞOXLU

Yusuf Akkan

Carekê ji caran sê mîrik li bin darekê rûniştibûn.

Navê yekî Hopo bû, navê yekî Silo bû û yê din jî Boto bû. Boto di nav mastî de mabû, Hopo gepa wî qul bûbû, di nav xwînê de mabû û Silo jî di nav hêk û rûnî de mabû. Her sê ji malê reviyabûn, xwe dabûn li ber siya darê û rûniştibûn. Kalek di ber wan re derbas dibe û silavekê dide wan. Pişti silavê her sê bi hev re dikevin nîqaşê. Ew dibêje; "silav da min." Yê din dibêje; "na na! silav da min." Ü nîqaşa wan bi vî awayî berdewam dike. Di dawayî de dibêjin ku; "hîn kalo bi dûr neketiye em biçin ba wî û jê bipirsin; gelo ka silav daye kêt?"

Welhasil diçin ba kalo, disekinînin û jê dipirsin:

- Kalo te silav da kê?

Kalo got:

- Lawo! Hema di nava we de kî herî zêde mîr be, min silav da wî.

Hopo got:

- Wî çaxî te qet silav nedaye min.

Kalo got:

- Çîma, ev ci rewşa te ye tu, di nav xwînê de mayî û gepa te jî qul e xêr e?

Hopo got:

- Qet nepirse kalo, yaw ez iro çûbûm cot, ez pîr westiyabûm û min got îcar ez biçim malê fîravinê bixwim.

Kalo got:

- Èêêê?

Hopo got:

- È, welleh ez çûm, min nihêrt xanimê kutilik çekirine û daniye li ser kuçîka agîri. Min çiqasî got ku; "kêcê! Ka yekê tenê bide min, ez gellekî birçî bûme." Neda min û got; "quzilqurtê bixwe, ez nadim heta ku hemû tev de nepijin, tu yekê tenê jî li devê xwe nadî." Welhasil ez rûniştîm li ber kuçikê û heta xanim ji wir çû. Çawa xanim çû, min dest avêt kevcîyekî, min di nav qoşxaneya kutilikan de gerand, min yek deranî û min avêt devê xwe. Gellek germ bû, heta ku min di devê xwe de sar kir, da wî alî û da vî alî, hîn sar nebû, min ji tırsan da gepa xwe, min dît ku xanimê hat û got; "kuro! Qey te kutilik xwarin?" Min got; "na hirmet ez li bextê te me, min nexwar." Xanimê got; "nexwe çîma gepa te werimiye?" Min got;

"iro dema ku min cot dikir, mîşa hingivî bi gepa min veda û niha jî werimî ye." Xanimê got; "himmm! Ka were em biçin ba hekîmî û bila lê binêre ka ci bûye?" Min got; "na hirmet! Hewce nîn e. Bixwe bixwe wê baş bibe." Xanimê got; "kuro! Ez dibêjim te were, em biçin dirêj neke!"

Welle ji tırsan min newêrî ku bibêjim kutilik e û xanimê bi darê zorê ez birim ba hekîmî. Dema ku em çûn, hekîmî lê nihêrt û got; "tiştek nebûye tenê werimî ye, edab girtiye û ez ê cilêtekê lê bixim wê baş bibe." Çawa hekîmî cilêt lê xist kutilikê got; "vişşş!" Ü ji gepa min re derket. Xanimê dît ku kutilik e, dîn bû û got; "ker kurê kerî! Tu bêyî min kutilikan dixwî û tu derewan jî li min dikî." Welleh li min xist, ez jî reviyam, hatim binê vê darê û ez niha jî newêrim biçim malê.

Kalo got:

- Wîj! Heyla tu nemayî, nemêro!

Pişti meseleya Hopo, Kalo vêca berê xwe da Silo û got:

- Te xêr e? Tu çîma di vê rewşê de yî?

Silo got:

- Xalo! Meseleya min jî xirab e û ez belengazekî Xwedê me.

Kalo got:

- Ka bibêje te ci kir?

Silo got:

- Xalo! Min nêzîkî pêncî mirîşkan heye, rewşa min a aborî jî baş e û vê sibê ez ji xew rabûm. Dilê min pir diçû hêkerûnê. Ez rabûm û min got hevjîna xwe:

- Canê ka du heb hêk ji min re çê bike, bike hêkerûn, ez ê bixwim û biçim kar.

Canê got:

- Gû bixwe! Dev û lêvên te yên hêkerûnê ne?

Silo got:

- Keçê! Temam xwe hêrs neke ez ê çê bikim.

Canê got:

- Naa! Tu jî çê nakî, rabe here û min hêrs neke.

Canê nehişt ez çê bikim û bixwim. Wê jî kar û barê xwe dikir ew çû li ser kaniyê da ku balavê bike.<sup>(1)</sup> Min jî xwe li malê mijûl kir heta ku ji malê derket, ez rabûm û çûm.

(1) Karê şûştina serê zarokan û cilan li ber avêçemî, berav



Min li koxika mirîşkan nihêrî, min du heb hêk dîtin, piştre ez beziyam medbexê, hinekî rûn û miqilk jî min bir, çûm li ber kuçîka agîrî û min agîr pê xist. Çawa agirê min pê ket, min nihêrt dengê hevîna min tê, hema min ji tîrsan rûn bi şalwarê xwe de vala kir, min hêk jî kirin kûmê serê xwe, min miqilk avêt kunekek û ez rûniştîm li ber agîrî. Canê hat û got; "kuro silo!" Min got; "hey libê cana min!" Canê got; "tu li ber vî agîrî cî dikî?" Min got; "wel-leh hema ez iro çûm kar, kar tune bû, ez jî hatim malê û li ber vê kuçîka agîrî jî xwe re rûniştî me.

Çawa min wisa got, hêdî hêdî rûnê ku di şalwarê min de heliya, hat xwarê û şalwarê min şil bû. Canê dît ku şalwarê min şil bû, rabû û got; "heylê nemayı neméro! Di vî temenî de bi xwe de dimîzî" û got; girimm! Li serê min xist. Çawa li serê min xist, hékên ku di kumê min de jî şikestin û hatin xwarê. Canê fêm kir ku hêk in, rabû ser xwe, li min xist û got; "kerro! Tu bêyî min hêkan dixwî?" Li min ba ket daran<sup>(2)</sup>, ez jî ji tîrsan reviyam û ez niha jî biçim malê wê dîsa li min bixe.

Kalo got:

- Kuro tu jî newêrek î, heyla tu jî nemayı!

Piştî Silo jî meseleya xwe vegot ma Boto. Xalo vêca ji Boto pîrsî:

- Tu cîma wisa di nav mastî de mayî?

Boto got:

- Xalo! Ez jî ji mastî gelek hez dikim û hevîna min qet

nahêle ez mastî bixwim. Serê sibehê ez rabûm, min ji hevîna xwe pîrsî; "mast heye keçel!" Jinikê got; "kevirên bestê heye, tu yê bixwî? Ev ci ye her roj mastî dixwazî. Hema iro neziqumîne. Ez niha diçim malbava xwe, ez ê piştî saeteke din dê vegeirim, heke tu mastî bixwî, ez dizanim ez ê ci li te bikim. Min got; "temam canê oxir be." Çawa hevîna min çû, ez jî rabûm, çûm min li medbexê nihêrî û min sitîlek mast dît. Min sitîla mastî û kevçiyek anî. Ez ketim ser, min sitîla mastî nîvî kir, heta ku min karî min xwar û yê ku mayî jî min bi serê xwe de rijand, da ku kerba dilê min vala bibe. Ez rûniştîm heta ku hevîna min hat. Çawa hat, ez di nav mastî de dîtim, hema pîtepît kir û got; "wî wî! mast, mast!" Min got; "erêêê! Maaastt ox mast! Mast û sed caran mast! Jinikê got; "te mast xwar?" Min got; "erê, min xwar tu jî serê min bixwe." Çawa jinikê ez di wê rewşê de dîtim hema dîn bû, dest avêt gopalekî û li min xist. Ez jî reviyam, hatim li vê derê û içar te silav da kê?

Kalo got:

- Min da te lawo! Qet nebe, te mast xwariye.

**Çavkanî:** Xazî ŞEWÊŞOXLU

**Temen:** 48

**Perwerdehî:** Xwende

**Herêm:** Cizîr/Botan

**Sal:** 2011

(2) Bi daran lêxistin

# Serpêhatiya Mala Kapreşyan



Berhevkar: Pınar ÇAKIN YAMAN

Li gundê Kilanê yê girêdayî Erxeniya navçeya Amedê malbatek dijiya. Ji ber ku pirr caran pêxwas digeriyan, lingên wan li ber tava havînê reş bûbûn, ji ber vê yekê ji wan re digitin Mala Kapreşyan.

Şevez ji şevan dema ku malbat di xew de ye, bi dengê repîna simêن hespan bi xwe dihesin. Guhdarî dikan ku hespêن wan wekî ku hinék lê siwar bûne û hesp dane çargaviyan di axur de direvin. Mêrên malbatê diciñ mêze dikan ku kes li axur tune ye û hesp rawestiyane. Vedigerin mala xwe û disa radikevin. Piştî demeke kurt disa dengê simêن hespan tê diciñ mêze dikan ku tiştek tune ye. Ew rewşa han heta serê sibehê didome. Şevez, du şev, sê şev... Malbat lê dikeve şikê ku yan kesek dikeve axura wan, yan jî tiştek xwe digihîne hespan. Difi-kirin, dibêjin em ci bikin ci nekin. Radibin qîrê di pişta hespêن xwe didin. Serê sibehê radibin, diciñ axurê ku ci bibînin? Pirewotik li ser pişta hespeki siwar bûye û pê ve zeliqiye, yeke reş e û porê wê li serê wê gjî bûye. Ji ber ku pirewotik ji hêsin ditîrsin, tînin şûjinê di ber sîngâ wê re dikan û tînin malê. Demeke dirêj pirewotik bi wê malbatê re diji. Karê wan dike, şîva wan çêdike, kîncen wan diço, nanê wan lê dixe. Gora ku qal dikan, dibêjin ku; destê wê pirr sivik û bibereket bû. Ji hinék arvan gellek hevîr çêdikir û gellek nan lê dixist. Çend meh bi vî awayî derbas dîbin. Rojekê pirewotik dibêje:

- Qey mala min heye, mîrê min û zarokê min hene û li malê li benda min in. De hûn min berdin ez herim mala xwe.

Malbat dibêje:

- Temam em ê te berdin. De ka bibêje, mala te li ku derê ye? Em ê çawa te bigihînin mala te?

Pirewotik dibêje:

- Mala min di binê çêm de ye. Min bibin ber çêm.

Radibin wê dibin ber çêm. Pirewotik dibêje:

- Ez ê niha xwe biavêjim nav avê, heke ku kefa spî bi ser avê bikeve, hûn ê bizanin ku mîrê min ez efû kirime. Heke ku xwîna sor bi ser avê bikeve, hûn ê bizanin ku mîrê min ez kuştîme.

Gurm û xwe diavêje nav avê. Piştî çend dequeyan mêze dikan ku xwîna sor bi ser avê ket. Fahm dikan ku mîrê wê ew efû nekirîye û wî ew kuştîye.

**Çavkanî:** Nazîfe ÇAKIN

**Temen:** 51

**Perwerdehî:** Nexwende

**Herêm:** Gundê Girya/Erxenî/Amed

**Sal:** 2014



# DIMSA TORÊ

Kurdan ji serdema ku dims, bastîk, beniyan(xarûzan) çedikin re digotin "milbex" di dema berê de milbex sî yan jî cil rojan didomiyen. Niha bi saya teknolojiyê dema milbexan jî kin bûye. Niha em werin çêkirina dimsê. Pêşî beroşen xwe yên 10-15 cêr av digirin û ji sıfir hatine çêkirin, yek li pêş û ya din jî li paş dixin.

Kurdistan welitekî tev xêr û ber e. Di nava vê xêr û berê de dimsa herî navdar a Torê jî cih digire. Dimsa Torê bi hezar salan ji aliyê dê û bavén me ve tê çêkirin, lê mixabin di derbarê çêkirina dîroka dimsê de dîrokeke ku em bizanibin tune ye, lê tê xuyakirin ku mirovên hilberînên xwe yên zêde wekî; tirî, hêjîr, tû, zebeş.... hwd. ji bo ku ji xwe re bihêlin zivistanê hişk kirine û ji wan dims çêkirine.

## Çêkirina Dimsa Torê:

Dimsa herî baş û ji tenduristiya mirovan re qenc ji tiryî mezrone çêdibe. Tiryî mezrone cureyek ji tiryîn e. Di meha cotmehê de digihîje û ji çêkirina dimsê re amade dibe. Dims cîma ji tiryî mezrone çêdibe? Ji bo ku şîreya tiryî mezrone ji wan cureyên tirî pirtir e. Li gellek heremên Kurdistanê ji bilî tiryî mezrone cureyên tiryîn wekî zeytî, gurmîk, tiryî reş, tayfî hwd. jî çêdibe; lê şîra wan wekî tiryî mezrone zelal û tenik nabe.

Ava ku ji wan cureyên tiryîn derdikeve wekî tiryî mezrone baş nabe. Lewma ji tiryîn mezrone re dibêjin "şahê tirî", tiryî şîra/şîre jî jê re tê gotin. Hem xwarina wî xweş e, hem jî dimsa wê bêhempa ye.

Kurdan ji serdema ku dims, bastîk, beniyan (xarûzan) çedikin re digotin "milbex" di dema berê de milbex sî yan jî cil rojan didomiyen. Niha bi saya teknolojiyê dema milbexan jî kin bûye. Niha em werin çêkirina dimsê. Pêşî beroşen xwe yên 10-15 cêr av digirin û ji sıfir hatine çêkirin, yek li pêş û ya din jî li paş dixin. Kûrika êgir û dora beroşan bi heriyê xwesik diseyînin.

Piştre jî pale diçin tiryî mezrone jê dikin û tînin mahsertê, angò di hewtê de berdidin telîsê mezin û bi potinê dieciqînin. Heta ku av tê de heye dieciqînin û diguvêşin. Ava ku ji tirî derdikeve xwe berdide hewta binî û di hewtê de ava tirî dizele. Piştre bi céran dadigerin û safokan li ser beroşen xwe yên sıfir dikin ji bo ku sisikê

Nasir ASLAN

tirî û qaşilêñ tirî nekevin beroşen sifir. Bi şûn de di nav her beroşekê de kulgîk nikarê<sup>(1)</sup> davêjin û agirê xwe didin binê kûrîkê. Nêzî 30-40 deqqe kef bi ser beroşan dikeve divê yek wê kefê bi réya kef-girê bigire û berde lîsikê. Lîsik ji bo ku ew kef tê de biwerive<sup>(2)</sup> û bi ava tê tirî ziyan nebe tê bikaranîn. Lîsik ji zembîleke kevn çedîbe ku hew bi kar were. Nava zembîle bi botafa hişîn xweşik dadigirin û zembîlê dadinin li ser du daran paşê ew kefa ser beroşan berdidin lîsikê û beroşeka datînin binê zembîlê ji bo ku ava biwerive bîkeve nav. Ava ku diwerive bi wê teknîka Kurmancî ziyan nabe. Ava tirî ku saetekê keliya ji beroşen sifir vala dikin beroşen din û ew nikara ku avêtine beroşan, beroşen xwe paqîj dikin. Ku paqîj kirin ava xwe ya kewitî<sup>(3)</sup> dîsa nêzî 3 û nîv yan jî 4 saetan dikele. Mirovên ku di çêkirina dimsê de bûne pispor radihêjin kefgira xwe ya sifir û di nava beroşan da dikin paşê kefgira xwe bi ava ku bi kef-girê (kewaşkê) ve dibe bilind dikin jor hinekî dûri beroşen xwe dikin ji bo bice-mide dikeyînin û dimeyînin. Heke dimsê xwe ji kef-girê wekî pelê çilo berda, hingê dimsâ me hatiye hedê derxistinê. Dimsa ron û tîr li ser kelandina zêde ye. Ku hûn zêde bikelînin yê dims tîr bibe, lê ku em kêmî 4 saetan bikelînin wê demê dimsâ me yê ron bibe. Ku dimsê wekî pelê çilo xwe ji kef-girê berda divê wê demê agir bes bê dadan. Beroşen kûr ku ji bo dimsê ne, tînin û bi kodan dimsâ xwe li ser êgir vala bikin beroşen din. Dema tê valakirin divê dims tê de bîquerise. Ku bi germ vala bikin nav metarayan<sup>(4)</sup> an jî cêran dê dims tirş bibe.

### Fêdeyên Dimsê:

Pispor dibêjin di nava 100 grama dimsê de %79 karbonhîdrat(şekir) û 324 kalorî heye. Her wekî din jî hesin, fosfor, qalsiyum, potasyum mîneral jî tê de hene.

Dims ji sermayê re, kêmîxwînî, ji çêkirina xwînê re, ji mejî re ji jinênu ducanî re, ji nexweşiya tûberkîloz re ji sedî sed derman e. Ji xeynî wan nexweşîyen me li jor jimartin li ser şixulandina gurçik, rovî û mî-deyan(aşik) ji bandoreke erêni dike.

Va zivistan hat. Ji bo ku em nexweş nekevin divê em serê sibê di xurîniyê de nîv qedeh ji dimsâ Torê (Kercewsê, Hesarê, Tilhesenê, Stewrê) vexwin.




[1] Axa spî ya ku ji bo kelandin û paqîjkirina şîreyê tê bikaranîn.

[2] Dawerîvîn, dalepîn

[3] Ava keliyayî ya ku bêhna xwe berdaye

[4] Bîdôn



## ELOYO ZİRKER

Arêkerdoxe: Derman UNGUR

Ca beno nêbeno yew Elo beno yew zî dew bena. Elo tim zir keno a dew se kena nêkena tede sere nêşêna. Yew roj Elo sey her wext vono nê hawa biyo a hawa biyo ziro keno. Dewijî her yew, yew ca ra vonê; rîyê to siya bo Elo' û yê fetelnenê dew re teber kenî. Elo dono piro şon yew dew di hirê roj ra pey agêreno dewe xo. Elo keye reseno ku leyîrê dewijon şîyi gîyê xo kardî lûcinde yê pir kardî. Elo hindi ke hîrs beno vono; 'ya willahî ez se ko ez senî hawa yew film biyero sereyê ên dewijon kê ez heqê xo yên ra bigiro û ez pêrên re bixeleso. Elo kayê xo hadre keno.

Elo warizeno aye gî mî lûcin re vejîyeno û wişk keno, dekeno yew pêlek, herê xo ser nono û şono dewe re geyreno û vono:

- Guvguvik mîro omewo rotîş, guvguvik mîro!

Milet çew nêzone guvguvik mîro çine wo Elo ra parsenî; 'guvguvik mîro çine wo senîn o?'

Elo vono:

- Ne erîyeno ne zî roşîno.

Elo raşt vono ne erîyeno ne zî roşîno. Di tenî yewbinan ra vonê bê ma tiki bigirê ma hey veynê çine wo ên mîrat. Tiki ginê ewnenê ti ra, ay toy rind wişk nêbiyo destê mirdek re sawino mirdek qîreno vono:

"Willay ên giyo Elo ma xapîneno." Û dest xo senî weşîneno dest yê gunen kera re gjîşa yê dejena û gjîşa xo arzeno fektê xo. Gjîste xo reyde gî zî dekeno fektê yê xo pêze de vono; 'willay min ên gî ward ez ênkey vajo gî yo nêbeno, ez yên ra vajo şîrîn o wa yê zî borê wa min re nêvajê to gi ward. Ay binon ra vono willay şîrîn o.' Elo dono piro şono dewanê bînon ra geyreno û yerey heqbeşî pir kelmel agêre-no dewe xo. Dewijî ti ra parsenê vonê:

- To se kard Elo, ti şiyî sere?

Elo vono:

- Min ay gi bard rot û min pey kelmel girewt perey gi rewrt û ez omewo.

Dewijî vonê:

- Herew to gi senî hawa rot?

Elo vono:

- Willay min pêrên rot.

Dewijî xo miyonê de vonê; 'a hawaye se ma zî sibe şîrî bîroşî'. Roj bîn yê zî gî xo gînê û benê rotîş. Yê sey Elo nêzonê vajê şonê vonê:

- Gi omewo rotîş , gi omewo rotîş.

Milet pey re fetelnene vone "gi senî roşîn!" derbonê xo wenê û pey ser yenî dew. Hindik hîrs benê vonê ma gere şîrî Elo bikişî. Senî ma îna hawa xapîna. Elo zono awa kenê yê senî yenî Elo remeno yê zî

dime nonê. Elo pey dewe de yabone ewneno kê yew şone ha bizo çirayneno. Şone senî Elo veyneno ti ra parseno:

- Se biyo ên ci rî to fetelnenê, ci wazenê to re?

Elo vono:

- Têmedi, ay min re vonê illehem keynaya paşa bigiri ez vono ez nêgîno aye seme min dime nonê.

Şone vono:

- Bê ma cilon xo bibedelnê ez keynaya paşa bigiro.

Elo vono:

- Beno.

Şone cilonê Eloyê pay keno û dewijon vere vaz dono

Ü vono "Ez gîno, ez gîno!" Dewijî vonê ti çine gînê kurtikê zayê kutikî û yew êzim hawanonê donê orteyê seredê yê. Mirik weyre mireno benê arzenê ro mîyon û şonê dew.

Tarî beno Elo bizon şonê xo ver şonenô beno dekeno axurê xo. Nimaj wardene kê Elo ha dewe de û yew dina zi bîzê yê bîyi. Dewijî parsenê:

- Elo ti kure re omey ma eyn to kîş eşt ro mîyo ti senî hawa vejîyayı?

Elo vono:

- Lila tew şima ez eşt kinare, şima mîn bieştin aye orte min di hind ênno biz ardin. Şima mîn est kinare haye min ênno xelesna. Aye Kî orte di bî ez nêresawo bide. Werrekna şima min tîkîna aver bieştinî.

Dewijî şaş benê û vonê:

- Biz senî hawa binê awe de monenê?

Elo vono:

- Willay binê royî pir bî.

Dewijî vonê:

- Ma zî şêrî xo rê biyerî.

Elo vono:

- Şêrî yalnız şima kê xo eşt vejî leweyê kera ser û xo pête bişidinî û xo biarzê, kom şero hete ortê ay zaf ono.

Dewijî roj bîn wardenê têreyde kuwenê û şonê royê ver. Yew yew cilon xo vecenê, vejinê leweyê kera ser û xo şidînenê arzenê royî mîyo. Tekek xo arzen esnaw nêzonê vonê "bil bil bil" kuwenê binê awe fetesînê. Yew dapîre feqîr weyre monena. Vengo bil bil a dewijon yeno dapîr, Elo ra parsene vone:

- Lajim ayê vonê se

Elo vono:

- Ayê vonê dapîr ma to rê kolînon biyerê, no qoçinon bîyerê?

Dapîr vone:

- Wa ey min kolin bî, qoçin pişe min dirnenê.

Elo vono:

- Beno dapîr.


Guda dapîr zî gîno arzeno royî mîyo. Elo agêreno şono keye, a dew yê rê monena. Elo pey zironê xo yew dew gezenç keno.

**Çime:** Hacî UNGUR

**Serrê aye:** 50

**Herêm:** Hacîson/ Pîran/Amed

**Serre:** 2015



# Peyayê Sivik

Çavkanî: A.Wehabê Silêmanê Hacîyê Remê


Temen: 47

Perwerdehi: Nexwende

Herêm: Gundê Eynê/Mişar/Bohtan

Sal: 2014

Amadekar  
Kurdjan SORÎ



Dibêjin di wextekî de Koseyek hebû, lê tobe kiribû û ji dev Koseiyê berdabû. Rojekê çelekekê teslimî kurê xwe dike û dibêje:

- Kurê min, vê çelekê bibe bajêr û bifiroşe, lê nebî tu ji sê zêran kêmter bidî.

Kurik dibêje:

- Baş e bavo. Tu mereq neke, ez zêdetir nedim kêmter nadim.

Kurik, çelekê dide pêşîya xwe û dikeve rê. Diçe bajêr çelekê dibe cihê celeban û qesab û celebvan lê têñ hev û dibêjin:

-Xorto, tu vê çelekê difiroşî?

Kurik dibêje:

-Erê. Ez vê difiroşim.

Dibêjin:

-Çiqasî ye?

Kurik dibêje:

-Çar lib zêr.

Yek dibêje:

-Ev ci ye? Ma hespê rehwan e!

Yê din dibêje:

-Hespê rehwan jî ne vî buhayî ne.

Kurik dibêje:

-De ka, bila ji we re sê zêran be.

Yek dibêje:

-Bi sê zêran ez dikarim sê çelekan bikirim! Ew jî çelekên ciwan. Ma ev çelek? Ev çelek pîr bûye, qey nîv zêr anî.

Kurik dibêje:

-EZ ji sê zêran kêmter nadim.

Zelam xwe jê didin alî. Heta êvarê dimîne, tu kes pirsa çelekê nake. Ji xwe re dibêje; "iro nehat firotin, ez ê îşev ji xwe re herim li xanekê razêm, sibê belkî muşterîyek derkeve." Diçe xanê, cihekî ji xwe re û yekî ji çeleka xwe re digire. Ji çelekê re hinek ka û ceh dikire, datîne ber. Ew jî diçê xwarina xwe dixwe û radize. Sibehê radibe dîsa çelekê dibe celepxaneyê. Heta nîvro tu kes lê na-nêre. Bi nîvro re yek tê cem dibêje:

-Te çelek nefirot?

Kurik dibêje:

-Hêca<sup>(1)</sup> muşterîyê wê çênebûne.

Zelam dibêje:

-Tu nañiroşî min?

Kurik dibêje:

-Belê weleh, kê bikire ez ê bifiroşim wî.

Zelam dibêje:

-Tu yê çiqasî bifiroşî?

Kurik dibêje:

-Sê zêran?

Zelam dibêje:

-Binêre xwarî! Tu heyveke din jî bimînî vî bajarî tu vê çelekê bi sê zêran nañiroşî. Tu guneh î. Şevê li xanê dimînî. Heqê xanê, yê ka û cê, yê xwarina te, welhasil tu du rojêñ din bimînî li vî bajarî, tu yê zehf zerer bikî. Vêca were çelekê bifiroşe. Heke tu bidî min ez ê du zêran bidim te.

Zelam diçe li alîyê din yê celepxaneyê diseke. Kurik difikire û ji xwe re dibêje; "weleh xebera vî zelamî ye. Ez şeveke din bimînim li xanan, çelekê çar zêran jî bifiroşim dîsa wê xisara min ji karê min zehftir be." Gazî zilêm dike:

-Xalo, ka were dêmekî ev qismeta te ye!

Çelekê didîyê û du zêrên xwe distîne û diçe. Évarê diğihîje mala xwe. Bavê wî dibêje:

-Te ci kir kurê min?

Kurik dibêje:

-Min çelek firot bavo.

Bavê wî dibêje:

-Te bi çiqasî firot?

Kurik dibêje:

-Weleh roja ewil nehat firotin, ez çûm xanê. Roja din jî heta nîvro muşterî lê derneketin. Ez fikirîm, şevê nîv zêrê min diçin heqê xanê. Min got; "ez du şevêñ din bimînim li bajêr yê nîvê pereyê min here xanê." Ji lew re muşterîyek derket û du zêr pê da, min jî firot.

Bavê wî dibêje:

-Baş e kurê min.

Du sê roj diborin, Kose dibêje kurê xwe:

-Kurê min, sibê coneğayê reş bibe bajêr, bifiroşe, lê nebî tu ji pênc zêran kêmter bidî.

Kurik dibêje:

-Bila bavo.

Kurik kebara<sup>(2)</sup> sibehê radibe, coneğê dide pêşîya xwe û berê xwe dide bajêr. Rast diçe celepxaneyê. Sê çar zelam lê têñ hev û jê dipirsin:

-Xorto, ev coneğâ yê firotinê ye.

Kurik dibêje:

(1) Hin

(2) Berbeng, spêde

-Belê, yê firotinê ye.  
 Zelam dibêjin:  
 -Çiqasî?  
 Kurik dibêje:  
 -Pênc zêran.  
 Yek dibêje:  
 -Wey! Ne du ga vî buhayî têñ firotin!  
 Yek dibêje:  
 -Min duh, gayek du zêran kirî!  
 Yek dibêje:  
 -Ga çî ye?! Min hesp kirî du zêran.  
 Yek dibêje:  
 -Min, çêlek û ga zêrek û nîvî kirîn!  
 We li kurik dikin,<sup>(3)</sup> gêj dibe. Herkes xwe dide alîyekî. Heta êvarê êdî kes lê napirse. Êvarê berê xwe dide xanê. Heqê xanê, yê xwarinê, ka û ce... Xanvan, zêrekî jê distîne. Kurik difikire, ji xwe re dibêje; "heqê xanê ji giran bûye. Ez şeveke din bimînim dê heqê conegayî hemî ji destê min here." Roja din, dîsa conegayî dide pêşîya xwe û dibe celepxaneyê. Hir de wê de, soxînê <sup>(4)</sup> xurtî û kotebkî bi sê zêran difiroşe û vedigere malê. Bavê wî dibêje:  
 -Va ye dixuyê te conega firotiye.  
 Kurik dibêje:  
 -Belê bavo.  
 Ü meseleya xwe ji bavê xwe re vedibêje. Kose dibêje:  
 -Xem nake.  
 Hefteyek dibore, bav hespekî dide pêşîya lawik û berê wî dide bajêr. Dema diçê celepxaneyê dîsa lê têñ hev û welhasil wî jî buhayekî erzan jê distînin. Êvarê tê malê. Bav dipirse, dibîne ku hesp ji erzan jê standine. Koseyê tobedar, piştî du rojan kerekî pişturmî dide pêşîya xwe û berê xwe dide bajêr. Dema nîzingê bajêr dibe, zêrekî têxe paşîya ker de. Dighîjê kevîya bajêr zelamek tê pêşîye û dibêje:  
 -Tu vî kerî naftiroşî?  
 Kose dibêje:  
 -Belê.  
 Zelam dibêje:  
 -Çiqasî  
 Kose dibêje:

-Sed zêran.  
 Zelam dibêje:  
 -Ma ev balafir e!  
 Kose, gopalekî li kemaxa ker dide. Zêr ji paşîya ker dipeke û ker diçe. Kose, li zêr nanêre jî û dimeşe. Zelam, zêrê ji ker ketî ji erdê hiltîne û dikeve pey. Kose, zêrekî din têxê paşîya ker de. Pêşvetir diçe. Zelamekî din tê pêşîye û dipirse:  
 -Ev ker ê firotinê ye?  
 Kose dibêje:  
 -Erê.  
 Zelam dibêje:  
 -Çiqasî?  
 Kose dibêje:  
 -Sed zêran.  
 Zelam dibêje:  
 -Qey ev keşti ye?  
 Kose, qet napeyive, gopalekî li kemaxa ker dide û dibêje; "dêh". Dîsa zêr ji paşîya ker dikeve, li ser kuçen reqifandî gêr dibe û zingîn jê tê. Kose, şûn xwe ve nanêre û rîya xwe de dimeşe. Zelam ecêbmayî dimîne û xwe ditewîne zêr ji erdê hildide, vî alî dizivîrîne wî alî. Rengê wî, nîvîsa wî, wêneyê li ser dinêre. Zêr e. Dide ber didanê xwe û li seqa<sup>(5)</sup> û nermahîya wî jî dinêre. Wê hînê re zelamê din jî tê û dibêje:  
 -Tiştê min dît, te ji dît?  
 Zilam dibêje:  
 -Erê weleh. Ev zêr ji ker wî derket.  
 Herdu, dikevin pey Kose. Kose pêşvetir diçe zelamekî din rastî wî tê û dipirse:  
 -Tu vî kerî naftiroşî?  
 Kose dibêje:  
 -Belê. Ez difiroşim.  
 Zilam dibêje:  
 -Çiqasî?  
 Kose dibêje:  
 -Sed zêran.  
 Zilam dibêje:  
 -Malmîrat! Ne garanek dewêr sed zêran tê kirîn. Tu çawa ji vî ker pişturmî re sed zêran dixwazî?  
 Kose, dibêje:

(3) Wiha li kurik dikin ku

(4) Dawîlya dawî, taşî

(5) Qalîteya çêkirinê, hişkî

-Çooo!

Û gopalekî li ker dide. Zêr dipeke û ew dimeşin. Zelam, zér dibîne û çavên wî fireh dibin serê wî tevlîhev dibe. Li der û dora xwe dinêre kesek nizing tune ye. Dest davêye zér hildide dinêre, sexlem e, zér e. Herdu zelamên din jî digihîjinê. Her sê dikevin rex hev û didin pey Kose. Ji hev re dibêjîn; "divê em vî kerî jê bistînin." Li pey Kose dilezînin û diştexilin. Peymana xwe girêdidin û dê bi hevparî ker bikirin. Digihîjin Kose û dibêjîn:

-Ka bisekine. Em muşterî ne.

Kose nasekine û dibêjî:

-Hûn muşterî bin perê xwe bînin, ker bibin.

Zelam dibêjî:

-Camêr, ka bîstekî bisekine.

Kose dimeşe û dibêjî:

-Karê min heye. Heke hûn bikirin, zêrên xwe derxin, hey ne; min mijûl nekin.

Zelam zêrên xwe derdixin, sed zêran didin Kose û hevsarê ker digirin û dikişînin. Kose dibêjî:

-Camêrno, divê hûn ker bibin sê qetê. Bin re sê qet mehfür deynin û têra sê rojan ce û av jî deynin ber. Ji sê rojan zûtir jî balê ve neçin. Piştî sê rojan herin û we şixul pê tune be.

Kose, xatirê xwe ji wan dixwaze û diçê. Zelam ker dibin, çawa Kose ji wan re got, welê çedikin. Têxîn mezaleke rayêxistî de û av û ceyê wê datînin ber û dêrî lê digirin. Herkes diçê mala xwe. Nav xeyalan de ne. Dema zêr çêbin ka yê çi pê bikin û çi bikirin!

Kose vedigere malê li ser karê xwe. Dizane ku wê roja sisîyan mîhvanân wî werin. Du kîervoşkê<sup>(6)</sup> wî hene ku mirov wan ji hev nas nake. Roja sisîyan dema diçê coht, kîervoşkekî rex xwe dibe û ji jina xwe re dibêjî:

-Nîvro mîhvanân me hene. Tu yê firavînê filan û bêhvan xwarinê çêki.

Piştî sê rojan, xwedîyên ker, bi kelecanek mezin derîyê mezelê vedikin. Dema derî vedibe, ji bêhna zibil hema hema gêj nabin. Ker ji ber ko zêde ce xwarîye û av ser de kirîye; vîjîkî bûye û jûr<sup>(7)</sup> mehfûran<sup>(8)</sup> ve tev kirîye zibil. Heta gellek deran re avêtîye dîwaran ji. Zelam dîn dibin! Ewqas zér, ka û ce, ne bes bû û mehfûren hêja... Piştî demekê, ser xwe ve tênen û hişê wan tê serê wan.

Berê xwe didin gundê Kose. Li gund pirs û pirsyarî navâ rês de Kose dibînin. Hêca ji dûr ve Kose diçê pêşîya wan. Xêrhatina wan dike, keyfxweşiyê li wan dide û welê çedike ku nahêle behsa ker bikin. Dibêjî:

-Hûn ji bajêr heta vir hatine, ez bêxwarin we rê nakim. Divê em herin firavînê.

Kîervoşkê ji rikeha<sup>(9)</sup> wê derdixe. Yek ji wan dibêjî: Zelam dibêjî:

-Dostobira ew çi ye?

Kose dibêjî:

-Ev? Ev peyayê Sivik e.

Zelam dibêjî:

-Peyayê Sivik kîrî çi tê?

Kose dibêjî:

-EZ ê niho bişînim malê. Yê ji jinbira we re bêje firavînê çêke heta em herin malê wê firavîna me amade be.

Li ber guhê kîervoşkê dibêjî:

-Here malê, ji jinaxaya xwe re bêje; "axayê min gotîye mîhvanê me hene. Bila ji me re qazekê sor bike, birîncekî li ber çêke, xweşav û biçîrkan jî deyne ber. Firavîna me amade bike, heta em hatin, kîervoşkê berdide. Kîervoşkî li xwe dide û berê xwe dide ervaz<sup>(10)</sup>. Yek ji wan dibêjî:

-Dostobira, ev ne alîyê gund ve çû. Vê berê xwe da çîyê?

Kose dibêjî:

-Ew peyayê Sivik e. Ew dizane yê bi kû re here. De kerem bikin em herin. Heta em bigihîjin gund, wê firavîna me hazır bibe.

Berê xwe didin gund û dikevin rê. Têne malê, dinêrin wê kîervoşk mal de girêdayî ye. Firavînê datînin ber wan, dibînin ku Kose ji Peyayê Sivik re çi got, hemî bê kîemasî amade ne. Zelam li hev dinêrin û Kose derdikeve. Nav xwe de xeber didin. Dibêjîn em çi bikin divê em peyayê Sivik ji vî zelamî bistînin. Dema Kose tê dibêjî:

-Dostobira, divê tu peyayê Sivik bidî me.

Kose dibêjî:

-Ew ji min re lazim e. Ez nafiroşim.

Zelam dibêjî:

-Weleh yê zehf karê me pê biqedin. Divê tu bifiroşî me.

Kose dibêjî:

[6] Kîervoşk/kerguşk

[7] Ode, mezel

[8] Xalîce

[9] Qefes

[10] Hevraz, berjor



-Hevalno, ew ji min re lazim e. Ez wê nafiroşim.

Zelam dibêjin:

-Em ê pêncî zêran bidin te.

Kose dibêje:

-Ez hemû karê xwe bi wê didim kîrin.

Zelam dibêjin:

-Bila sed zêr be.

Kose dibêje:

-Gidîno! Vê, li min nekin. Ew dest û pîyê min e.

Zelam dibêjin:

-Ji bo navê havaletîyê divê tu wê bidî me.

Welhasil Kose êdî zane bazar germ bûye û dibêje:

-Bi Xwedê, we du sed zêr jî bidana min, min nefirota lê madem we got; "li ser navê havaletîyê" bila ji we re be.

Sed zêrî didin Kose û kérvoşkê dibin diçin. Rê de dikevin nava bazarê. Dawîyê, li ser hefteyekî li hev dikin. Her hefteyê wê li cem yekî be. Diçin bajêr û herkes diçê ser karê xwe. Kérvoşk hefteyekî li cem yekî ye, hefteya din li cem yê din e. Zehf qedrê kérvoşkê digirin. Rojekê mîhvananî yekî ji wan tê û kérvoşk jî li cem wî ye. Kérvoşkê vedike û jê re dibêje:

-Here malê, bêje mîhvananî me hatine. Bila şiveke xweş ji me re çêkin. Kérvoşkê berdide û kérvoşk li xwe dide, li nava sûkê de nav dikan û dezgehan re direve diçê. Êvarê, mîrik mîhvananî xwe ve tê malê, jina wî, wî dibe medbexê û dibêje:

-Camêr, madem mîhvananî te hebû, te çîma xeberek neda min? Min ne şîvek çêkirîye û ne tu.

Zelam dibêje:

-Çawa min xeber neda te? Ne min Peyayê Sivik şan-dibû.

Jinik dibêje:

-Camêr, Peyayê Sivik ci ye?

Li ser mijara Peyayê Sivik, bi xir û cir, axaftina wan dûv-dirêj dibe. Dawîyê re, nîşkekê datînin ber mîhvananî xwe û ew şev welê dibore.

Roja din, zû diçê ba hevparîn xwe û meseleyê ji wan re dibêje. Nû pê dihesin ku careke din hatine xapandin. Berê xwe didin gundê Kose û dikevin rê... Êvarê re digihîjin mala Kose. Kose jîna xwe tembih kirîye. Dema mîhvananî, rûvîyekî péz tîji xwîn dike û weke ristikekî dixe stûwê xwe. Piştî xérhatinê li wan didin, dibe xir û

cira wan. Gotinek ji Kose, yek ji jîna wî û dibe şer. Kose bîhêrs ser jînikê de diçê, kîrikekê derdixe û davêje stûwê jînikê. Xwîn diherike ser kulav û berikan. Jinik xwe di erdê re dirêj dike û lingên xwe diperpitîne û ruh ji xwe dibe. Weke kuçekî hişk û birink <sup>(11)</sup>, dimîne li wê erdê, nava xwînê de. Çavên Kose ji hirsê sor bûne! Zelam matmayî, ji tirs û kelecanê deng ji wan dernakeve.

Piştî demeke kurt, Kose radihêje bilolê <sup>(12)</sup> û hêdî hêdî bilolê lê dide. Mêhvan hê pêtir şaş dibin û ji hev re dibêjin; "vî malmîratî jîna xwe ser jê kir û rabûye bilolê lê dide!" Dema dengê bilolê li jînikê diçê, jînik xwe diliyîne. Çiqas diçê dengê bilolê zêde dibe û lebata jînikê jî zêde dibe heta radibe ser xwe. Jinik radibe, heçko tu tiş ne-bûye radihêje karê xwe û ji mîhvanan re şîvî datîne. Mêhvan ji tirs, hêrs, şâsbûnî û mereqê bêdeng mane. Soxînê yek ji wan ji Kose dipirse:

-Tu bi Xwedê kî, ev çawa çêbû? Ka vê meseleyê ji me re ji vebêje.

Kose, bi dengekî sakîn dibêje:

-Ev bilol bisêhr e. Dema kesek nû miribe û yek bilolê lê bide ew mirî sax dibe. Vêca ez tu carî hêrsa xwe nahêlim di dilê xwe de. Dema ez hêrs dibim, yê pêşberê min kê dibe bila bibe, ci ji destê min bê ez dikim. Heke ew kes bimire, ez bilolê lê didim, ew ji nû ve vedije û heta hingê hêrsa min jî xelas dibe. Ev jînika hûn dibînin belkî cil caran min kuştiye û bi ve bilolê ji nû ve vejinandîye. Mêhvan, bêtîn mereq dikin lê her tiş bi çavên xwe dîtine. Ji lew re doza xwe jî ji bîr dikin û nizanîn ci bibêjin û bêdeng dimînin. Piştî şîvî, dibe pistepista wan û qeloq <sup>(13)</sup> in. Di cihê xwe de nasekinin. Bi hêceta destavê yek derdikeye yê din dide pey, ew têñ û yê din diçê. Welhasil, yek ji wan xeberekê ji hir ve tîne yekî ji dera din ve û mijarê tînin ser bilolê. Yek ji wan dibêje:

-Dostobira divê tu vê bilolê bidî me.

Kose dibêje:

-Ev tişte hûn dixwazin tu carî nabe. Hûn ci ji min dixwazin, bixwazin, lê ya bilolê nabe.

Zelam dibêjin:

-Em bajêr de, di nava stresê de ne. Bilol ji te bêtir, ji me re pêwîst e. Vêca buhayê wê bêje. Te ci bivê em amade ne.

Kose dibêje:

-Na. Qet nabe. Canê min bixwazin, lê bilola min na.

Yek ji wan dibêje:

[11] Ji bo asta hiskîyê ya herî zêde tê gotin

[12] Bilür

[13] Kes an ji tişte ku li cîyê xwe ne rehet e.

-Te ker da me, hêca me tu xêr jê nedît cihûmî. Te Peyayê Sivik da me, hefteya duduyan de kesekî an jî kesina dizî. Vêca divê tu vê bilolê jî bidî me, qene hema em xwe pê jî bîr vekin. Em ê du sed zêran bidin te û weke şîrê dîya te li te helal be.

Yê din dibêje:

-Em ê sê sed zêran bidin.

Kose dibêje:

-Hevalno, vê li min nekin! Ser vê dinê tenê sebra min bi vê bilolê tê!

Zelam dibêjin:

-Li ser bextê hevaletiyê, divê tu, wê bidî me. Me va yên din de xisar kir<sup>(14)</sup>, qene em xwe ji bîr vekin.

Kose dibêje:

-Bi Xwedê ne hûn bûna, min nedida tu kesî, lê madem bextê hevaletiyê ketîye erdê, hûn ci bêjin bila weke we be.

Roja din diçin bajêr. Sê sed zêran tînin, didin Kose û bilola xwe dibin, diçin. Bilolê jî weke Peyayê Sivik têxin dorê de. Her hefte wê li cem yeşî ji wan be. Dora ewil jî pişk dikin û yek ji wan dibe. Rojekê yê bilol li balê aciz dibe. Ew û jina xwe digirin hev û dibe xirecira wan. Gotinek ji wî yek ji wê, zelam hew xwe digire û darekê li serê jinikê dide û dikuje. Cixara xwe berdidiyê<sup>(15)</sup> û pal dide. Heta cixara wî xelas dibe, radihêje bilolê û lê dide, lê belê ne pêjin ji jinikê tê û ne lebat. Ji wî ve ye ku wê jinik rabe ser xwe. Çiqas lê dide, tu tevger û lebat ji jinikê nayê. Meqam û melodiyê diguherîne, deng stûr dike, zirav dike. nîvz<sup>(16)</sup> dike, bilind dike û heta sibeyê lê dide, lê tu tevger û lebat tune ye. Zelam nû bi xapandina xwe dihese û digirî. Radibe bi xef cesedê jina xwe dibe vedişêre. Piştî du rojêñ din bilolê dibe dide hevalê xwe. Hevalê wî dibêje:

-Hêca wextê te hebû. Te çîma anî?

Zelam dibêje:

-Weleh ez van rojan gelekî baş im. Min got, belkî tu aciz bibî û ji ber wê min ji te re anî.

Hevalê wî dibêje:

-Çawa ye? Te ceriband?

Zelam dibêje:

-Erê. Gelekî baş e. Me bi kirîna vê bilolê îşekî gellek baş

kir. Mirovî re qet stresê û enirandinê nahêle.

Zelam bilolê distîne û bawer nake ku yê kengê bibe êvar. Dema dibe êvar, bi lez û bez dikana xwe digire û berê xwe dide malê. Li hêcetan heyrîye.<sup>(17)</sup> Dema jina wî dêrî vedike, têxe qelebalix û dibêje:

-Va ye saetek e ez li ber dêrî me, tu çîma dêrî zû venakî? Jinik çiqas nerm diştexile, mîrik bêtir ser de diçe. Gotinek ji wî yek ji wê, hema zelam radihêje kêrikekê li nîvê dilê jinikê dide û têxe erdê. Demekê bêhna xwe vedike û paşê radihêje bilolê û lê dide. Weke şivanekî bi bilolê dilorîne. Weke hevalê xwe, ew jî heta nivê şevê li bilolê lê dide lê feyde nake. Bilol û mirîyan sax bike! Paşê hisê wî tê serê wî û fêhm dike ku, hem Kose û hem jî hevparê wî ew xapandiye. Ew jî weke yê din, jina xwe dibe vedişêre û delîlân ji holê radike. Roja din bilolê dibe, dide hevalê din. Hevparê wî dibêje:

-Hêca ji dora min re hefteyek heye. Te ci zû anî?

Zelam dibêje:

-Weleh birayê min, ev tişt ne sitresê mirov re dihêle, ne kînê ne jî rikê. Rojekê ma li ba min lê tu dibêji qey hemû sinirê min ji laşê min kişandine. Ez ewqas pê rehet bûme, salekê jî ji min re ne lazim e. Dema tu biceribînî, tu yê min fêm bikî. Hadê bi xatirê te.

Şirîkê sêyem gelek keyfxweş dibe. Demek dibore, müşterîyek tê dikana wî, tiştina bazar dike, lê nakire. Tiştekî din dipirse, yekî din, ya dîtir welhasil qasî du seatan dikanê tevîlhev dike, lê tu tiştî nakire û ji dikanê derdikeve. Zelamê me ji acizbûyînê haxta<sup>(18)</sup> bifetise! Bêhna wî, tê serê pozê wî. Radihêje tevşoyekî û berê xwe dide müşterî, li derê dikanê, di nav nîvê sûkê de, bi tevşoyan dikeve ser serê müşterî û têxe erdê. Heta xweyîyên dikanêñ din têñ, zelam dimire. Cîranêñ wî gazî polêsan dikin. Polêş têñ, destê wî kelepçe dikin da bibin, ew dibêje:

-Bisekinin ez ê niho wî sax bikim.

Polêş dibêjin:

-Te nîyet e tu birevî! De hadê bimeşê!

Zelam dibêje:

-Na weleh. Ez ji dil dibêjim. Ez ê wî vejînim.

Polêş dibêjin:

-Tu yê çawa vejînî?

(14) Di yên din de

(15) Cixara xwe pê dixe

(16) Nizm

(17) Li hêcetan digere

(18) Hindik maye, wext e

Zelam dibêje:

-Pê bilolê. Bilolek a min a bi sêhîrî heye, dema mo <sup>(19)</sup> lê dide mirî sax dabin.

Polês dibêjin:

-Bilol! Tu bilolê lê didî û mirî sax dabin?!

Zelam dibêje:

-Heke hûn ji min bawer nekin, ji filanches û bêhvankesê ji bipirsin.

Navê herdu hevalan xwe jî dide wan û dibêje:

-Herduya jî jina xwe kuştin, lê dema bilol lê dixistin disa jinêwan sax bûn û ji nû ve vejîyan.

Polês wî digirin û diçin herdu hevalen wî jî digirin û tînin. Piştî dagehkîrinê hersêkan ceza dikin û wan davejin zîndanê.

[19] Mirov



# KELA DIMDIMÊ

Bi taybetî rewşa jinê ya di nav kelê de gellekî bala mirov dikişîne.  
Careke din tê xuyan ku rewşû timtêla jina Kurd di çanda Kurdan de rist û  
roleke mezin dilîze. Tê gotin ku di serî de jin, hemû niştecihê kelê tên  
perwerdekirin. Dîsa di nav şer de jî lehengiya jinê bi rastî jî hêjayî pesn û  
serbilindiyê ye. Jin di şer de bi moral û biryariya xwe, ji civakê re  
pêşengiyê dikan. Li vir jî di bin şexsiyeta diya Mîrzan Guhar (Asîma Xanim)  
û jina wî Stî de jina Kurd dîrokê dinivîse.

Mustafa BORAK



## Destan û taybetmendiyêن wan

Di wêje û çanda hemû gelan de destan girîng in, lewre destan ruh û giyana gelan in. Destan, vegotinêñ anonîm ên herî kevn in. Di destanan de şerên giran, tofanêñ mezin û rewşen pir awarte tên honandin. Lehengên destanan kesên bêhempa ne. Zêdetir bi awayê hel-bestkî(manzûm) tên gotin. Destan, rewş û ramana gelan a hevpar radixin ber çavan. Mirov ku li destanêñ gelan mêze dike; di derbara çand, edet, dîrok, ruh, hiş-mendî dad û hiqûqa wan de agahdar dibe. Di gellek zimanê Ewropî de ji bo destanan bi piranî peyva yewnanî ya "epos"ê tê bikaranîn. Peyva destan bi xwe ji peyvek ji zimanê Farisî-Kurdî ye. Di zimanê Erebî de "esatir", di yê rojava de "myth" tê bikaranîn.

Mijarêñ destanan bi piranî li ser Xwedawend, gernas û qehremanan, li ser evînî, şer, alîkariya jar û mexdûran û hwd. in. Taybetmendiyeyeke destanan jî ew e ku bi zimanê neteweyî tên vegotin.

Destana herî kevin, Gilgamiş e ku li Mezopotamyayê BZ. di 3000'î de ji hêla Babil, Akad û Sumeriyan ve hatîye vegotin. Wekî tê zanîn destanêñ Yewnaniyan yên herî navdar Îlyada û Odysseia (BZ 11-12) di cîhanê de pir bi nav û deng in. Ev destan ji alîyê Homeros'î ve hatîye komkirin û bûye bingeha edebiyata gelê Yewnan. Dîsa mirov dikare bibêje ku destana Şâhname di hebûna gelê Faris de cihekî bêhempa digire. Destana Fîn-landî Kalevala di şerê wan ê azadiyê de bûye meşale û pêtala Fîniyan. Dîsa destana Îngilîzan Beowulf, a Almanan Nîbelûnîgen, a Spanyoliyan El Sîd, a Hindûyan Mahabharata û Ramayana, a Rûsan Kilama Bandoya İgor, a Fransiyen Kilamên Roland, hemû jî afirandin, giyan û nîrxên gelan in.

Gellek caran ji bo azadî û rizgariya gelan destan û lehengên wan dibin model, dibin manîvela û sînerjiyekê di nav gellan de pêk tînin. Destan, hestêñ civakê bi heman rengî ve boyax dîkin û yekîtiya civakê, xurt dîkin.

## Destanê Kurdî

Destanê Kurdî jî wek yên cîhanê ji gelek aliyan ve taybetmendiyêñ rewşa civaka Kurd radixin ber çavan. Destanê Kurdî bi piranî helbestkî ne. Ji ber ku zêdetir dengbêj dibêjin, geh bi stranâñ(bi helbestkî), geh jî wek pexşenan rasterast tên vegotin. Gellek caran dema ku dengbêj destanan vedibêjin, di navberê de ji tekstêñ wek: "Di vir de keçik dest davêje kerika guhê xwe û ji lawik re wiha dibêje:" ew beş wekî stran berdewam dike. Piştî stranê dîsa vegotin didome. Girîngiya deng-

bêjan a di destanan de tim li pêş e, lewre di çanda Kurdan de dengbêj hem afirîner hem berhevkar hem parêzvan û hem jî li gor dem û serdemê veguhêzerên çandê ne.

Destanêñ navdar û belavbûyî yên di nav neteweya Kurd de em dikarin weha bi rêz bikin; Memê Alan, Siyabend û Xecê, Kela Dimdimê/Xanê Lepzêrin, Zembîfiroş, Kerr û Kulik, Binefşa Narîn, Ristemê Zal, Mîr Mihemed, Sitî û Ferxî, Evdalê Zeynikê, Derwêşê Evdi, Filîtê Quto û hwd. Li gor naverokê destanêñ Kurdî jî du besên sereke pêk tên:

1. Destanêñ Qehremanî: Rustemê Zal, Kela Dimdimê, Derwêşê Evdi, Kerr û Kulik, Filîtê Quto û hwd.

2. Destanêñ Evînî û Dildarî: Memê Alan, Siyabend û Xecê, Zembîfiroş û wd.

## Destana Kela Dimdimê

Wek destan û bûyerên dîrokî, destana Kela Dimdimê jî bi her awayî model û nîşaneyâ berxwedan û xwedî derketina serbestî û azadiyê ya gelê Kurd e. Ev destan heta sedsala 19. bi saya dengbêj û çîrokbêjan nîş bi nîş hin caran bi beytan, hin caran bi bendan bi zaravayê Soranî û Kurmancî heta roja iroyîn hatiye. Ya ku tê zanîn heşt guhertoyen (varyantên) wê hene.

Destana kela Dimdimê cara yekemîn ji hêla balyozê Ûris A. Jaba ve hatîye nîvisandin û çapkirin. A. Jaba ev xebata û yên li ser zargotina Kurdî ji Mele Mahmudê Beyazîdî daxwaz kiriye. Mele Mahmudê Beyazîdî ku alimekî mezin bûye. Di wê demê de hem li ser dîrokî, hem li ser nijadnasiyê (etnografiyayê), hem jî li ser zargotina Kurdan gellek xebat kirine. Mele Mahmudê Beyazîdî guhertoyek ji wê herêmê ji dengbêjan û ji çîrokbêjan girtiye, bi tîpêñ Erebî ew nîvisiye û daye A. Jaba'yi. Wî jî di sala 1860'î de bi tevî hin xebatêñ din bi çar rûpel nîvîsek pexşenî ve ev destan weşandiye.

Destana Kela Dimdimê jî wek gellek destanêñ cîhanê bûyerereke dîrokî û rast e. Tenê ew beşa ku tê gotin: Xano çûye li ba şivan şîr vexwe, bûye şahidê xewna şivan û meseleya mês û bilûr û şîr û zérên şikeftê û meseleya postê ga, em dikarin wek efsane binirxînin, lê di dawiya dawî de ev qewimîneke rast e û dîrokî ye. Heke mirov bala xwe baş bidê, dikare têkiliyêñ dewletêñ wê demê, têkiliyêñ Kurdan, îxanet û mîrxasî û rewşa wê demê bîbîne.

Dîroknasê Kurd yê mezin, Muhammed Emîn Zekî Beg bi awayekî rasteqînî û bi çavekî dîrokî û bê têfirandin ew

bûyer di pirtûka xwe ya bi navê Dîroka Kurd û Kurdis-tanê de, di 13 rûpelan de anîye zimên. <sup>(1)</sup>

Ji Kurdêna Qaqasyayê lêkolînvanê hêja Qanadê Kurdo ew destan wek têza xwe ya doktorayê bi kar anîye û bi salan şûnde ji di nav destan û berhemên zargotina Kurdî de weşandiye. Nivîskarê Kurd ê Sovyeta Berê Erebê Şemo ji ew destan bi navê Kela Dimdimê kiriye roman. Ne tenê ew, di heman demê de radyoya Kurdî ya Erîwanê ji ev destan wekî radyo kompozîtor (şanoya radyoyê) bi awayekî pir serkeftî pêk anîye û gellek caran di vê radyoyê de weşandiye. Dîsa Kurdê Rojavaya Kur-distanê nivîskar Jan Dost bi formata helbestî ve lehen-gên wek Dosto û Sînem û hwd. ve ew hinekî xemîlandiye û di sala 1991 de weşandiye. <sup>(2)</sup> Ji bîlî wê di derbarê Kela Dimdimê de gellek makale û nîvîs derçûne.

### Bi kurtasî çîroka destana Kela Dimdimê:

Kurdek bi navê Xano serkar û berpirsyarê hespên Şah Ebbasê Îranê bûye. Xano mirovekî pir zana, wêrek û xurt bûye. Li çiya û baniyan hespên Şahî dide çêrandin û bi pûtedanî li wan dinêre.

Rojekê dilê Xano zehf şîr dixwaze. Li çiyê rastî keriyek pêz tê. Çavêن xwe li şivan digerîne ku tasek şîr jê bix-waze. Piştî demekê dibîne ku şivan qasikek şîr dotive daye ba xwe, bilûra xwe ji daniye ser qasika şîr û li wir di xew re çûye. Berî ku bang bike şivan demekê li şivan û dorhêla wî dinêre. Di wê navberê de dibîne ku mêshek ji pozê şivan derket çû ji hundirê bilûra li ser şîr, ji nava bilûrê re derbas bû û çû li hember ciyekî ku wek şikeftekê ku latênen mezîn û deviyêñ daran li ber şîn bûne kete hundir û winda bû. Xano vê yekê bi balkêsi disopîne.

Di wê navberê de şivan ji xewê şîyar dibe. Dema ku Xano li pêş xwe dibîne, gellekî hêrs dibe û dibêje:

"Te çima ez şîyar kirim?"

Xano dibêje:

"Min tu şîyar nekirî. Tu bi xwe şîyar bûyi!"

Şivan dibêje:

"Min xewneke pir xweş didit. Di xewnê de ez li ser beh-reke spî ji pireke heft çavî re derbas bûm. Ji wir ji min

xwe gîhand cihekî wekî şikeftekê. Dema ketim şikeftê min dît ku hundirê şikeftê tiji zér û zebar e."

Xano, ew dîmena ku berî şîyarbûna şivan dîtibû, careke din di serê xwe re derbas dike û ji şivan re dibêje:

"Heke Şah Ebbas vê xevna te bibihîze, tu ji dizanî ku dê serê te lêxe. Sond bixwe ku tu ji tu kesî re nebêji!" <sup>(3)</sup>

Şivan wê demê pezê xwe dide hev û ji wir diçe. Piştî ku şivan diçe, Xano tê li ber ciyê wek şikefta ku mês ketiyê. Dema ku latênen mezîn yên li ber şikeftê radike, dibîne ku bi rastî ji şikeftê tiji zér û zebar e. Dîsa wan latan dide ber şikeftê û diçe nav hespên Şah. Di wê navberê de cer-deke pir mezîn davêje ser hespên Şah. Xano li hember cerdevanan şerekî dijwar dike. Di dawiyê de bi dehan cerdewanên kuştin û birîndarkirin, yên mayîn ji kar-wanê xwe yê mezîn dihêlin û direvin, lê di vî şerê dijwar de ji ber lêdana şûrê cerdawanen destekî Xano diqete. Xano, bi wî awayî karwanan wan cerdewanen û hesp û deveyên wan wekî xenîmet hildide û diçe quesra Şah Ebbas.

Şah Ebbas ji ber wê qehremaniya Xano û wê xenîmeta giran gellekî këfxweş dibe. Dûre ji hemû zérkeren xwe digihîne hev û bi maharetekî mezîn ji zér destekî ji Xano re dide çêkirin. Di heman demê de Şah payeya Emîrtiyê ji dide Xano. Navê Xano dike Emîrxan, lê di wê şûnde zêtetir ji Xano re Emîrxanê Lepzêrin tê gotin. <sup>(4)</sup>

Piştî demekê Emîrxanê Lepzêrin derdikeve hızûra Şah û wekî postê gayekî şûnek erd jê dixwaze. Şah ji destûrê didê. Xano, çermê gayekî zehf mezîn dike nava avê heft rojan dide sekinandin û çerm baş nerm dike. Piştî heft rojan wî çermî wekî bendekî zirav zirav jêdike û li dorhêla ciyayê Dimdimê digerîne. Ben li çiya û baniyan di-gere, deşt û zozan dide ber xwe û di dawiyê de çar tilî ji zêde dimîne. Xano dest pê dike li vir kelahekê çê-dike.

Piştî ku nav û dengê kelê û yê Xanoyê Lepzêrin belav dibe, mîr û begên Azeriyan û yên Farisan pir diqehirin, lewre Xanê Lepzêrin hem Kurd e û hem ji Sûnî ye. Ji ber wê ji tim li ba Şah fesadiya wî dikin. Yen ku li hember Xano fesadiyê dikin yek ji wan ji walîyê Tewrêzê(Îrbîz)

(1) Muhammed Emîn Zekî Beg. Kürtler ve Kûrdîstan Tarihi, Nûbihar Stembol

(2) Jan Dost, Kela Dimdimê. Melsa Yayınları 1991 Stembol

(3) Di guhertoyek de Xano ji şivan şîr dixwaze. Şîr vedixwe. Lê ji ber ku pîr westiliye herma li wir dike xewê. Di xevnê de wê bûyera mês, şîr şikeftê dibîne û dû re ji dema ku şîyar dibe, xevna xwe disopîne û wê şikefta zérän dibîne.

(4) Di hinek guhertoyek de ji ber ku Xano pir merd bûye, dema ku Kela Dimdimê daye çêkirin, her meh çenek zér daye hosteyên xwe, loma navê wî bûye Xanê Çengzêrin. Di hêla din de li gor guhertoyen destanê gellek navên Xano hene. Wek Xano, Mîrxan, Emîrxanê Lepzêrin, Xanoyê Destzêrin, Xanoyê Çengzêrin û Emîrê Çolaq û hwd.

Pîr Bodak Xan e. Bi taybetî Pîr Bodak Xan gellek ji Kurdan û ji Emîrzan diqehire. Ji Şah Ebbas re dibêje: "Emîr Xan vê kelê ava dike ku li hember te derkeve û serxwe-bûna xwe ûlan bike."

Şah ji ber van gotinan gellek caran sîxuran dişîne kelê. Casûsên ku di dilqê dewrişan de dikevine kelê, ji hêla Kurdan ve têن ferqkirin û bi êxdamê têن mehkûmkirin. Ev yek jî dibe kîrta kîvir. Di dawiyê de Şah Ebbas nameyekê ji Xano re dişîne û dixwaze ku Xano dev ji çeki-rina kelê berde û ji wî re qûltiyê bike. Di nameya xwe de Şah wiha dibêje:

Min bihîstiye ku, te bêaqîlî kiriye,

Te navê Şah ser xwe daniye.

Lo lo Xano tu Kurmancî

Qebûl bike tu vî tacî

Qebûl nakî, te dikujim

Xano ji ber vê daxwaza bindestiyê gellekî aciz dibe û ew jî bi awayekî tund bersiva Şah dişîne:

Tacê te ser li serê te be,

Gû li nav mesebê te be,

Kuştina mérân wê hebe,

Lê Kurdistan bênav nabe.

Emîrzan guh nadî gefxwarinên Şah û Pîr Bodak û avakîrina kelê berdewam dike, heta ku diqedîne.

Xano dizane ku dijminên wî pir xedar û pir bihêz in û rojêن pir dijwar li pêşîya wî ne, loma jî ji bo yekîtiyê gellek mîr û beginê Kurdan û eşîran li dora xwe dicivîne. Alî-kariya gellek eşîr û hozên herêmê dike. Di nava Kurdan de yekîtiyekê pêk tîne. Nav û dengê wî di nava hemû Kurdan û li herêmê belav dibe. Ne tenê ew, lê ji hêla din ve jî ji bo ku hewcedarî kesî nebe di nava kelê de îmaletxaneyen silahên xwe yên bicûk û mezin û topan jî çê-dike. Ji bilî wê gellek pêdiviyên wê demê wekî fera, foçik û alavê çandînî û hwd. di nava kelê de têن îmalkirin.

Jixwe Şah Ebbas hincetan li Emîrzan digere. Di wê navberê de 20. 000 Celaliyan<sup>(5)</sup> ku li ber dewleta Osmanî, li ber zilma Kuyucu Murad Paşa<sup>(6)</sup> direvin, xwe dispêrin Şahê İranê. Şah jî li wan dibe xwedî û ji Mîrzan jî dixwaze



ku ji wan Celaliyan 8000 kesî hilde bal xwe, lê Mîrzan vê daxwazê nafejiyêne. Şah Ebbas ji artêseke mezin di bin fermandariya Hesen Xan de dişîne ser Kela Dimdimê. Ligel artêşa İranê 2000 jî şervanên Celalî cih digirin. Şah Ebbas ji Hesen Xan re dibêje: "Lêkoşînekê bike, heke dikarî Xano bixapîne bîne bal min, na heke nebe, kela wî hilweşîne û bi erdê ve bike yek. Hemûyan bikuje, mal û mulkên wan jî di nav Celaliyan de parve bike."

Bi vî awayî li gor guhertoyêkê di sala 1608'an de şer dest pê dike. Artêşa İranê artêseke pir mezin e. Lawê Xanê Çengzêrin hejmara dijiminan wiha tîne zimên:

Ez sond dixwim bi ser navê Yezdanê dilovan

Çadirîn dijiminan yên li der û doran,

Bi qasî stêrkên esmanan,

Bi qasî belçikên daran, zêde bûn.

Bi qasî qûma li dora behran.

(5) Celalî, navê xwe ji serokê serhildana Tirkmen û şîî û elewîyan Sêx Celal hildide. Ev serhildan, li Anatoliyê di sedsala 16 û 17 de di dema Sîltan Yavuz Selîm, heya serderma Sîltan Mehemed IV. berdewam dike. Zêdetir ji ber zilma dewleta Osmanî û rewşa aborî, bawerî, eskerî û siyasi pêk tê. Şahîn İranê ji serhildana Celaliyan destek dikin.

(6) Sedrezam Kuyucu Murat Paşa mirovan diküje û cendekîn wan jî dike çalan; loma ev nav girtiye. Kuyucu Murat Paşa tê gotin ku 65 hezar mirovî diküje.

Subhê çûne Ecem e,  
Esker rûbar û çem e,  
Di pêş tê Xan Ecem e,  
Girtin dora Dimdim e.

Mîrzan ji serbazên artêşa xwe re dibêje: "EZ ê heft kurên xwe bişnîm ser mirinê lê Kurdîstanê ji şan û şerefê kêm nakim. Her çiqas bimirin jî şêr û egîten me, ji şan û şerefê namîne Kurdistana me."

Li hember artêşa mezin a Hesen Xan keç û xorôtên Kurdan xwe dixin agir û pêt û li hember dijminê xedar li ber xwe didin, bi egidiyeke pir mezin şer dikin. Bi taybetî cengewarên Kurd bi şev xwe beridin nav artêşa dijmin û bi şerê gerilla wan perîşan dikin. Di dawiyê de artêşa Îranê têk diçe û vedikişe. Di vê navberê de Celalîyên ku alîkariya artêşa Îranê dikin jî hêdî hêdî qefle bi qefle direvin dicin ba Osmaniyan.

Şah Ebbas di demeke kurt de vê carê di bin fermandariya Wezîr Mutemud Devle artêşeke din dişîne ser Mîrzan, lê li hember Kela Dimdimê ku wek pola saxlem e, ew jî nikarin bi ser bikevin. Bi vî awayî şerr bi mehan berdewam dike. Şah tê digêhêje ku bi riya şer bi Kurdan nikare, dest davêje dek û dolab û lîstikan. Ji ber wê jî dixwaze Kela Dimdimê ji hundir ve fetih bike. Bi vê me-bestê bi yekî ku navê wî Mehmûdê Mekanî ye re dikeve têkiliyê. Ku Mehmûdê Mekanî di çekirina kelê de jî cih girtiye û bi kelê beled e. Mehmûdê Mekanî bi bertîl û pereyan dixapîne, ew jî bihur û gêdûkén kelê yên vesartî û nepenî nîşanî wan dide, lê ya herî girîng jî şûna bihur û borîyân avê yên di bin erdê re têl kelê ji dijmin re dibêje.<sup>[7]</sup> Fermandarê artêşê riya avê ya dervayî kelê ve-dike û xwîna heft gayan berdide nav ava kelê. Şûna avê xwîn diherike.

Ji ber ku ava kelê tê birîn, kal û pîr û zarok ji ber tîbûnê can didin, lê disa jî gel teslim nabe û bi lehengî li ber xwe dide. Ev rewş 21 rojan berdewam dike, lê 21 roj şûnde baran dest pê dike, bi rojan dibare. Çal û firaqên kelê tije av dibin. Bi vî awayî pêdiviya kelê ya şes mehan pêk té, lê piştî wê jî artêşa Îranê şer berdewam dike. Demeke dirêj şûnde Ecem bircek kelê dixin destê xwe, lê di vê navberê de jî Wezîr Mutemud Devle dimire. Şah li şûna wî Mehmûd Beg dike fermandar. Mehmûd Beg jî demek dirêj şer dike. Di vê navberê de Xanê Azeriyan Pîr Bodak Xan bi xwe jî wek fermandar tevî şerê Dim-

dimê dibe. Di dawiyê de Pîr Bodak jî bircekê zevt dike. Di encama şerekî giran de, çend bircêñ din jî digirin. Ji bo her bircekê bi rojan şer tê kirin. Kurd bi xwîna xwe her bircêñ diparêzin. Di dawîya dawî dijmin dikevin birca ku Xano lê dimîne, Birça Narîn. Xano bi milekî xwe bi tevî heft lawên xwe, şervan û jinêñ kelê bi rojan şer dike. Bi hezaran eceman dikujin. Dema ku leşkerên Şah dikevin hundirê kelê, jin an xwe ji bircêñ kelê davêjin xwarê, an jî jehrê vedixwin, lê teslimî dijmin nabin. Diya Xano Guhar (Asîma Xanim) û Stî'ya bûka wê ya du canî(jina Mîrzan) dinêrin ku êdî Kela Dimdimê ji dêst diçe, bi barût û teqemeniyêñ ku berê amade kiribûn ve kelê dipeqînin û ne xwe ne jî kela xwe bi silametî naxin nav destêñ dijminêñ xwe.

Kuştin Xan û Mîran

Bi tiveng û top û tîran

Serqut in mislê şêran

Laş bûne mîna gêran

Artêşa Şah, Kurdên mayîn qetil dikin û eşîrên li hawirdor kelê jî sîrgûn dikin. Li gor hinek guhertoyan nêzî du salan, li gor hinekan heft salan şer berdewam dike. Di vî şerî de sê fermandarê artêşa Îranê têñ guherandin.

### Di nav rasteqîniya dîrokê de Kela Dimdimê

Di pêvâjoya dîroka xwe de dewletên Osmanî Û Safeviyan tim kevneşopîya talan, bac û xeracê bi awayekî hovane meşandine. Ji ber wê yekê nakokiyêñ di navbera wan de jî qet bi dawî nebûne. Ji ber qarekterê dagirkevîyê, şer û pirsgirêkên wan jî tim berdewam kirine. Bi taybetî jî li ser serê gelê Kurd û welatê wan Kurdistanê şer û şetele qet kêm nebûne. Lewre Kurdistan navenda riyên bazirganiyê û li şûnwarek stratejik bû, loma jî çavêñ dewletên mezin tim li ser Kurdistanê bû. İmparatoriyan tim erîşî Kurdan kiriye, Kurdan jî tim li hember wan li ber xwe daye, ji bo azadiya xwe şer kirine.

Piştî mirina Şah Tahmasp, Osmanî dixwazin herêma Ürmîyê têxin bin desthilatdariya xwe. Şahê Îranê Şah Ebbas jî dixwaze İmparatoriyeke mezin ava bike, lê ji ber ku Kela Dimdimê li ser riya bazirganiya rojhilat e, ji Safeviyan re dibe asteng. Ji wê sedermê Şah dixwaze mîr û begêñ Kurdan bixe bin bandora xwe.

[7] Mehmûdê Mekanî, ew kesê ku sıxuriyê dike, di hinek guhertoyan de tê gotin ku, rojekê dereng jî xewê radibe, ji ber ku di dema xwe de nagîheje taşte birçî dimîne, loma difroşê. Lê Şah ba dikek ku xelatê bidê, lê wî dixe devê topê û bi guleya topê ve parçê dike. Di hin guhertoyan de jî Şah dibêje: "Te ji bo taştiyek sibê ji gellê xwe re îxanet kiriye." Wî di navbera du qantiran de grîdide û dike du parçê.

Xanoyê serokê eşîra Müqriyan, êla Biradostan tê gotin ku ji bakurê Kurdistanê ji herêma Hekariyê ye. Ji ber na-kokiyê navbera xwe û Osmaniyan, Xano bi tevî gellek eşîrên din alîkariya Şah Ebbas dike. Li dijî Osmaniyan dikeve nav şerekî giran. Di encamê de Osmaniyan ji wir bi dûr dixin. Di vî şerî de destekî Xano bi şûr tê qutkirin. Ji ber lehengî û egîdiya Xano, Şah Ebbas destê Xano bi yaqût û zimrûtan dide çêkirin. Di heman demê de nişaneşa "emîr"tiyê ji didê Xano. Navê Xano dibe Emîrxanê Çengzêrin. Piştî wê ji Şah Ebbas herêma Ürmiye dide bin mîrnîsiya Emîrxanê Çengzêrin.

Serhildana Kela Dimdimê, her ciqas zêdetir bi ser navê eşîrên Müqriyan bê xuyan ji, lê di esasê xwe de ev ser-hildan ji bo gellek eşîrên Kurdan ên wê herêmê dibe hêvî û baweriyeke mezin. Ne tenê li hêla bajarê Ürmîyê û li deveren Tergever, Mîrgever, Biradost ve Üşniyê lê ji sînorê rojhilatê Kurdistanê bigire heta bakurê Kurdistanê, Botan û Serhedê û dorhêla wê ji bandoreke mezin pêk tîne. Piştî avakirina Kela Dimdimê Kurdên ku heta wê demê tim bi hev de dikevin û bi hev re şer dîkin, yekîtiyekê pêk tînin. Gellek hoz û eşîr xwe dispêrin Mîrzan.

Wer tê xuyan ku hinek axa, beg û serokên eşîran ji di derbarê yekîtiyekê de pejinkar bûne. Tê gotin ku wê demê serokê eşîrekê ku berê bi Xano re pir şer kiriye ji bo alîkariya wî tê ba Xano. Xano hêrs dibe û dibêjê: "EZ bi te bawer nakim, lewre te her dem dijminatiya me kiriye. Te leşkerên min qir kirine. Ji ber wê ji pêdiviya min bi te û leşkerên te tune ye."

Lê serokê wê eşîretê Xano wiha dibersivîne:

Rast e, di navbera me de hebû şerê malê dinyayê, şerê birakujiyê,

Lê niha dest pê kiriye şerê Kurdistanê, şerê rizgariyê.

Em tev dijminên Kurdistanê têk bibin.

Piştî şer, ez dûrî te, tu dûrî min.

Xano bi dadmendî û qoçaxbûna xwe ve deng dide herêmê. Roj bi roj desthilatdariya xwe fireh dike. Li gor Îskender Munşî, <sup>[8]</sup> Emîr Xan di dema xwe de yek ji navdarêni Emîrîn Kurdistanê bûye. Gellek hoz û malbatêni mezin ên Kurdan xwe bi Mîrzan ve girtine û ketine bin emrê wî. Mîrzan hinek eşîran li Urmîye û li kelê niş-

tech dike û çek û sîlehan dide wan. Şerê Dimdimê ye-Kîtiyekî di nav Kurdan de pêk tîne û di dawiya dawî de li dor hêla Dimdimê di nava Kurdan de yekîtiyeke wek konfederesyonâ eşîretan pêk tê.

Ligel wê yekîtiyê, dîsa ji dîrokzan di derbarê pêkanîna ye-Kîtiyê Kurdan de Xano pir qels dibînin. Dibêjin ku di derbara yekîtiya Kurdan de xebata ku pêwîst e pêk neaniye.

### Avakirina Kela Dimdimê

Li ciyayê Dimdimê berê ji kelahek Kurdan bi navê Kela Dimdimê hebûye. Berî İslamiyetê ew kela hatiye xirab-kirin. Mîrzan li ser bingeha wê kela kevin a Kurdan ke-layeke nû ava kiriye û navê kela xwe ji kiriye Kela Dimdimê.

Mîrzan dizane ku çavên İran û Osmaniyan li ser wî ne. Ji ber wê ji bi her awayî amadekariyê xwe dike. Mirov ku cihê kelê, stratejî û teknîka wê dinêre, zanebûn û dûrbîniya Mîrzan dertê holê, lewre hostexaneyên kelê wekî fabrîqeyan îmaletxaneyên topên leşkerî çêdikin. Di vir de top, şûr, qeme, tîr, gurz û mertalan çêdikin. Ji bilî amûrân şer, pêdiviyen wek fera û foçikan û hwd. ji îmal dikin. Jîxwe Şahê İranê bawer nake ku serokeki Kurdan topan çê bike. Lê sıxûrên İranê tênavâr nava kelehê û çêkirina topan di cih de, bi çavên xwe dibînin.

Kela Mîrzan mîmarek, serhostayekî Ermen çê dike. Ev mîmar hostayekî pir mezin û zana bûye. Berî ku Kela Dimdimê çêke, ji Şah re keleyeke bêemsal çêkiriye. Kela ku çêkiriye keleheke pir muhteşem bûye. Piştî ku kelê diqedîne, Şah meraq dike û ji hostê dipirse: "Hosteyê héja, tu dikarî keleheke ji vê kelê baştir çê bikî?" Hoste dibêje: "Şahê min, heke derfet û dem hebe, dikarîm ke-leheke ji vê çêtir ji çê bikim." Şah ji vê bersivê pir aciz dibe û ji bo kelaheke ji ya wî baştir çêneke, ferman dide ku bi şeveqê re serê hostê bê lêxistin, lê hoste her cawa dike, wê şevê ji destê Şah direve. Ew hoste tê, xwe da-vêje ber bextê Kurdan û dest pê dike bi tevî 500 hosteyan Kela Dimdimê çêdike. Piştî wê ji haya roja mirinê li bal Kurdan di wê kelê de dijî.

Di wî şerê giran de li hember top û cebirxaneya Şah kela bi awayekî qewîm sekiniye, lewre kevirêñ dîwarêñ kelê yek rast yek çep hatine danîn û di navberê de ji gulle wek singan di nav de hatiye helandin.

[8] Îskender Munşî Berîya bibe mistesarê Şah Ebbas defterdariya wî kiriye. Dûre bûye dîrokzan û bûyernîvîsê wî. Navê pirtûka wî, "Târîxê alem arayê Abbasî" ku ji çend cîldan pêk tê. Ev pirtûk wek salname hatine nîvîsandin. Mûnşî bi xwe ji di pirtûka xwe de pesnê berxwedan, lehengî û şervaniya Kurdan kiriye.

Tê pejirandin ku Kela Dimdimê bi strateji û aqilekî bê-hempa hatiye pîlankirin. Di bin kelê de bihur û gêdûkên veşartî hene. Ji bilî bûr u birkên (hewzê) ava kelê ji der-vayî kelê jî di bin erdê re bi qanal û borîyan av hatiye gi-rêdan. Kela Dimdimê ji pênc besan pêk tê. Di nav wan de embarêن gênim, sarincên avê, îmalatxane jî hene.

### Li Dimdimê rîveberiya demokratîk

Piştî ku di kelê de jiyan dest pê dike, ji bo Kurdan dibe warekî rehet, stargeheke biaram û cihekî dadmed. Li hawîrdora kelê hilberîn dest pê dike. Di vê serdemê de bazîrganî pêş ve diçe û bi teşeyekî navendî li hawîrdor belav dibe. Edalet û pêşengîya Mîrzan di nav herêmê de deng vedide. Her ku diçe desthilatdariya wî di nav Kurdan de belav dibe. Di serdem Emîrzan de gellek eşîr û serwêrên Kurd ên li herêmê hawîrdor xwe bi desthilatdariya Dimdimê ve girêdidin. Kela Dimdimê ji Kurdan re dibe stargehek. Kurdêñ ku ji ber zilma Safewî û Osmaniyan direvin jî li nav mîrnişîna Dimdimê bi serbilindî dijîn. Ji bilî Kurdan ên wekî Suryanî û hwd. jî xwe bi Dimdimê digirin.

Mîrzan lijneyeke demokratîk ango Meclîsa Rûspiyan ava dike. Biryarêñ girîng di vê meclîsê de têñ dayîn. Wer tê xuyan ku Mîrzan di gellek biryarêñ xwe de, bi gel şê-wiriye û li gor wê tev geriyye. Wek mînak, berî ku şer dest pê bike Mîrzan bi ciwanêñ kelê dişêwire û ji wan fikra wan dipirse. Ciwan bersiva Xano wiha didin:

Heke Xan bi me dişêwire,

Mirin ji qûltiyê çêtir e.

Dîsa diya Xano Guhar(Asîma xanim) jî ji bo berxwedanê ji kurê xwe re hizra xwe wiha tîne zimên:

Mehêle dijminê bêîman

Ku saxesax li me bibe xwedan

Rind e, te bibînim bi mirî

Ne ku bi qeyd û bi zincîrî

Bi baybetî rewşa jinê ya di nav kelê de gellekî bala mirov dikisîne. Careke din tê xuyan ku rewş û timtêla jina Kurd di çanda Kurdan de rist û roleke mezin dilîze. Tê gotin ku di serî de jin, hemû niştecihêñ kelê têñ perwerdeki-rin. Dîsa di nav şer de jî lehengîya jinê bi rastî jî hêjayı pesn û serbilindîye ye. Jin di şer de bi moral û bîryariya xwe, ji civakê re pêşengîyê dikin. Li vir jî di bin şexsiyeta diya Mîrzan Guhar(Asîma Xanim) û jina wî Stî de jina

Kurd dîrokê dinivîse.

Tê gotin, Şah Ebbas, piştî ku kelê zeft dike, li hawîrdorê kelê digere, dema ku gellek cenazeyêñ jinêñ Kurd ên şer kirine û xwe jî kelê de avêtine dibîne, li xwe mikur tê û di-bêje. "EZ nikarim bibêjim ku em di vî şerî de bi ser ketine."

### Mîrateya Kela Dimdimê û berxwedana Kobanê

Di dîroka gelan de rabirdû, kesayet û çand pir girîng e. Destana Kela Dimdimê jî mîrate û kelepora gelê Kurd e. Haya mirov ku ji berxwedana Kela Dimdimê hebe, berxwedana Kobaniyê zêde lê ecêb nayê. Ev berxwedana Kurdan a Kobaniyê ku li çar aliyê cîhanê deng veda, bingeha xwe ji Kela Dimdimê digire.

Kasım Engin [9], di navbera Kobanê û Kela Dimdimê de têkiliyekê datîne û wiha dibêje: "Dibêjin; dema ku kela bi teqînê xera dibe, li jor ewr deng vedidin û bagerek dest pê dike. Bager bi baskê xwe bûka Asîma Xanimê ya ku ew tenê xelas bibû difirîne û dibe gundekî Kur-mancan. Ji wê bûkê kurek diwelide û mezin dibe. Wê rojê pê ve her salê li hember Eceman serî radike. Belê, neviyên Emîrzan niha li Kobanê dîsa li hember dijmin serî radikin. Wek kalê xwe, tenê erdekî qâsî çermê ga dixwazin li ser rûyê cîhanê. Ü ji bo wê şer dikin û têñ kuştin."

#### Çavkanî:

- Kürtler ve Kürdistan Tarihi, Muhammed Emîn Zeki Beg, Nûbihar Stembol

- Dimdim Kalesi, Ereb Şemo, Çeviri, Edip Polat, Evrensel Basım Yayın, Mayıs 2005 İstanbul

- Kela Dimdim, Jan Dost, destan, weşanên Rewşen û Melsa, Bonn 1991, Stembol 1991, Şam 1995

- Dimdim, Ereb Şemo, roman, weşanên Lîs,

- Dimdim, Hecîyê Cîndî, Iêkolîn û têkst (Yerêvan, sala 2005 û Erbil, sala 2007), Yazar: Ordixanê Celîl (Doktora Tezi)

- Dimdim, Ordixanê Celîl Yayımevi: AVESTA YAYINLARI

- Walter J. Ong, Sözlü ve Yazılı Kültür, Weşanên Metis, Stembol, 2012, r. 189.

- Kela Dimdim Tosinê Reşîd NETKURD 2008an bikin "Sala Eposa DIMDIM".

- Dimdim Kalesinden Notlar Abîdîn Parîltî Radikal Gazetesi 30/10/ 2009

- Xanoyê Çengzêrin û Kela Dimdimê 30 Ağustos 2013 Ciya Mazî



# Birzo û Felemez<sup>(1)</sup>

Berhevkar  
Rêdi SEID

Birzo û Felemez  
Tîtî mîtî avê Mehmûdiya  
Mekrê Mekremiya  
'Elîkê bendewar  
Payîz ço (çû) ma Bihar  
Sosin û beybûn  
Û rihan û Hendeko  
Di mîrga de bûn köpal  
Em ê werin ser ھەkeyeta Rostemê Zal.

Men im menan im  
Men im cangîre cihan im  
Men milûkê qeñreman im  
Men im Rostemê Zal  
Zal kûrê Qar  
Qar kûrê Sem  
Sem kûrê Mewlye  
Mewlye kûrê Nebînuh  
Nebînuh kûrê bavê ma Adem.

Felemend û rexş û xazî  
Kunis ewe Rexşêbelek deranî  
Miñes û gelwesîn kirin  
Zendikê pôla çakutane nav milî  
Gizuziyê pêrisiyê pê ve çêkirin.

Birzo, Felemez her du kûrê Rostemê Zal bûn. Du jinê Rostemê Zal hebûn. Birzo ji Guhderziya bû û Felemez ji Newzeriya bû. Rostemê Zal ji Rexşêbelek emîn Cibraîl ji beñrê derañiye, aniye nal kiriye, Rostemê Zal lê siwar bûwe. Kes nikare mazinahiya Rostemê Zal û Rexşêbelek bidin. Wextê ku diço 'ezman d' bin sikê (zikê) wî de xuya dikir, hewqa gir bû. Rostemê Zal ji gurzê wî neh rîtil û nîv rîtlâ mazoranê bûn, yê pê şer dikir. (A digo li Îranê ye, vêga jî digo her sal carekê ew dikin di 'erdê de diçe xarê, hingî gurzê wî mazin e.)

Her du kûrê Rostemê Zal bûn, rojekê bi hev re çone ref û nêçîrê. Wextê çone ref û nêçîrê dibê, li derekî şî<sup>(2)</sup> xwe re rûniştin ser nanê xwe. Dibê, lê rînd<sup>(3)</sup> Xizalek ji ber piyê hespê wa rabû. Dibê, dane pay Xizalê dibê, Birzo ketiye vê şeqa dinyayê û Felemez vê şeqa dinyayê de ye. Dibê, xizal ji ber piyê hespê Birzo rabû û dibê, û da pay. Em ê bêjin di Giresira<sup>(4)</sup> de avête 'Ermiyêw avête Bilêderê ûl' ba Tilmiz binê Qîra lê rînd biray wil' wir e lê rînd ku va xizal tê hespê wî li paye, li vir deh qebza kêm dike dera ha pazda go, Xwadê zane va biray mi hat û xizal ji ber direve ê xilas bibe, lê werne hev em ê xizalê bikujin lê ser jê nekin bila Birzo bi destê xwe xizala xwe şer jê ke, wextê ku wûn (hûn) ser jê bikin ê zorê Birzo here bê we çîma nêçîra mi pêsiya mi hilanîne. Dibê, li pêşiyê sekinî Felemez tîr avêtê xizal da 'erdê dibê, ser sekinî xizal bi destê xwe şer jê kir û rahişte haletê herbê û hicûmê birayê xwe kir. Dibê, wexta hicûmê birayê xwe kir dibê, sêla sor ser

(1) Têbinî: Nîsanên transkripsîyonê yên ku di nîvîsê de hatine bikaranîn: Ev nîşana "h" yê beranberî tipa erebiya ya "ç" yê dide, nîşana "x" yê beranberî tipa erebiya ya "ç" yê dide, apostrof/dabirra ['] ku li jor tîpan tê danîn jî, tipa 'erebi ya "ç" yê ye, herwiha nîşaneyên "t, k, p, 'c, r" jî stûr têne bilîv kirin. Ligel van tîpan, nîşaneya "ü" yê dengekî nêzîki "ü" ya tirkî dide.

(2) Ji

(3) Nêrîn, mîzekirin

(4) Di çîrokêni gelêri de çîrokbej dema ku navêñ cih û warêñ ku di çîrokê de derbas dibin nizani be, ji dêlva wan navêñ herêm, bajar, gund hwd. mînak dide. Di vê çîrokê de jî çîrokbej navêñ gundêñ derdora herêma xwe mînak daye.



serê hev sar kirin dibê, xetê 'erdê weke mojorê 'erd ûlo  
<sup>(5)</sup> qelaşt ji ber hukmê wa. Dibê, Newzerî, Guhderzî ketne ba wa dibê, wa ji hev dana aî. Birzo li dera ha sekinî serê xwe danî ser rîma xwe dişûnce kir (fikirî), Felemez ji xwe da dera ha, ewî ji rîma xwe çikand 'eniya xwe danî serê. 'Insanê baqil bûn, Felemez go; "wey li min be ûl' zilamiya mi be! Birayê min ê xizala xweb' destê xwe bikuşa mi xizala wîş' pêşiyê hilanî û 'izir ji qebîhatê mastir û mi destê herbê ji ji birayê xwe re hilda. Ez ê bi ci rûyi herim dîwana bavê xwe. Ez ê çawa li nav zilama rûnim û ez ê xeba bidim. Ez çawa bikim baş e. Lazim e, ej' 'erdê Êyranê derêm welatekî ve herim kes nizanibe bê guhê mij' ku we. Ewî ev qerar şî xwe re da." Birzo go; "belê birayê minî piçûk bû û xizala min da 'erdê, e çom ser mib' destê xwe nêcîra xwe ser jê kir û ser wî halî re ji e çom birayê xwe re saweşlemîş bûm (herbê kir). Ez ê bi ci rûyi herim oda Kêxuserê Bimbarek, Tûzênavzerşa, Gêwêguhderz, Rostemê Zal, ez ê çawa herim xebera mi bikeve nav xebera. Lazim e, ej' vî memleketî derêm, terke watan (welat) bibim." Ewî ji ev qîrar

da. Dibêne, her du çone rûyê hev û xatir ji hev xwastin. Birzo kete vê şeqa dînyayê çô û Felemez kete vê şeqa dînyayê çô.

Newzerî û Guhderzî her du hatin eñîwalê way ku kirî mazinê wa Tûzênavzerşa bû, di pay de Rostemê Zal bû, pay Rostem de Gêwêguhderz bû, kurê Guhderzê Pîr bû; dibê, guhekî xwe dixist bin xwe yek ser xwe de dikir. Dibê, şî heftiyê Gêwê teşâş nebana pirça wî wulo bi 'erdê ve dixiriya. Dibê, gava boşnî vedana dibê, têyr, ba ber perê wa nediket weka ewka digo, gum weka sêva ji darê bikeve diketin. Pîrek ba hîeywan ba gava boşnî veda wê 'insanê hemla xwe tâvet. Dibê, ewka wa gotin û dibê ketne dînyayê. Birzo ci go? Go; "ahda mi Xwadê re be, ku piştij' watanê bavê xwe derketime ez ya çiqası pêrekî mazin hebe ez ê berê xwe bidmê lêdim bişkînim." Hêçî Felemez bû, Xwedêyo dora hevindka dora vî çiyayê Maba ûş' xwe re rûnişt, 'esîra xwe ve bi her du sed siwarî xwe ve rûnişt şî xwe re ewk kirin, berxwudan dan. Dibê, Birzo lê da heta gîhate 'Ebdilsiyabê Kûrê Horengê. Mazinê Tûraniya 'Evdilsiyab bû. Sonda wa digo; "tîzk im

(5) Wilo

mîzk im rayê firîzk im serê zilamê pîs kim." Sonda wa ev bû. Sonda mala Zalê Zêrîn jî, bi Xwudanê şev û roja bû digo: "Xwudanê şeva dibe roja tîne, roja dibe şeva tîne yek Xwudê ye." Sonda wa ew bû. (A ha vêgav Tirkîye ha jî ji wa ne ji wî toximî ne, şî toximî 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê, Tûranî ne.) Dibê, gihate wî dibê, ciwab dane 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê go, yek ketiye vêdê evî milet qeland; ne şivan hîştin ne gavan hîştin ne pişîwar şûnda peya hîştin... Go:

-Bîşîne pay bila bê."

Dibê, hat wextê da devê derî, go:

-Esselamû'elêykim.

Dibê, zimanê yekî lê negeriya weka pîreka bikevne hîyda dibê, her kesî cihê xwe de چevizî. Dibê, rûnişt. Wextê rûnişt dibê, bû կul û derd jê re, go:

-Filankes.

Go:

-Ha.

Go:

-Filankes, ez ê pirskî şî te bikim.

Go:

-Ya 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê Pîr!

Go:

-Bêje ya peyê delal!

Go:

-Pirsa te di cî xwe de be bêje, pirsa te ned' ciyê xwe de be, ez pê 'aciz bibim bi Xwudanê şev û roja ez ê qîrekî bidim ku ھeft roja bajarê te here-were weke deydiķê. <sup>(6)</sup>

Go:

-Wele mi dibê te ev 'insanê hay ez zanibim tuş' ku yî, tu kurê kî yî.

Dibê, qîrek da dibê, dê weledê ber singa xwe xweyî nekir.

Go:

-Anaq tu karî li ba mi rûnî xwarinê bixwî, 'esl û feslê mi, ez ku me, kurê kî me tu nikarî ewk bikî!

Dibê, ma usa. Dibê, bû կul û derd jê re ka ev ş' kîjan 'eşîrê

ye, pirs bike koka vî deyne. Dibê, gote xülamê xwe, du xülamê wî hebûn, Hemanê virker û Pîranê; Hemanê tim viş dikirin Pîranê jî pîne dikir, yanê ev her du wezîrê 'Eb-dilsiyabê Kurê Horengê bûn. Go:

-Ya Pîran!

Go:

-Çî dibêjî?

Go:

-Kaj' mi re bêje ez ê çawa bizanibim ev şî ku we <sup>(7)</sup>, 'eslê vî kî ye, şî kîjan 'eşîrê ye.

Go:

Milûkê min.

Go:

-Ha.

Go:

-Keça xwe lê mar bike. Di neqeba jin û mîr de dibê, behîr be digêje hev. Anqaq jîna wî koka wî, silala wî, 'eşîra wî şî te re denne <sup>(8)</sup>. Ema, tu bêjî tiştekkî zorî here vê neqlê bike ku bajarê me ھeft roja here-were, dê weledê ber singa xwe xweyî neke.

Dibê, Birzo newe hundiro ne xülam û rênçber û ne axa û ne ti kes xwarinê naxwe. Gava şî xew rabe ê were, ê dest û rûyê xwe bişo û ê rûne hînû civatê bigere qeħwa xwe bixwe, ê xwarina xwe bixwin. Dibê, wextê hat rûnişt dev û rûyê xwe şuştin, xwarina wî anî xwar, go:

-Ya peyayê delal!

Go:

-Bêje 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê Pîr.

Go:

-Mi dibê ez hêvîkî şî te bikim, tu neħeydî.

Go:

-Welleħî ku bizanibî ê cusseyê mi pê nexweş bibe, bi Xwadê ez ê bikim kud' nava hundirû de hesa serê we weka mëşa lev keve, yek ji we di vî hundirû de nemîne.

Go:

-Mi dibê keçeka mi heye bi hedîye olerak (wek xilat) tuş' xwe re qebûl bikî.

(6) Dardergüs, çencik

(7) Ew jî ku derê ye

(8) Daîne

Dibê, dişulmîş (fikirî) bû, me'lûme kûrê Rostem e. Go:

-Willehî va her sê mihê çile ê lehêfa mi germ be, em ê bi hev bisitrin. Ema, ku bibe bihar ha serê xwe bişo ji vir zér were ji vir zîv were ez têkili xwe nakim. Çimkî mi'ada ez tiliya xweş' kuştinê neberdim ile<sup>(9)</sup> li hedefê mazin digerim.

Go:

-Baş e.

Dibê, gazi kir dibê, hîeft şev û hîeft roja da'weta Birzo li dar danî. Dibê, go; "kî mîzginya keça mij' mi re bîne kuj' wî pîlewanî bi hemle ye, bila zilamê ha bikevne silala mi de, ez ê hîeta li ber deyname ser tereziyê hîeta li ber were ez ê zêra bidmê." Dibê, rojekî keçik hat, go:

-Baba.

Go:

-Ha.

Go:

-Mîzginya mil' te zaroka mi çar mehî ye.

Dibê, hîeft şev û hîeft roja de'weta hemla keça xwe jî li

dar danî. Dibê, kete biharê, şevekî gazi kiriye gote keça xwe, go:

-Ka tu koka wî nadernê, kaş' ku we, şî kîja 'eşîrê ye, famîla wî ci ye, em nas bikin.

Dibê, ma'lûme ûlo şev e, êvarê şîv dixwin ûlo sehbetê şî hev re dikin, go:

-Kuro.

-Ha, bêje hermet.

Go:

-Ez ê pîrskî şî te bikim.


Go:

-Pîrsekî bêje pîrsa te ciyê xwe de be, pîrsa ted' ne ciyê xwe de be ez ê tiliya xwe bêxme ber vî rayî -bi 'Erebî dibê rayê hebîl werît- ez ê dîtina te û dê-bavê te me roja qiyametê.

-Wele mi zaniba tuş' kîjan 'eşîrêy û tu kûrê kî yî, navê te ci ye.

Dibê, ba xwe ve anî çehîfek lê da dibê, çol' dîwar ket dibê, wulo damarê pişa wê berda. Dibê, hîlhîla xwe kir, sibe

[9] Îlehîm, tim



ço gote bavê xwe, go:

-Bavo bi Xwadê yek têhfek avêtîm li dîwar da. Hema Xwadê rojê mi hê nehiştibûn ez timam nebûm. Tiştekî ji min re gotiye ancaq tu karibî li ba mi xwarinê bixwî ûd' nav ciyê mi de razê. Hewqa şî te û bavê te re zêde ye.

Êvarekî gazî kiriye, rûniştin, bû wextê xewê, go:

-Herme ez ê pirskî şî te bikim.

Go:

-Kerem ke, ustâdê mi bêje.

Go:

-Ez ê rabim herim, dîtina min û te îşev maye. Ez ê derk-evim, ev bazbenda min hedîye êb' te re be. Hemla te keçik be gud 'ilba wê de jî weka ya te, ku kûrîk be bazbenda min milê wî yê rastê ve bike. Em mala Sabiqirana şî kesî re nabne bav û bira. De qena roşkî ez û kûrê xwe laqay hev bibin, em hesinê sar ser serê hevûdî nekelîn em kûra hêdada ser serê hev nedadin.

Kire zarzar dehîfek lê da û go, terq derî lê dada ûl' hespê xwe siwar bû terke dinya bû. Dibê, ço. Em ê werin ser mesela hemla keçkê. Dibê, midetê wê qediya dibê, Xwudê kûrek dayê de dibê, neqeba va her du birhê wî dibê, sê bost bosta qoqî bûn. (Ka bosta qoqa çiqase ye.) Wextê ji diya xwe ketiye de sê bosta deyne neqeba her du birûa dêmek serî wî hewqase ye. Navê wî danîne Teymûn. Dibê, Teymûno bû hîeft salî dibê, wextê tibab ji tereziyê zêdey şonekî giraniya wî heye. Di dînyayê de têniş zarokekî nerûniştiye 'ileh li civatê zilama rûdinişt, gohê xwe dida xelqê, xebera di serê xwe de not dikir di-hate ba diya xwe. Rojekî Yemanê Kûrê Pîrê hebû dî wî bajarî dîzûra zaroka ji destê wî tune bû go, mi bitûnê zarakê wî bajarî xistine bin destê xwe heke mi evê ha jî bixisita bin destê xwe min dinya zatîm dikir. (Me digo gomeg, carê em zarakî gomeg dileyiştin.) Dibê, ço darêy xwey gomakê dayê go, ka tu lê bijrêne 'emrê wî pênc salî ye diçe têniş ewka... Piçûk e fêma şuxicê mazin şî xwe dike. Dibê, hema a hîtiliya xwe da vê çena wî, ah wekil dibê, berî wî kete pişta wî stûyê wî kete vî şeqî, bero-paşo bû. Dibê, kire qîrî bi ser de ço. Go:

-Kî hawel kûrê mi kiriye!

Gotin go, wele Teymûno kûrê te berî wî fitilandiye pa-siya wî. Hat go, kûrê milûka hawe kiriye, pâne milûk go-

tiye kûrê min e. Dibê, pîrê go:

-Ne kûrê milûk û ne ti! Yeka dilhê didima nav lihêfa diya wî de raza bû, pîçê ser serê me!

Dibê, kûrîk civata xwe xîra nekir l' 'eynê xwe nederanî nego vê pîrê ev tiştê ha gotiye. Heta civat peşkirî. Wextê civat peşkirî hate malê. Go:

-Dayê.

Go:

-Ha.

Go:

-Bavê mi kî ye?

Go:

-Kûrê mi bavê te 'Ebdilsiyabê Kûrê Horengê Pîr e.

Go:

-Dayê raj mi re bêje <sup>(10)</sup> ez bi Xwudanê şeva dibe roja tîne, roja dibe şeva tîne yek Xwadê ye, ez tiliya xwe bêxme ber vî rayê hîbil werid ez ê dîtina te û 'Ebdilsiyabê Kûrê Horengê li te me qiyametê, ras bêje bavê mi kî ye?

Go:

-Weleh bavê te ci kes be ûş' kû be çawa dizanî ez... Zilamekî weka batlekî bû, te lê şênd te digo wextê dirûnişt te digo çiyak e. Û wele sê miha nav lihêfa mi de razaye. Wextê ço jî go, vê bazbendê hedîya min e, ku hemla te keçik be gûd 'ilba wê de, ku hemla te kûr be vê bazbendê milê wî ve bike. Em mala Sahipqirana nabne bav û bira şî kesî re, de qene ez û kûrê xwe laqay hev bin em aşê mencinikê ser serê hev daneynin, kûra hêdada ser serê hev germ nekin.

Aaa go:

-Dayê eva temam. Go, ez nanê İsa naxwîm salawata li Mûsa nadim. Wextê e ne ziruyeta Tûraniya me, eş' Eyraniya me, dêmek. Mutleqe ev tiştê tej' mi re ornek kirî (mînak dayî) ev ne Tûraniye. Betlê hawa Tûranî de tun in.

Xatir jê xwast bû qîrî wî dibê, go:

-Dayê zarzarê neke, di mala te de nema tînim.

Dibê, ço gote bavê xwe:

-Hal meselê Teymûn ev e.

[10] Ji min re rast bibêje

Dibê, şîna reş deranî, cotarî derê şîn kiriye, ga derê şîn kiriye, 'insan derê şîn kiriye, şîna 'erebî ji bonî Teymûno li dar daniye. Dibê, wextê Teymûno kete dinyayê û ço go, Xwudê gotiye hîş destê vala nekiriye. Eva sîleha mi tune ne. Dibê, gihate, rokê weke rûyê tanzê kérane kî ji vayê pênc-şeş bost 'ewlê milê xwe lê pêça go, çerq ji qurm kişand. Ew şeqatekî jê kir û da destê xwe. Til' Teymûno dijêni dibê, çiyak e, til' dar dijêni tu karî xanîki li ser wî tayê dara ava kî, wextê til' Teymûn dijêni çawa şivkekî bide destê xwe, sîleha wî ya herbê bû ew. Dibê, ketê des mîraniyê kir dibê, heta di welatekî de derket. Dibê, wextê bi çav Teymûn ketin dibê, ew millet hemî ji dest hilanîn ket. Dibê, qesta mala wa kir go:

-Filankes.

Go:

-Ha.

Go:

-Tu ci kesî?

Go:

-E ci kes bim serê we ve nes'eliqî ye. Min bav şî xwe re nedîtiye.

Go:

-Wextê te bav şî xwe re nedîtiye, tu mi bavîti qebûl dikî?

Go:

-Hûn Tûranî ne an Eyranî ne?

Go:

-Wele em ne Tûranî ne.

Go:

-Belê, ez te bav qebûl dikim. Kerem ke.

Dibê, bav şî xwe re qebûl kir. Dibê, sed zilam xiste bin emrê wî, çar heb xûlam jî danîne ber destê wî; Reyo, 'Arib, Çeko, Qoqî. Va her çar jî kirne xizmetkarê ber destê wî, 'istekê (xwestekê) wî pêk bînin. Dibê, Teymûno rojekî li mala xwe rûniştiye Çeko 'Arib, Reyo, Qoqî balê ne, lê şînê qij civata wa qerebalix hat. Go:

-Çeko 'Arif...

Go:

-Libê ya milûkê min.

Go:

-Xwe bigîne dîwanê bila weka kera xeber nedin, nekne

qîr! Bila yek gava xeber da guhê xwe bidnê ka ci gotine. Gava êvarê werin qarbin jina xwe re bêjin an ji erqedashêkî (hevalekî) miclisî de nerûnişti bê îşev miclisê ev hebû, ev proxram danê de. Weke kera herkes dema xwe de xeber bide, e tişkî hewa nebînim bêje wa, bi Xwudanê şeva dibe roja tîne yek Xwadê ye, gava ez qîrekî bidim ez ê bikim ku hemî weke mîşna gêj wê dê tiray 'erdê bin.

Go:

-Milûkê min.

Go:

-Bêje.

Go:

-Li qisûrê neşîne, ev bajarê ha d' bin hukmî 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê de ye. Salê çar bar zêr xercelişa xwe, xercelişa vî bajarî ji 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê re dişeynîn. Îdî me'lûm e, îşev ixracê wa hatine ku top bikin, îdî hînek dibê wile te zehf ji mi standiye hindik şî filankes standiye... Ehwala heqê xwe dikin dibê, gorî quweta wa bidne...

-Ebdilsiyabê Kurê Horengê ci tişt e?

Dibê:

-Wele mazinê Tûraniya.

Dibê:

-Ê sibê d' ku de herin?

Dibê:

-Wele di vê de hada herin.

Dibê, Teymûno mûyê wî tûj bûn weke bijwê baraz kurk û qapûti de avêtin dibê, bû xîjêna şoda singa wî qadir hê weke zîzî bêje terq û biteqe. Hetta sibê weke feqey necîr 'elamê bixwune nava hundiro de çô û hat ka ê kengê sibe were. Çuka sibê xwend dibê, Teymûn çô di newalê de di wîrajê de sekinî û rûnişt. Dibê, ev Hemanê virker û Pîranê her du serçêlê wane, bi wan re ne, çar bar zêr bi wan re ne ûb' şipka xwe bi wan re xeber dide, dibêje wî tu ne taze xeber didî, ha wa ye. Dibê, bi hafê ketin cil 'insan in. Dibê, wextê bi çav ketin her cil ji mîranişti ketin. Lê dijêne çawa ciya diherike ser rê. Go:

-Kuro.

Go:

-Bêje.

Go:

-Wûn çi kes in?

Go:

-Em xulamê 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê ne.

Go:

-Ev çi ye li pêşîya we?

Go:

-Ixracâ bajêr e.

Go:

-Vegerin, wele ez karim hespê we jî ji we bistînim, ez we peya naşeynim, lê belê ûn (hûn) herin ji milûkê xwe re hawa bêjin.

Go, weke ew betlê wî ye, ewka wî ye, bi Xwadê em herin sîr û pîvaza kelandiye, em jî cil heb in ew yekî tenê ye. Dibê, wextê usa go dibê, hema ew der hawa fitiland yekî tenê sax nema. Ew Hemanê virker ber darineka xwe چewand filiti û dibê, ço. Wextê ço 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê çavê wî lê ye dûman bi ewkê ket, go:

-Kûro la va Heman hat li hêviya hevalê xwe jî nesekinye.

Dibê, wextê ço go, gurm û ket. Dibê, 'Ebdilsiyabê go:

-Ne Heman bû ew hat?

-Ho ho Heman e, va du se'eta ruh jê ço pîrek ser digrîn.

Go:

-Çima?

Dibê, hatine ewk li dev û rûyê wî kirin bi ser hişê xwe ve hat.

-Kûro çi ye?

Go:

-Milûkê min, mi dîtiye, tu nebîni! Wele ti bana, du rojê dî jî ranedibûy. Milûkê mi hema weke dîwarekî bînî deynî ser wê rê, tel' darê dijîn te karîbû xanîkî ser wî darî ava kî, ber gûcî weke şak şivik bû. Welehi yek carî şivka xwe fitiland yek jî me sax... mij' paş ve bazdaye.

Efendimî sera dibê, tîzkîm mîzkîm rayê firîs kim, serê zilamê pîs kim, sonda mirovê bêdewlet kim dibê, çiqa yazerê (katîbê) wî hebûn danîne ser ewka û dibê, erzoñal ser erzoñala nivîsand go, eman û sed eman em hatine agîhê giran ev girara me dîti gelek avê hilde. Dibê, cil sirm jî 'insan girêda û dibê, hat şerê wî. Dibê, bi şev Teymûno qey desmêja wî nexwaş bû derket lê dijîn

çîqaah çavê difitilîne, şî xwe ceyran nebû, hemî 'elektrîk in û fanosnû 'çira ne. Dibê, Teymûno gote wa, ew zêr vegerandin herkî da xweyê wa. Dibê, Teymûno bavê wî go:

-Zanî çi ye?

Go:

-Çi ye?

Go:

-Rabin qetkekî bi rêx bixne stoyê mi de û hinek têni weke hêka 'eydê mi nexîkîne ez ê herim xwe bavêjme rikêba 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê belkî Xwadê ye em 'efû kirin.

Hayê wî jî jê tune. Dibê, wusa li xwe kir dibê, qetê xiste stoyê xwe pê girtin birne balê ço rikêb, go:

-Rabe! Tu xatirê wê halê xwe bî, te xwe xistiye vî halî mi te 'efû kirî. Lê wî zilamê li ber barê mi rabûy...

Go:

-Hooo... Serê milûk jî, sêwîkî guhê va da bû mi terk kir ço.

Dibê, ço dibê, neqla dî hatin dibê, cil bar zêr avêtne ser wa. Dibê, dîsa bû qerebalix miclisê go:

-Reyso, Qoqî, Çeko 'Arim.

Go:

-Bêje sultanê min.

Go:

-Ev çi qerebalix e dîsa ji hundirû tê?

Go:

-Milûkê min, bavê te neqla dî qepkekî bi rê xiste stûyê xwe de weke hêka 'eydiyê xwe nexîş kir û qetkê bi rîx stoyê wî de ço rikêba Hemanê virker maç kir. Ê iro hattîye şûna çar bar zêr cil bar zêr avêtne ser wa. Çil bar zêr ne hinek in. Vêca jî wê xel eñîwalê xwe gazint dike dibê, quweta me tune haweye.

Go:

-Ev nabe.

Go:

-Belê, bi serê bavê te.

Dibê, xew bi çavî vî neket. Dibê, müyê wî tûj weke bijwê bask kurk û qapûtê bû xîrêna şoda singa wî qedehe bêjê

terq û biteqe. Şevaqê go:

-Êb' kê rê de herin?

Go:

-Ha di vê rêya ha de herin.

Dibê, ço kete pêşıya wa sekînî. Gazî wa kir go:

-Filances.

Go:

-Ha.

Go:

-Ka çar heb îlerî gelenê (mezinê, rûspiyê we) we werne vir.

Dibê, çar heb hatin. Dibê, hawe dest avête zimanê yekî kişand, ew ji qurm rakir avêt. Ô yê di jî anî dibê, milê wî girt helqek dayê ev mil çô ma bi milekî ew jî avête... Yê din jî kér avête vê de pişta li vir zêde hebû hilkir û go:

-De herin ser patronê (mezinê) xwe ve.

Hemanê viñker baz da dibê, bê riñ li devê derî ket. Go:

-Çi bûwe?

Go:

-Wele her cil bar zér şî pêşıya me deranîn milûkê min û pozê me jê kir û serê te ëhal mesele ev e.

Dibê, dîsa 'Ebdilsiyabê Kuçê Horengê dibê, çar şev û çar roja 'esker kişiande nava bajarê Kengê. Ü dibê, 'esker kire sinif, cil sinif ji 'insana girêda dibê, ço hawîrdorê wî danîn. Dibê, Teymûno çô ba hededa, go:

-Gurzê mala Zala Zêrin çiqas bûn?

Go:

-Heft ritil bi ritila mazoranî.

Go:

-Neh ritil bi ritila mazoranî gurzê mi çêke. Ez Xwudê kim ev şûrê mi ji almas e, hesin dibîre ku e lê bidim ciyê şûrê mi jî tê de çêbe ez ê serê te hilkim. Lazim e hesin mifriq be, hesin lê işlemiş (nexebite) nebe. Haş' te re sed zêre zêr.

Dibê, jê re çêkir anî dibê, teslîm kir. Dibê, hingê xelk bi



'istekê (li ser daxwazê) diço şerê hevudî. Mesele digo bila filankes were şerê min. Dibê, ewî beyreqa (ala) xwe ço çiqand. Go:

-Navê min Teymûn e, ez baximsiz 'insan im (bi serê xwe me); diya min û bavê min ez nizanim, ez hatime dinyayê mi wa nedîtiye. Navê min Teymûn e.

Dibê, wextê derket sibê weke conagay hêchê bedlek şe mayî kete halê, go:

-Bila were şerê mi 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê Pîr.

Ê wextê di nava Tûraniya de kesî nikaribû şer ji 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê bixwaze. Wextê kete navê dibê, ketne ewka de dibê, hatne serê bi deha, pazda... Go:

-EZ wî dikim Xwudanê şev û roja, kuz' wa hawa xilas kim ez we xilas nakim. Sibê, ez ê qañwaltiya (taştaya) xwe bikim bikevme nav wan hëtta êvarê ez ê bi vir de herim û di vî alî de vegerim.

Dibê, wextê diçe çawa qirêder rê bide bi vî milî leşa dide 'erdê wî milî leşa dide 'erdê, şeqa dî te tê hewqa... Êvarê tê ewka xwe de rûdine. Dibê, wusa bû kevçîhilgir şî Tûraniya neman. Rabû 'Ebdilsiyabê Kurê Horengê ci kir? Go:

-Tîzkim mîzkin rayê firîz kim, serê zilamê pîs kim, eke kuştina vî bi destê me be, ê deh hêzar sal dened he-yama Rostemê Zal de du sed salî hê nû 'insan kamil, balix dibû, nehsed sal, hêzar sal, hëfsed sal 'emir tikirin. Vêca neyar hewceyî neyar dibe. Em xwe hewaley mala Rostemê Zal nekin, ev îmdada me de newin ê kevçîhilgir ji me bikne derba.

Dibê, rabû kaxizek nîvisand û hinek girî û hinek bi rezîlî, tê de nîvisand hewlê xwe gotin dibê, ji Rostemê Zal re birin. Dibê, wextê Rostem kaixîz xwend dibê, stêrka da çavê wî. Kêxuserê Bimbarek go:

-Xwadê mib' qurban wa stêrkê çavê te bike. Te kuştina Birzo sefi kir an ya Feremez hëta stêrk ji çavê te hatin.

Go:

-Na wele, haj' te bixwîne.

Dibê, wextê xwend dibê, Kêxuserê Bimbarek jî giriya. Dan destê Gêwo. Dibê, Gêwo qîrek da dibê, sed xanî çô hat ji ber qîra wî. Go:

-De rabin em herin şerê wa.

Dibê, bitûnê Eyranê dibê:

-Tîtî mîtî avê Mehîmûdiya,

Mekrê Mekremiya

'Elîkê bendewar

Payîz çô (çû) ma bihar

Sosin û beybûn

Û riñan û hêndeko

Di mîrga de bûn kopal

Em ê werin ser hêkeyeta Rostemê Zal.

Felemend û rexş û xazî

Kunis ewe Rexşêbelek deranî

Mîhes û gelweşîn kirin

Zendikê pôla çakutane nav milî

Gizuziyê pêrisiyê pê ve çêkirin.

Men im menan im

Men im cangîrê cihan im

Men milûkê qeñreman im

Men im Rostemê Zal

Zal kurê Qar

Qar kurê Sem

Sem kurê Mewliye

Mewliye kurê Nebînuñ

Nebînuñ kurê bavê ma Adem.

Li Rexşêbelek siwar bû metrê xwe xwend û bitûnê Eyranîya dane pay. Dibê, wextê hatin çadirê Tûraniya li vir in û yê Eyranîya li vir in. Hele yek kurîk li vir e, ewa jî bir çadirê xwel' wî alî danîn. Dibê, serê şeveqê hëtta nîvê şevê bû borbora Teymûno, çô hat nava çadira xwe de. Serê sibê çûka sibê nexwendibû derkete meydanê go:

-Bila bê şerê min Rostemê Zal!

Ê me'lûme wextê (ji) Rostemê Zal şer xwast nava Eyranîya de bû zelzele dê weledê xwe xweyî nekir, berxê xwe neda mêsînê, xwe neda ser berxa xwe. Di dinyayê de hewqa hêrb Êranî, Tûraniya de çêbûn kesî nikaribû şer ji Rostemê Zal, Kêxuserê Bimbarek, Tûzênavzerşa, Gêwêguherz bixwaze. Çimkî, na 'ışê ku sed û du sed û hêzar herne wa, hëta bi 'istekê bixwazin. Dibê go; "dêmek mirina me nêzik bûwe û ev pêlewan pêlewanekî zêde ye hëtta ev şer ji Rostemê Zal xwendîye." Kî jî bixwasta mecbûr bû ew kes here şerê wî. Dibê, wextê

siwar bû nava Eyraniya de bû zelzele go; "çawa yekî weke Rostemê Zal xel 'istekê sewaşê bike (şerê jê bixwaze)." Dibê, pîrek tema şîn girêdan, bû zûrzûrê wa za-rokê xwe şîr nedana wa ji kerba Rostemê Zal. Dibê, wextê dageriyane meydanê dibê, destê xwe dane he-vûdî, me'lûm e, 'ewirî teqle destê hev digirtin. Dibê, wextê milê wî hejand gob' Xwudanê şeva dibe roja tîne, roja dibe şeva tîne yek Xwudê ye. Heke vî hîvqeka dî bida milê min ji dûvka min heta milê mi ci rav hebûn êb' destê wî ve biçû av. Roja ez ji nav lepê vî derêm, vege-rime malê ne iro ye, lê ema ez ê xweb' hîlê ji nav lepê wî xilas kim. Go:

-Herê Teymûno go, çira bavê Teymûn go, Xwudanê şeva dibe roja tîne, roja dibe şeva tîne yek Xwudê ye, 'emrê yazde ye nebûwe duwazde. Eke tu bûwa duwaz-daw pazzaw bîst, di tu tewleta (dewlet) de kesî nikarû bi te re sewaşê bike. Ema, herba Rostemê Zal Xwudê neyne serê gurê çiya, gur gunê ne. Te yanîşî (bi şâşî) navê mi xwendibe ez ê herim bila yekîl' 'imsalê (hinkûfê) te were.

Go:

-B' Xwudanê şeva dibe roja tîne, roja dibe şeva tîne... Ew 'insanê bikeve nav lepê Teymûno ew nevegeriya ba jina xwe negote kujê xwe kujê wî nego babo. Ez ê vêga aşê hîdada li ser serê te dadime ez ê bikim ku cil met-reyi li ber lingê Rexşêbelek bibe xedeq, ez ê tûra ewkê baejme stûyê te, ez ê zincîrpêçê binê çadirê bikim.

Dibê, go:

-Derba xwe daweşîne.

Go:

-Ez hatime vî 'imrî destê mi dar girtiye heta mi hîletet hîrbê çekiriye mi 'ewîl' gurza xwe nedaniye kesî. Kerem ke.

Dibê, Rostemê Zal ling lingekî berda dibê, ew gurzê hîeft rîtil û nîv rîtla mezoranê bire ber hîwalê kela meji wî kir. Dibê, vêra 'emûdê berqîlê lê da, vêra şûrê şîn lê da, vêra tasa merçalê beşa hilda dibê, kire derb û mîsal avête serê çiyayê bîhîvê. Dibê, di neqaba wî û ewkê de dibê, ronahî nema. Belkî cil ton ax bire hewa derba wî. Dibê, go:

-'Insanê ji axê mi tu kirî ax.

Dibê, ser bû ronahî go:

-Herê Rostemê Zal, ez Xwudanê şeva dibe roja tîne, roja

dibe şeva tîne yek Xwudê ye. Ku nîvê miha biharê ker-mej gezekî li devêhê ci bidê ê ci zirar bigêjê, derba te hewqa zirar daye min. Xelqê digo derba Rostemê Zal kes nebîne, de dêna xwe bide birazyê xwe ez ê derba xwe deynim, derb xelq çawa datîniyê de.

Dibê, vêra derb ling lingekî re spî kir sivik kir dibê, ew gurzê neh rîtil û nîv rîtla mazoranê fiewaleyî kela mejiyê Rostem kir. Vêra 'amûdê barqîlê lê da, vêra şûrê şîn lê da, vêra tasa merçalê beşa hilda hîvde şivkê pôla ş' tasa merçalê şikandin kire şara bêjingê xiste stûyê Rostemê Zal. Dibê, xetê kotanê li ber sing singa hev vekirin, aş aşê mencentiqê ser serê hev dadan. Qulbane derba dor bê, herkî pêncî mîrkut vayê derba dorê pê singa hevdi dan yekî tib yekî nekir. Rostem go:

-Herê Teymûno!

Go:

-Libê, 'çira bavê Teymûno.

Go:

-Me hîeq li xwe heye me hîeq li va hîeywanê bin xwe de tune. Xema kerbendê ji mi re bavêje ez ji xema ker-bendê şî te re bavêjim. Ya tê mi zincîrpêçê binê çadira xwe bikî yan ez ê te zincîrpêçê...

Go:

-Wele min ê ev bigotana ema di yaşê (salê, temenê) te de mi qêmîş nekir vê kelîmê şî te re bêjim.

Dibê, xema kerbendê avêtê û dibê, rikêb da hespê xwe. Wextê rikêb da hespê xwe çawa tu kelemerperê bavêjî ser avê dibê, Rostem pey Teymûno herikî. Dibê, wextê herikî leqa kelehekî kevira bû weke cil tonî dibê, da ber singa xwe dibê, hawê lê rînd guyê hespê wî hejîyan l' xwe fitili. Go:

-Herê Rostemê Zal!

Go:

-Çid' bêjî 'çira bavê Rostem.

Go:

-Wî kevirî rak wî keleyî ra'd neke neyne nex... Ez Teymûn im, tu dest bavêjî çiyay hûdê ez ê te zincîrpêçê binê çadirê bikim.

Dibê, qederekê gîha dibê, bû xırxişa ewka wî dibê, hawê lê rînd ku xema kerbenda wî dike ku bibire. Go:

-Herê Rostem!

Go:

-Çid' bêjî.

Go:

-Ez Xwudanê şeva dibe roja tîne, roja dibe şeva tîne yek Xwudê ye. Tu çil salî di ser de bibî gava tu şûrê xwe hildî tu nizanî te cil cara mid' nava ava mifrûqo û pôla de hil-daye. Dev ji wî sin'etî berde ez ê te zincîrpêçê binê çadîre bikim.

Qederekî çô dibê, Teymûn bi aqilê xwe şêwirî gob' Xwadê qismê mala Zalê Zêrin ez bime ez yekî nakuşîm, ez ê wa bêslemîş bikim (xwedî bikim) ez ê qîmet bidime wa, ez ê hûrmeteke zeñîf mezin bidime wa. Ema Rostem iro ez hêşîrê binê çadîre bikim, e tu tişkî pê nekim Rostemê bimre. Çimkî, Rostem tu car hêşîrê binê çadira kesî nebûwe. Ê bibe kul û meraq pê re eşâ elemê, ê bi wî derdî bimre here. İca ez ê tişkî baejme berê xel ne-bêjne hema Rostem ji nivê rê berda çô, bila here xel (xelk) nebêje Rostem hêşîrê binê çadîre bû. Go:

-Herê Rostem!

Go:

-'Çira bavê Rostem.

Go:

-Tuj' ya mi bikî hîrba min û ya te ya du zaroka nîn e, em ê bi sala miha li ber hev bidin. Îja tuj' yan mi bikê em ê xema kerbendê ji hev sist bikin em ê herkes herne mala xwe.

Dilê xwe de go; "ew Xwudayê xistî dilê te ez b' qurbana wî Xwudayî bim." Go, çerqqq kîlît lê da ji ber singa xwe vekir, wî jî vekir. Dibê, di nava Eyranîya de keyfxweşî çêbû heta hingê zuriyan go, wa Rostem hêşîrê binê çadîre dibe.

E ci sinc serê we bêşînim dibê, lê da di qismê Eyranîya ji heta bi Kêxuserê Bimbarek ewî hemî hêşîrê binê çadîre kirin. Yê dibe binê çadîre ji yekî ji nakuje. Hemî rojê sê car goşt û birincê dide wa, bi şuştin û ewkê wa ewk dike.

Dibê, deng ji wê dê çô gihate bavê Birzo, kal' kîjan welatî bû. God' neqeba Eyranî û Tûraniya de şer derketiye, yek şexsekî tena Îranî, Tûrani hemî girtine, kuştine. Eyranî ji

teslîm kirine deh hêzar 'insan hemî belîbaşê (giregirê) wa girtine hêşîrê binê çadîre kirine û pay hat. Xel bi şev diraze, şev û roj xew ji bi wî re tune. Ka kengê here bi-gêje vî şernî. Dibê, wextê derkete hafê lê rînd ku wa çadirek tenê li wir e, yê Tûraniya li wir in û yê Êyranîya li wir in. Dibê, wî jî çadira xwe li wir qurmîş kir (vegit). Dibê, heta nîvê şevê, nîvê şevê nebûy dibê, Birzo di nava wê meydanê de ço bû borbora weke gamêşê hêç. Dibê, Teymûn di xew de razaye dibê, gazî kiryê de, dibê:

-Çeko 'Arim, Reysô, Qoqî go, werin işev em ê li ser mi-riyê xwe bigîn hê nemri.

Go:

-Çawa?

Go:

-Roja ku evî des şer kiriye <sup>(11)</sup> mîra hîrb jê nexwastiye, ji êvarê ve yek ketiyêw nej' Tûraniya nej' Êyranîya ye. İşev binê çadira xwe nekete vîqasî sawasê dixwaze. Bi Xwadê roja em idî Teymûno bibînin ciyê hîrbê vegere îro ye. Îja em ser bigîn hê miriye mel' ba me. <sup>(12)</sup>

Dibê, lê rînd ku va her çar dorê rûniştîne digrîne istirê <sup>(13)</sup> wa diketin ser çavê wa. Dibê, ha kir go:

-Xêr e law!

Go:

-Wele hîl meselê mi ev e.

Go:

-Tiştek nabe. Qey çığa mo (mirov) mîr be ji mo mîrtir hene.

Dibê, wextê derket dibê, çone meydanê, destê xwe dane hevûdî her duwa. Destê hev teqilandin dibê, çawa di zêra bavê ser minzîna zêr qema destê her duwa bûwe yek. Dibê, Birzo go:

-B' Xwudanê şeva dibe roja tîne, roja dibe şeva tîne yek Xwudê ye, tişa ez zanim xeyrî meya mil' diya vî negeriyaye û kitibê me dibêjin dibê, heta 'insan ji cilî nebore ji derba xwe naakeve ku ew kûrê mi be, ew bibe ci ez ê illim deynim ser dezgê.

Go:

-Gurzê xwe deyne min.

(11) Dest bi şerî kirîye

(12) Li ba me

(13) Hêşîr

Go:

-EZ gurzê xwe nadeynime te, tê gurzê xwe deynî min. Dibê, ew gurzê neh rîtlî û nîv rîtlâ mazoranê bie ber peravê 'ezmana hewaley kêle mêtî wî kir. Dibê, vêra amûdê birqî lê da, vêra şûrê şîn lê da, vêra tasa merşalê beşa hilda... Hivde şîfkê pôla ş' tasa merşalê şikandin kire tarâ bêjingê xiste stûyê wî de. Dibê, go:

-Zanî çî ye?

Go:

-Çî ye?

Ew bi xwe derba lê nade, dil nade lêde, nas dike lo. Zane ku ew pêlewan nej' va 'eşîra ye. Go:

-Ka em destê xwe xema kerbendê ji hev re bavêjin.

Dibê, dest avêtê wextê rîma xwe bilind kir, go:

-EZ karim Xwudanê şev û roja sond bixwim ku şeyrî meya mil' diya te negeriyaye.

Rahişte 'çengê wî ûl' ber zîn ber xwe danî û berê xwe da binê çadira Rostemê Zal. Dibê, wextê danî 'erdê çoka

xwe xiste sikî ku şûr bavêje stoyê bire. Go:

-Bavo mala xwe xira neke, bûk jî ji me ye zava jî ji me ye, ev jî nebyê te ye.

Hê nûka dibê bi hev hesiyan, içata xwe eşkere kirin kî kurê kê ye, şî kuwe, çî mesele ye. Eyranî hatne mala xwe, Tûranî çone mala xwe û reñmel' dê-bavê hîazira.

**Agahiyê Din:** Reşîdê Evdilkerîm ev çîroka, beriya 57-58 salan ji mirovên zane û şevbêrvan <sup>(14)</sup> iyan girtiye. Reşîdê Evdilkerîm ji xeynî çîrokbehîya xwe dengbêjekî hoste ye û di nav gel tê naskirin û 20-25 sal berî niha gellek band dagirtine.

**Çavkanî:** Reşîdê Evdilkerîm

(Ferdekkî Mala Elî ye û bi eslê xwe Torî ye)


**Temen:** 71

**Perwerdehî:** Nexwende

**Herêm:** Gundê Hiseynî/Misircê/Êlih

**Sal:** 2012

(14) Kesênu ku beşdarî şevbuhêrkan dîbin.



# GULAL

Ca beno ca çi nêbeno, yew gulal bena. Gulal rageray şî, va willay ez xo rê şona zewejina. Şî şî şî... raştê yew şûnê amey. Şûne vat:

- Gulaley gulale xatuney, şimik zerrey, rekrekiney ti şona kore?

Gulale vat:

- Willay ez xo rê şona zewejîna, şûne.

Şûne vat:

- Ti mi nêgina?

Gulal vat:

- Ez tu gîna. Roj ma bişehynê(bide pê ro) ti mi pey çi kuwenê?

Şûne vat:


- Ez tu pey çiwa xo kuwena.

Gulal vat:

- Willay ez deyamişî çiwa tu nêbena.

Zaf zamon túy zamon şî, raştî yew citêr amey. Citîr vat:

- Gulaley gulale xatuney, şimik zerrey, rekrekiney ti şona kore?



Gulal vat:

- Willay ez xo rê şona zewejiña, citîr.

Citîr vat:

- Ti min nêgina?

Gulal vate:

- Ez senî tu nêgîna, ez xo rê şona zewecîna. Roj ma bişehnê ti min pey çi kuwenê?

Citîr vat:

- Wilay ez pey misasê xo tu kuwena.

Gulal vat:

- Willay ez deyamişî misasê tu nêbena.

Guale şî şî... raştî yew merre ameyî. Merre xo çenkeno qeyme. Merre vano:

- Gulaley gulale xatuney, şimik zerrey, rekrekiney ti şona kore?

Gulal vat:

- Willay ez xo rê şona zewejiña, merre.

Merre vat:

- Ti min nêgina?

Gulal vat:

- Ez tu gîna. Roj ma bişehnê ti min pey çi kuwenê?

Merre vate:

- Ez tu pey bûça xo, tu kuwena,

Gulal vat:

- Willay ez deyamişî buça tu bena.

Merre û gulale mare kerd. Gulale vana ma leymîn û lîşin bîyê, ma şîrê xo bişiwê. Merre va ha ma şîrê. Şonê şonê raştî yew ro yenî. Vonî willay ino ma rê qîm nêkeno. Şonê şonê raştî yew laya yenî. Vonî

willay ina laya zî ma rê qîm nêkeno. Şonê şonê yew raştî simî herî ameyî. Awke debîya pir biya. Hih.... Va ina ma rê besa û gulale tencireyi xo adir serna ki xo bişiwê. Dî ki yew espar, heway vayê yeno. Merre vazdeno vernîya esparê. Espar gemî estura xo kaşkeno û esture edil-neno. Merre persoно; "ti kore şonî?"

Espar va:

Sîçan axa, willay dewa Gulzone di veyve esto, ez şona

veyve.

Merre va:

Ez zî yena veyve. Ma pîya şîrê.

Espar û merre şonî, Gulal veda merrê dona, vana: Helle vindi vindi,

Merre vano :

- Çî yo ?

Gulal va:

- Wextî ki ti ameyî. Mi rê tikî tirşî û yew kateyî guşt be-yarî.

Merre şono veyve, govende kaykeno. Tirşî onî ronenî. Merre tirşî veno. Wextî wardeno. Tikî tirşî dekeno hakanî xo, kate gîno xo feke ra keno û raymoneno. Raştî yew merdim yeno, tera persoно:

- Herro ti kore ra yenê, yew gulale tu vera nêbî. Cay ti raştî yew gulale nêameyî?

Merdim vano:

- Willaye yew gulale. Rinda rindonê bî,ponceyî pirde de şîbî

Merre vano:

- Se bi?

Merdim vano:

- Dekewtî bî awka simî herê

Merre vazdeno vazdeno... Kate fekî ra kuweno. Xo çen keno çen keno hakî yi teli ra monenî dirêni û tirşik rişena. Yeno ki gulale zerrey awke da, tiro şona vecîna. Merre vano:

- Destî xo bidi mirdeyî xo.

Gulale destî xo derg kena merre rê. Merre piro beno destî gulale tewşeno. Enê kaşko teber. Girmo dekewno awke. Wirdî piya tiru şonê vecîni û awka simî herê di xe-neqînê.

**Çime:** Hezoya HÜSÎ

**Serrê aye:** 67

**Perwerdeyî:** Nêwendê

**Herêm:** Dawa Gulzan/Pîran/Amed

**Serre:** 2015



Wekî gelek neteweyên qedîm neteweya Kurd jî xwediye çandeke dewlemed a gelêri ye. Yek ji van dewlemen-diyan jî lîstikên li xêl/dawetan têñ lîstin in. Hinek ji van lîstokan li ser bizariya/teqlîda tiştekî têñ nîşandan û xwediye peyamekî ne. Lîstokên bi vî şîklî rasterast dibin bingeha şanoya gelêri ya Kurdan.

Arîstoteles ku ew mijara agahîdayîna zanîna şanoyê de feylesofê yekemîn e. Di pirtûka xwe ya bi navê "Poetika" de derheqê derketina şanoyê de ev agahî daye: Şano, teqlîda hereketan e. Ü şanoya yekemîn li Yewnan'a Kevin, di şâhiyêñ berhevkirina tiriye nav rezan de derketiye holê. Dema tiñ dihat berhevkirin ji bo ku bereketa mehsûlê zêde be, ayînek olî tê çekirin û vê ayînê de oldar hawara xwe digihîjînin Dyonisos'ê ku Yezdanê Bereketê ye. Şanoyê, cara yekem ji teqlîda vê ayîna ji bo bereketa tiñ hatiye lidarxistin de dest pê kiriye. Her wiha hemû şanoyen gelêri jî di heman şîklî de derketine holê. Di şanoya gelêri ya Kurdan de jî heman rewş heye. Di lîstikên ku têñ lîstin de teqlîda tiştekî heye û xwediye peyamekî ye, ango ne tenê ji bo bihorandina wextî tê lîstin bi lîstokê peyameke watedar jî derdikeye holê.

Di vê nîvîsarê de em ê lîstikekeku li gundê Eynê ya girêdayî Sérte têñ lîstin bidin nasîn. Gundê Eynê, girêdayî navçeya Dihê ye û gundê herî mezin ê Deşta Mişarê ye. Di vî gundî de edebiyata devkî hîna jî pir xurt e û zindî ye. Xêl û dawetên Eynê, wekî dawetên hemdem ji rêzê nabîhorin. Govend û dîlan herderm banga yekitiye, jiýîna bi hev re û mildana mil bi mil didin. Ci ciwan û çi kal, bi hev re wê çanda gelêri didomînin û lîstikên ku kalan nîşanî wan dane, ew jî nîşanî nifşen nû dikin. Navê lîstika ku em ê bidin nasîn "Kurtê Kelaşan" e. Beriya ku em zagon û awayê lîstikê vebêjin hinekî li ser navê vê lîstikê agahî bidin:

Kurt, navê çûkekî ye. Ev çûk bi xwarina goştî debara xwe dike. Navê wê yên Kurmancî li gorî herêman diguhere û

## Li Gundê Eynê Şanoyeke Gelêri: Kurtê Kelaşan

gelek navê wê hene: Sîqalk, keçelok, sîqalka gurî, ker-gez, kerxur, sîsark, sîsarîk, sîsyareka gurî, sîsalk. Navê latînî yê vê çûkê goştixwar Vultur monaehus e.

Kelaş, ji ber ku peyveke belave ye û pir tê zanîn bi kurtasî em dikarin bêjin laşê mirî ye ango kelax e. Bi Erebî jê re cesed tê gotin.

Belê navê vê lîstokê Kurtê Kelaşan e û awayê hereketê lîstokê û wateya ku dide jî girêdayî jiyanâ Kurtê Kelaşan e. Wekî tê zanîn û jorê jî hat diyarkirin, çûka kurt, kelaşan an jî lawirêñ zindî, bi taybetî jî lawirêñ bêparastin û zeif dixwe. Di jiyanâ lawiran de zagona bingehîn ew e ku yên bihêz, yên zeif dixwin. Di lîstokê de jî wateya bin-gehîn a peyamê ew e ku di jiyanê de divê mirov bihêz be, lê bihêzbûn bi tena serê kesekî nabe. Pêwîst e mirov bi mirovîn din re têkiliye deyne û héza xwe bike yet. Bi vê wateyê ev lîstik tê lîstin û lîstikvanê Kurtê Kelaşanê hereketê wekî çûka kurtê dikin: Lîstikvan li ser çokêñ xwe li gor ritima muzikê(erbane/dahol) êrîşî hevdu dikin û dixwazin goştê reqîbêñ xwe jê vezin.

Di lîstika Kurtê Kelaşan de tiştekî din ê balkêş jî ew e ku rasterast hem bi jiyanâ çûka kurtê ve hem jî bi hêviya jiyanâ xweş a bûk û zavê ve girêdayî ye. Di jiyanâ çûkêñ kurtê kelaşan de tenê yek hevjin heye. Ango nêr û mîyêñ kurtê kelaşan dibin ê hevdu û heyâ mirinê bi yekî din re têkiliye danaynin. Ev lîstik dema tê lîstin vê wateya pîroz wekî peyam didin bûk û zavê. Hêví û pêşniyar dikin ku bûk û zava ji hev re gelek baş bin wekî kurtê, tenê ew yên hev bin wekî kurtê, çav bernedin tu kesen din. Wekî kurtê, heyâ mirina bihêz bin û tu kes nikaribe goştên wan bixwe. Wekî kurtê...

**Amadekar:** Muhammed Hêja KAYRAN

**Çavkanî:** Sadullah KAYAR

**Temen:** 48

**Herêm:** Gundê Eynê/Dihê/Sêrt

# HEWT BERANÎ

Mêrikêk est o. Hewt hebî beranê cê est ê. Berananê xo beno çerênenô. Şand deyeno, o yeno kê, beranî nînê. Wurzeno şino; geyreno, geyreno, ayneno beranî biyê vinî. Şino geyreno geyreno vano beranî dizdan berdê. Şino cêk cenekek ví-neno. Cenêke ra berananê xo perseno. Cenek vana:

- Berananê to filan kê berdo, ma dî hewt hebî beranî teder bî.

Vano:

- Ez seyîn ca bikerî?

Cenek vana:

- Şo verê beyrê cê, te ra vac beranê mi to berdê, bid.

Mêrik şino. Şino wayirê kê vîneno. Vano:

- Beranê mi to berdê, bid.

O vano:

- Mi néberdê.

Mêrik vano:

- Mi dî, to berdê.

O vano:

- Mi néberdê.

Mêrik vano:

- De bê sond biwan.

O vano:

- Temam, ez to rê sond wanena.

Mêrik vano:

- Bê sond biwan, ez to ra bawer bikerî.

O vano:

- Ez sond wanena, ti gere eno sondê mi ra bawer bikerî.

Mêrik vano:

- Temam, ez misliman niya la ez o bawer bikerî.

O vano:

- Bi tewir, bi bibir, bi mishebê ser-kewir, xenimê mera nelivir, tifingkî wala li mi keve, merkî mirî li mi vede carkî beranê te nebirime, nexwârime. Mêrik te ra vano:

- To berdê, pewtê, werdê. To kerdo qelî(qawirme).

Mêrik ranê sond waneno. Oyk bawer keno, şino. Şino ranê a cenek vineno. Cenek vana:

- To çîrê beranî néardê?

Mêrik vano:

- Mêrik sond wend, mi bawer kerd.

Cenek vana:

- To ra va se?

Vano mi ra va:

- Bi tewir, bi bibir, bi mishebê ser-kewir, xenimê mera nelivir, tifigkî wala li mi keve, merkî mirî li mi vede carkî beranê te nebirime, nexwârime.

Vana:

- La ê sondî, sondî bî to rê wendê?

Vano:

- Ye, la sondî bî, sondî henî seyîn bê?

Vana:

- Merkî mirî maro merdo û seyîn ceneno merdimî. Tifing veng bo seyîn gûneno merdimî? To çîrê son-danê cé ver vintertî?

Vano:

- Wala sond wend, mi bawer kerd û ez amiya. Henî kê xo de nişeno ro, fek te ra verdeno.

**Arêkerdoxe:** Zehra GULTEKİN

**Vatoxe:** Naîma ALTÜN


**Serrê aye:** 67

**Ca:** Kû/Pasor/AMED

**Serre:** 2015



# Şah İsmail



Berhevkar  
Feratê DENGİZÎ

Çavkanî: Pîra ASÊ Herêm: Dengiza/Stewr/Mardin Sal: 1997

Zeyn A.

Hebû, tune bû. Ji erd û asîman pê ve tiştek tune bû. Pê re dinya tije benâdem bû. Hebû padışakî kordunde. Emrê wî pir mezin, lê bê zar û zêç. Ji xwe re ji bo bibe xwedî ewladekî li tixtor û dermanan digeriya. Rojekê li baxçeyê xwe, li bin siya darekê rûniştî li hale xwe difikirî û liberketî bû. Ji nedîti ve sofiyek li ber peyda bû, rihsî, por weke pembo...Sêvek da padışê û gotê:

- Vê sêvê bike du felqan. Nîvî tu, nîvî dinê jî bila xanima te bixwe! Qaşikê wê jî bide hespa xwe! Wê Xwedê miradê te bike, lê ku zarok ji te re çêbû, bêyî min nav lê meke.

Ü wenda bû.

Padışa ecêb ma, lê gotin tev bi cih anîn. Zeman derbas bû, wehde hat, wehdê Xwedê. Xwedê lawek da padışê û cenûyek hespa wî jî çêbû. Lawik mezin dibe. Xoce jê re girtin. Perwerde dît; perwerdeya ziman, edeb, şûr û mertal, rim û tîr û kevan... Lawik bû xort, emir jî panzdeh salî... Sofî nehat, law jî bênav. Padışê miletê xwe da hev, xwarinek mezin danî û got ez ê nav li lawê xwe deynim. Dî gurmîna şâhiyê de Sofî got, "Selam û elékim!" Dilê padışê jê mabû, bi mirûzî gotê, "Tu li ku mayî heyra!" Sofî bi ken, kin birî:

- Navê lawik Şah Îsmâîl û navê cenûya wî jî Qemertay! Ü dîsa wenda bû. Zeman ava ji kîsê xwezayê ye, diherike, derbas dibe. Rojekê Şah Îsmâîl ji xocê xwe re dibêje:

- Destûrê jî bavê min bistîne, ez ê herim nêçirê, seydê. Bav destûrê dide. Şah Îsmâîl bi gelek nêçirvanan re derdi keve nêçirê. Şertê xwe jî datîne; "nêçirî di ber kê re derbas bibe bireve, ez ê serê wan jê kim." Adeteke kevn e li welatê me. Nêçîra bi piranî wiha li dar dikeve; neçirvan dîbin xelekeke dorfireh û dîkin qêrîn, deng pir derdixin(jî vê adetê re, ilîm jî dema ku berf li erdê gelek be, dibêjin; héle). Ji hay û wayê nêçir radibe û dibeze. Mêrê çê wê wextê dertê holê û nêçirê bi saxî zeft dike. Heya bêgotineke wan jî heye, dibêjin "Kî berde, dê bi derd e." Wê rojê sihûda wan li cî ye, xezalek radibe. Her kes ji tîrsa rîhê xwe dike qêrîn û gazî. Xezal di ber lingê hespa Şah Îsmâîl re derbas dibe û direve. Şah Îsmâîl jî weke teyrê baz li dû... Ha vê derê, ha wê derê, dûr, nêzîk, xezal dikeve bin konekî. Pîrekeke yextiyar ji bin kon dertê.

- Lawê min tu cî dixwazî?

- Ez nêçirvan im, pîrê, xezala min ket bin konê te!

- Na lawê min, ew ne xezal e. Qîza min Gülicher e. Gülicher,

Gülicher were derive.

Bî bangâ pîrê, Gülicher tê derive. Gava herdu hevdu dibînin, ne bi dilekî, bi heft dilan dilê wan dikeve hev Û Şah Îsmâîl gêj dibe, dinya li dora wî digere û dibê "rep" û dikeve erdê. Hinek av li ser çavên wî dîkin. Hişê wî tê serê wî. Dipeyîvin û hungulîskên xwe bi hev diguherînin. Şah Îsmâîl dibêje:

- Tu miraq neke, ez ê te ji bavê te bixwazim, li gorî adeta dinê.

Û vedigere malê. Çend rojan xwarinê naxwe, weke gêjan dimîne. Xoceyê wî li halê wî dipirse, ew jî dibêje hal û mesela min ev e û di dawiya peyva xwe de dibêje:

- Bila bavê min, Gülichera qîza Şahê Ereba ji min re bixwaze.

Xoce meselê ji padışê re dibêje. Padışa du kesan dişîne cem Şahê Ereba, wî diezimîne seraya xwe û qîza wî kurê xwe re dixwaze. Ew jî qebûl dike û dibêje:

- Hûn dest bi dawetê bikin. Piştî cil şev û cil rojê din werin bûka xwe bibin.

Û çawa vedigere malê, hema konê reş î erebî bar dike û tu li ku, bajarekî dinê li ku! Li wir Gülicher dide kurê birê xwe û dawetekê dinê li dar dixe. Gülicher qebûl nake. Şûşa jehrê li ber xwe datîne û dibêje; "Ku hûn ber bi min de werin ez ê jehrê vexwim!"

Em vegeerin Şah Îsmâîl, haya wî jî bayê felekê tune ye, daweta wî jî her didome. Çil roj û cil şev diqede. Berborî<sup>(1)</sup> têñ ba konê Şahê Ereba, konê ci halê çi! Ne kon li dewsa xwe ne û ne jî Gülicher. Bayekî gur tê û dewsa kon tevíhev... Şah Îsmâîl tê, wan deran qontrol dike. Kuçikê agir ê dewsa konê bavê Gülicher diqulibîne. Dinêre kaxizek bi nîvîs, nameyek... Gülicher nîvîsiye. Em diherin filan bajarî û ez li hêviya te me, ku tu min bixwazî were. Şah Îsmâîl û berborîyen xwe vedigerin malê. Şah Îsmâîl çekîn xwe girêdide û destûrê jî bavê xwe dixwaze. Padışa destûrê nade. Her çar deriyêen bajarê xwe digire, nobedaran li ber datîne, lê Şah Îsmâîl qerara xwe daye, li Qemertay siwar e, ji lingan heya serî, tev xwe bi çekan xemilandîye. Ji ber deriyekî vedikişê û teví hespê xwe, xwe li wî deriyî dixe, derî dişkene. Ji bajarê xwe dertê. Berê xwe dide oxirê û pişta xwe dide felekê... Dûr dihere, nêzîk dihere, li quesrek gilover rast tê. Qesrek weke héka spî û gilover. Derî û pacân wê jî tune ne. Şah Îsmâîl qozîyeke qesrê xera dike, dinêre ku qîzikeke xweşîk bi tena serê xwe lê rûniştî û çav bi girî ye. Şah Îsmâîl dibêje:

(1) Berbû/berbük

- Çima tu digiri?

Qîzikê got:

- Ez negirîm wê kî bigirî.

Û domand:

- Heft birayê min çûne şerê hûtan, didu mirine. Pênc jî di tengahiyê de ne û tiştek ji destê min nayê. Wê kî here hawara wan?

Şah Îsmâil dibê tu rê nîşanî min bide, Xwedê mezin e, ka ku ci bibe? Qîzik rê nîşan didê û ew jî dimeşe. Dûr, nêzîk, dibîne ku şerê hûtan û pênc bira... Westiyane, bêhna xwe vedidin. Şah Îsmâil difikire, dibêje ez alîkarî wan bikim ew ê bêjîn ev siwar ji me tirsîya. A rast ew e ku ez ê silava Xwedê bidim, kê bersiv da, silava min ve-gerand ez ê alîkariya wan bikim. Silav dide, pênc bira si-lava wî vedigerînin. Şah Îsmâil ji wan re dibêje:

- Hûn bisekinin, ka hûn rûnên, îcar jî dora min e.

Serê Qemertay berdide û dikeve meydana herbê, dikeve qada şer. Gelek hûtan dikuje, serê wan dirifîne, xwîn laşa dajo, herbê qezenc dike. Hûtan qîr dike. Ew û pênc bira vedigerin quesra wan û wek hêkê. Bira dinêrin qozî-keke quesra wan hilweşîyaye, xera bûye, ditîrsin. Şah Îsmâil dibêje:

- Netîrsin, min werê kiriye.

Çend rojan mîvanê wan dimîne. Ew jî dibêñ em ê xweha xwe bidin te, li te mahr bikin. Ew qebûl nake. Di-bêje:

- Ez sozdarê Gulîzera qîza Şahê Ereba me. Kengî min ew anî, bi wî sozî ez ê xweha we jî bi emrê Xwedê bix-wazim. De ka bi destûra we, riya filan bajarî rê min bidin.

Wî dibin serê du riyan. Dibêjin:

- Riyek a çûnûhatinê ye ya dinê jî ya çûnûnehatinê ye.

Şah Îsmâil berê xwe dide ya diduya, ya çûnûnehatinê. De bê ka ci li pêşiyê ye. Qederekê dimeşe. Ez bêjîm şes roj, hûn bibêjin panzdeh roj, meşîya... Rastî mîrgekê hat. Serê Qemertay berdide mîrgê, wê diçêrîne û ew jî diçe bin siya darekê. Demek kin dirêj derbas dibe. Xwedîyê mîrgê tê. Bi awazê meydanê dixwîne, qaqibo dike:

- Lo! Lo! Ev kî ye? Ma ev mîrga bavê te ye, tu hespa xwe lê diçêrînî? Ev sedema şer e.

Şah Îsmâil bersiv dide:

- Kafirbav, çêra meke, xebera nede! Were meydanê ka bê wê Xwedê bide kê?

Herdu xwe dikişînin hespa. Siwar dibin, şûr û mertalan xwe dikişînin û êrîşî hev dikin, weke gurên har. Heya

nîvro li ser hespa şer dikin. Şerê şûr û mertalan, şerê gurzan, ê riman... Kes bi ser kesî naxe. Piştî nîvro bi navê dilîzin. Heya ber êvarê. Dawiyê Şah Îsmâil diqîre. Xwedîyê mîrgê bilind dike û li erdê dixe, dikeve ser dilê wî, xencerê dide qırıkê. Xwediyê mîrgê zûka sînga xwe ve-dike. Şah Îsmâil dinêre ku ya bin pîrek e. Şah Îsmâil di-bêje:

- Wey xwêlî li serê min be. Ji sibehê heyâ vê êvarê min bi kevneke jînê re şer dikir. Çawa ez Şah Îsmâil bim û pî-rekek wiha li ber min bisekine. Û radibe, xencerâ xwe dixe kalanê wê. Xwediya mîrgê dibêje:

- Çavê xwe veke. Ez jî ne hindik im. Ez Perî me. Qîza Ristemê Zal im. Tu vê quesra hanê dibînî? Min ji serê kurê bavan, ji serê egitêne weke te lê kiriye. Tu dilê xwe bi xwe neşewitîne.

Şah Îsmâil dibe mîvanê Periyê. Qederekê li balê dimîne. Dawiyê xatir dixwaze.

Perî dibêje:

- Min ahd kiriye, kî di şer de bi min bikaribe ez ê pê re bizewicim. Ez helaliya te me.

Şah Îsmâil bersiv dide:

- Ez sozdarê Gulîzera qîza Şahê Ereba me. Heya ez wê neynim, ez nazewicim, zewac li min heram e.

Îzna xwe ducar dike û rê jê dipirse.

Perî:

- Tu li wî bajarî kesî nas dikî?

Ew dibêje:

- Na.

Perî dibêje:

- Wiha nabe. Ez te bi tenê bernadim. Ez ê bi te re werim.

Şah Îsmâil qebûl dike. Bi hev re dikevin rê. Ha li vir ha li wir, digîhêن bajarê Şahê Ereba.

Perî dibêje:

- Em herin ku?

Şah Îsmâil:

- Em ê serê Qemertay berdin, ew serê xwe li deriyê kê bixe, em mîvanê wî ne.

Qederekê li nava bajêr digerin. Qemertay kuça tevlihev dike, diçe li ber deriyê xaniyekî xerabe disekine û serê xwe li derî dixe. Mal a pîrikeke yextiyar û bêkes e.

Şah Îsmâil dipirse:

- Pîrê! Ma tu mîvanan dihewînî?

- Kurê min, welehi ciyê min tune ye.

Şah Îsmâîl zêrekî didiyê. Pîrê wan bi mîvanî qebûl dike. Cî ji wan re çê dike. Rûdinên. Gurmîniya dengê defê ye. Dengê dawetê bajêr hiltîne.

Şah Îsmâîl dipirse:

- Pîrê! Ev dengê daweta kê ye?

- Ev dengê daweta Gülichera qîza Şahê Ereba ye. Dane pismamê wê, lê ew pismamê xwe qebûl nake. Şûşa jehrê li ber xwe daniye, dibêje ku hûn nêzîkî min bibin ez ê jehrê vexwim. Niha rewş wiha ye û ew ê bi zorê wê bikin bûk.

Şah Îsmâîl, dibê:

- Pîrê ji te re zêrekî û here sükê satilek mast bikire.

Pîrê satila mast tîne, Şah Îsmâîl hungulîska xwe dixe nav tasek mast, dide pîrê. Dibêje bibe ji Gülicherê re, yan bila mast bixwe yan jî tiliya xwe di nav mast de bigerîne. Pîrê weke wî dike. Gülicher rewsê fêm dike. Ji pîrê dipirse:

- Xwedîyê hungulîskê li ku ye?

- Li mala min e.

- Bêjiyê, bila îşev xwe bigihîne min.

- Baş e.

Pîrê tê cem Şah Îsmâîl, weziyetê dide fêmkirin. Şah Îsmâîl zêrekî dinê dide pîrê, dibêje:

- Here ji sükê qatik cilê pîrekan ji min re bikire.

Pîrê cilan dikire. Şah Îsmâîl dibêje:

- Pîrê, here bibêje bila Gülicher zewacê qebûl bike.

Bavê Gülicherê jî ilam kiriye ku kî qîza wî ji bo zewacê qanîh bike ew ê barek zér bidê. Pîrê xebera Şah Îsmâîl digihîne Gülicherê û barek zérê xwe distine. Şah Îsmâîl cilêن pîrekan li xwe dike û dikeve nav berbûriyên bûkê û dikeve oda bûkê, binê sedirê. Şev digere, berbûrî belav dibin, zava tê oda bûkê. Ji Gülicherê tasek av dixwaze. Gülicher avê tîne, zava heya Xwedê dayê bi şid şiqamekê li Gülicherê dixe, Gülicher dibêje:

- Wey mîro!.. Bi hesreta ku riya dûr nêzîk bûye, tu bi derba Şah Îsmâîl herî!

Bi wê gotinê Şah Îsmâîl ji bin sedirê dertê, şûr li serê zavê dixe difirîne û bi destê Gülicherê digire dertê derve. Perî, tevîlî hespan li pişt xêni li hêviya wan e. Bi ser hespan dikevin û di nav şevê de berê xwe didin welatê xwe. Lingo bi qurban. Qederekê diherin, dibetilin, xewa wan tê. Perî nobedar dimîne û Şah Îsmâîl serê xwe datîne ser çoka Gülicherê û serî dixe xewê. Demek derbas dibe,

leşkerên bavê Gülicherê bi dû wan ketine, digihêن wan. Perî bi tenê bi wan re dikeve şer. Gelek leşkeran dikuje, herb dirêj dibe. Gülicherê digirî, hêstirên wê dikevin ser rûyê Şah Îsmâîl û ew bi xwe dihese. Dinêre ku ci ferman e! Zûka bi ser Qemertay dikeve û êrîş dike. Gelek leşkeran dikujiñ. Paşê leşkeren bavê Gülicherê qada şer dihêlin û direvin. Ew jî dikevin rû têن qonaxa Periyê, qederekê jî li wir dimînin, paşê têñ ba her pênc bira û xweha wan jî bi xwe re radikin û têne bajarê Şah Îsmâîl. Berî ku têkevin nav bajêr, Şah Îsmâîl xeberê ji bavê xwe re dişîne, dibêje:

- Bila bê hersê bûkêñ xwe bibîne.

Bavê wî tê pêşîya wan, kurê xwe himbêz dike, pîroz dike û qesrekê ji wan re hazır dike, di pey re diya Şah Îsmâîl jî diçê bûkêñ xwe dibîne û tê ji padışê, ji bavê Şah Îsmâîl re dibêje:

- Weleb bûkêñ me zaf xweşik in, enceç liyaqî te ne!

Dilê padışê xera dibe, kurê xwe Şah Îsmâîl teslimî celad dike, dibêje:

- Bibe deriveyî bajêr wî bikuje û cilêñ wî yên bixwîn ji min re bîne.

Li deriveyî bajêr Şah Îsmâîl ji celad re dibêje:

- Tu yê çîma min bikujî? Hey bavê min fahş bûye, xurifiye, li min hatîye xezebê! A ji te re çend zér, hînek teyr û teba bikuje, xwîna wan li cilê min bixe û bibe ji bavê min re.

Celad qebûl dike, çend teba û hînek heywanan jî dikuje. Xwîna wan di kurtikê Şah Îsmâîl dide, kurtik bi xwe re hiltîne, lê çavê Şah Îsmâîl jî ji serê wî derdixe. Çavê rastê dixe berîka wî ya çepê, çavê wî yî çepê jî dixe berîka wî ya rastê û wî datîne bin darekê û dere. Wexta ku hêvi nemire, rih ji bedenê derneyê, cardin jî têñ. Çîma du kevok nayêñ ser wê darê! Ü bi hev re dipeyîvin:

- Tu dizanî çawa çavêñ vî însanî rihet dibe?

- Çawa?

- Niha em ê bifirin. Wê du heb perikên me bikevin. Ev însan rahêje periyekî me di dewsâ çavê rastê bide û çav ji berîka xwe ya çepê derxe, perê di wî jî bide û çav têxe dewsê. Periyêñ din jî di dewsâ çavê çepê bide û çav ji berîka rastê derxe û perî tê bide û têxe dewsê. Ew ê her du çavêñ wî jî spîsax bibin.

Wiha dibêjin û dirifir. Ew jî qismet e. Şah Îsmâîl zimanê wan fêm dike û kevokê çawa gotiye werê dike; çav spîsax! Berê xwe dide bajarê bav.

Em vejerin bajêr. Bavê Şah Îsmail xeberê ji hersê bûkên xwe re dişîne. Dibê; "hûn bi min re dizewicin, bizewicin. An na ez ê we hersêyan jî bikujim." Hersê jî qebûl nakin û qîza Ristemê Zal, Perî herbê li dar dixe. Qederekê şer dike, gelek leşkerên bavê Şah Îsmail dikuje. Di vê xirecirê de Şah Îsmail tê bajarê bavê xwe û dibe rîncberê axayekî dewlemend. Rojekê rîncber ji axayê xwe dipirse:

- Gelo ev çî şer e?

Axa dibêje:

- Ev şerê bavê Şah Îsmail û bûkên wî ne. Meselê ji şerî heya binî jê re dibêje:

- Lawo, wele vî şerî em qelandin. Hersê bûk dibêjin "Em dimirin û gotina padîşê qebûl nakin." Perî insanê me tev kuştin. Serê malê em egidekî dişînin şer û kî dihere venagere! Rîncber dibêje:

- Ez ê herim şerê Perî.

Hespekî û şûrekî jê re tînin. Ji sibehê heya nîvro şer dikin. Nîvro her kes dihere malê. Perî jî tê û ji Gülicherê re dibêje:

- Îro yekî çavseqet hatiye şerê min. Derbêñ wî weke yê Şah Îsmail in.

Gülicher remlê davêje û dibêje:

- Eman! Tu wî nekuji, ew Şah Îsmail e.

Ji nîvro pê ve şer dîsa dest pê dike. Herkes dibêje wê rîncber Perî bikuje. Di bêhnvedana nîvro de rîncber hesp û şûrê Şah Îsmail dixwaze û dibêje:

- Ez ê Periyê sax bigirim.

Padîşa dibêje:

- Kesî heya niha bi Periyê re ewqas dirêj şer nekiribû. Padîşê hêviya xwe bi rîncber ve girêdaye. Di şerê piştî nîvro de rewş wiha dibe; Perî û rîncber çend derba dâvêjin hev û meselê bi hev didin fêmkirin. Rîncber yanî Şah Îsmail, bi dizî di guhê Perî de dibêje:

- Ez ê te sax bigirim. Bibim ba bavê xwe. Ew ê li dora te here were û bibêje; "te gelek leşkerê min kuştine, çi mîsteheqî te ye?" Û wê çaxê tê şerê wî bifirînî.

Perî qebûl dike. Hinekî din şer dikin û rîncber wê sax digire û dibe quesra padîşê. Wek ku gotibûn, Şah Îsmail şûr dide Periyê û Perî şerê padîşayê bêbext û bêûjdan difirîne. Şah Îsmail li dewsê dibe padîşê. Jiyaneke xweş ji nû de ava dikin.

Li hawir kulîlk vebûn av çû dara,  
Silav dan payiz û bîharan,  
Ew gîhan meqsed û qirara,  
Rîhme li dê û bavê guhdaran,  
Ew gîhan miradê xwe  
De ka em herin malêñ xwe.



# KAYÊ ÇÜNCUWAYÎ



**Arêkerdox:** Deniz MAYA

**Çime:** Mehmet MAYA

**Serrê aye:** 58

**Perwerdeyî:** Wende

**Herêm:** Hêni/Amed

Pê yew çonç, yew çuwa û pê di heb kerrayan  
kay beno.

Çonç: Nizdî vîst û ponc-hîris cm o. Wurd kiştê  
ey tuj kerde yo, hezey tîr.

Çuwa: Çuwa zî nizdî yew mêtro ya, biney çonçî  
ra qalinêr a.

Eno kay en toy pê di tenan kay beno, la  
çehêr-ponc ten zî bibî pê kay beno û hîna weş  
kay beno.

Hêl: Cayo ke di heb kerra ronîyeno, nameyê  
ucayî yo.

Agoney: Des-dades mêtro hêlî ra wet, cayo  
ke kê çonç vera vindenî. Armancê agoneyî  
çonç hawa ra tepiştîş yan zî kê hawa ra nête-  
pişt çonç ginêra erdî rê kê çonç erdî ra gêni û  
zereyê hêlî de kê donî çuwayî rê.

**Kay Senîwa Kay Beno?**

Kê di heb kerrayan hendeyê dergoneyê çonçî  
yewbînanî ra dûr ronenî û çonçê xo ser ronenî,  
çuwayê xo dekenî binê çonçî ra û erzenî  
qayme çuwa donî piro hetanî ke quwet kê est  
o, kê çonç erzenî dûr. O ke ha agoneyî de yo.  
Çonç hawa ra tepşeno. Eşka hawa ra tepiş, kê  
şinî agoney, ê zî yenî hêl(Yan zî o ke hawa ra  
tepişeno). Eger nêeşka hawa ra tepiş çonç  
erdî ra gêno, kê zî çuwayê xo mîyon kerraya  
hêlî de ronenî.

Agoney çonç gêno, mîyonê hêlî de verdeno  
çuwayî rê eger çonç mîyon hêlî de gina çuwayî  
rê reyna kê pis benî(pisbiyayîş) şinî agoney, ê  
zî yenî hêl.

Eno qayde tim dewr beno, kayê kê dewam  
keno. Hetanî ke, kê betaşiyayî yan zî kê ey ra  
aciz bibî kê kay kenî.

Bal: Eno kay hetê Pîranî de zî kay beno ucayî  
de nameyê ey Çemçikçuwa yo.

# DAMİRÎ

Caye bi caye činîbî. Di gedeyî seyê estî bî û damîrî yini raheş nêkardinê. Weleyê adîrî pewtinê danî sey û gedeyonê xo rê zî non pewtinê. Inê seyê wextî xo no zafinê gewi de viyarnenî.

Yew roj hinê néşinî xo tepişê û weyşaneyî ra(ğistê) ber-menî, ay wext zerey monga yinê rê heli-na(veşena) vona: "Şîma cirê bermenî?" Vonê: "Hal û mesala ina wa yo damîrîya ma, ma rê rind nîya û ma ra hes nêkena. Gedeyonê xo rê non pewcena la ma rê weley adîrê pewcena inê semedî ra ma zaf weyşonî." Monga vona: "Mebermî! Bêrê inê qapaxî hewanî(biwedernî) zere de tewir tewir wer esto, çewî ra mevacî, bigirê borê, xo mird bikê." Gedeyî seyê xo mird kenî, qapaxê sar nenî ke wa kes nêveyno.

Damîrê ewnina ke gedeyî seyê roj bi roj viraziyenê, benî rindek û gedeyê aye zî her roj peyser şonê ay semedî ra hinê non pewcena, dana seyû û wele zi pewcena dana gedeyonê xo. Ewnina ke nêbeno hema ra zî gedeyê yay apey şonê(şehtini). Şik dekûwena zereyê damîrê, fikri-yena û vona: "Inê gûre de yew çewteyê esta. Ez her çî pewcena dana gedeyonî xo la gedeyî mi her roj şehtinî, bêrûçik benî. Cirê ina-wa beno?"


Yew rojê kenaya xo zî seyanê dima erşawena gawanê, vona: "Keynaya mi hey şo biewnî inê seyê gewi de se kenê? Ci wenî sekenê?" Keyna vateyê maya xo kena û seyonê dima şona gew û yine ra ewnina keyneke eke seyê gewi de yew qepaxî wedernenî(hewanenî) wer wenî. Yena keye vana; "dayê, hal û mesal inawa yo." Damîrê bûnder bena ke înanê gewi de ci wenî. Yew roj xo zûrî ra néweş finena. Vona: "Mi hewn diyo ke, eke goyna monga mi ra bisawa ez ay wext weş bena." Inê semedî ra ma gonî monga sere birnî. Ti ra pey seyê şonî monga het vonî; hal û mesala inawa yo. Damîrê, to sere birnena û barmenî. Monga vona: "Mebermî! Ez goştê xo yini rê tal, şîma rê şîrin kena. Şîma mirdeyê xo goştî borênenî. Kateyonê mi zî berêni filan ca de dekinê binê herî. Kom wexti ke çewres roj viyart katteyî mi şîma rê benî qût û qûmaş. Şîma mîrda xo cilonê piray girinê, ti ra pey şîma wazeni şêrê kam ca şêrêni."


**Çime:** İbrahim BİRTANE

**Serrê aye:** 60

**Herêm:** Kormîg/Pîran/Amed

**Serre:** 2013





## BIRAYO AQIL Û BIRAYO DELÛ

Arêkerdox  
Zerweş ESNAW

Di birayî estî bî. Yew aqil bi yew delû bi û yew zî maya jin ê extîyar bî. Birayo aqil wur roj şono manga ver. Yew roj birayo delû ra vano;

- Eyro zî ti şo manga ver.

Birayo delû ay roj manga girewt şî yabani. Mangayı pabeyê yew zinarî vera day. Û vano;

- Zinar!

Seba ki veng yeno tepe zinar zî vano; zinar! (Semedo ke veng tepe yeno delû vano qey zinar ey reyde qâlî keno.) Delû vano;

- Manga pabeyê to ya.

Mangayı pabeyê zinarî vera da ame keye. Birayo aqil vano;

- To manga se kerdi?

Vano;

- Min pabeyê zinarî vera da.

Birayo aqilî zî vano;

- La kutikî biwerî?

Delû vano;

- Seki biwerî ez heqê xo kutikan ra gêna. Delû şono ki kutikan manga werda. Û serebê kutikan ser neno. Yew mîrdeek vano;

- Ay çi yo law law, ay çi yo?

Delû vano;

- Kutikan mangaya min werda ez heqê xo kutikan ra gêna.


Mîrdeek lajekê delûyî ra vano;

- Qamişê kutikan mebi ez cirmê to dena. Delû pereyanê xo gêno şono keye. Birayê jey vano;

- To kure ra inê pereyî ardî?

Delû vano;

- Kutikan mangaya ma werda ez şîya min zinarî ra heqê



xo girewto.

Birayo aqil vano;

-To senî hawa pereyî girewtî?

Vano; min da piro, da piro Zinar zî pereyî min rê vistî.

Birayo aqil delûyî ra vano;

-Birayê min eyro ti marda ma het bimani, marda ma  
geyta biki. Ez wur roj maya ma şuwena, ti zî eyro bi-  
şuwi. Birayo aqil şono cayna, yeno ki delû awa keldaya  
maya xo ra kerda, maya jînî merda. Û cili mîyanî naya,  
xiyari taş kerda ja fekenaya. Aqil vano;

-Birayê min to eyro se kerd?

Delû vano;

-Min eyro ja şito hanike cil de ya, xiyar wena.

Birayo aqil şono ki vîneno delû ja kişta, cili mîyanî naya.  
Vano;

-Birayê min to maya ma kişta.

Aqil vano;

-Birayê min ez şona tirbi kenena ti zî berî veji maya ma  
ser ni, biyeri ma dekî tirbi û ma şîrî. Delû berî vejeno  
maya xo berî ser neno, xo dima kaş keno, tikê ca şono  
xo ra pey ewnîyeno maya jey berî ser ro çinî ya. Tadî-  
yeno şono yew pîrika şarî rayîri de şona. Deno piro ja  
kişeno, berî ser neno, beno mezel. Birayo aqil ewnîyeno,  
vano;

-Bêmirad to pîrika şarî kişta.

Delû vano;

-Ez ewnîyaya maya ma berî ser ra remaya ki şona. Min  
ja kişt berî ser na ardi.

Û aqil vano;

-Biyari, hema lezi ma dekî tirbi, wa yew ma nêvîno, ma  
biremî. Û berê xo gênî remenî, ay dewe ra şonî. Şonî  
şonî şewi bena û serd bena. Û berê xo zî gênî şonî dari  
ser. Şewi tayê mîrdimî yenî binê dari. Nê kerwan î. Inê  
xo rê şamî hedirnenî û ronişenî. Hêdikî biwerî eno bê-  
mirado. Delû vano;

-Birayê min gîyê min yeno willa.

Aqil vano;

-Birayê min şar binê ma de yo, gîyê xo meki.

Delû vano;

-Willa ez kena. Vano; Tir tir tir keno.

Kerwanî ewnîyenî vanî; panka ya, voyri(vevre) varena.  
Nara delû vano;

-Mîza min yena, ez nara mîza xo kena. Şir şir mîza xo  
keno.

Kerwanî vanî; Wîî panka ya, varan vareno. Delû vano;

-Ez na ray berî vera dena. Berî vera deno.

Ber vano;

-Req req kuweno. Kerwan remeno. Delû xo anceno  
şamî ser şamîya kerwanî weno, xo mird keno. Kerwanî  
tedi têdima kewtî remayı. Ayenan(finan) ra yew cesare-  
tin o, tadîyeno yeno, vîno ki ay çi kewto. Lajeko delû zi-  
wanê ay kerwanî dera keno û hêdî kerwan remeno  
şono, vano; Lel lel lel. Û pêro têreyde tersenî remenî ina  
ray. Birayo aqil vano;

-Birayê bê ma xo rê şêrî cayêkî de şîwaneyî bikî. Şonî  
yew axayî heti. Şonî pesdê axayî ver. Birayo aqil wur roj  
wur roj şono pesî ver. No delû zî rojeki şono pesî ver,  
hemînî kişeno dekeno axûrî. Yew kel maneno, yew ew-  
rişî keli ver di besteno. Aqil vano;

-Birayê min bê ma biremî. Û şonî axayî ra pereyanê xo  
gênî. Û delû axayî ra vano;

-Min rê vêşî bidi.

Axa vano;

-Qey?

Vano;

-Min di hebî, di hebî leşî wegirewtî.

Axa vano;

-Qey ci di hebî di hebî leşî?

Birayo aqil vano;

-Ma ki şîyî rojî ver ê di hebî di hebî wegirewtî berdî ay  
kişta rojî. Û pereyanê xo gênî şonî şonî yew rojî ver di  
vindenî. Cenîya axayî şona axûrî ra ewnîyena ki pesî  
pêro kişto, visto axûr. Delû rojî ver di ronişeno, xo rê  
qûmî di kay keno, çalikî virazeno. Birayo aqil vano;

-Birayê min biewni wayîrê heywanan yeno kayê xo vera  
di ma biremî.

Delû vano;

-Willa ez qamişê şima nêbena, şima yewbînan bikuwî,  
kam çalikanê min birijno ez ay kişena. Û axa yeno êy û  
birayo aqil pêresenî yewbînan kuwenî kuwenî, birayo  
aqil ewnîyeno ki zorê jey şono axayî nusko deno çalî-  
kanê delûyi ser, çalikê jey rijîyenî. Û delû deno piro axayî  
kişeno. Û birayî wardenî remenî şonî. Ma ra zurî ellayî  
ra raşt.

**Çime:** Şerîfa AKTAY

**Serrê aye:** 54

**Perwerdeyî:** Nêwende

**Herêm:** Basref/Gêl/Amed

**Serre:** 2013

Îro bi bikaranîna teknolojiyê gellek tiştên di demsala havînê û di demsalên din de peyda dîbin bi hêsanî ji bo demsala zivistanê têv veşartin, lê beriya teknolojiyê û hîn niha jî li herêma Licê dîsa metodê berê têv bikaranîn. Beriya teknoloji bikeve gundan gellek amadehî ji bo şert û mercen dijwar ên zivistanê dihatin kirin.



## PÊŞWAZIYA ZIVISTANÊ

Amadekar  
Sevgul ŞAŞMAZ

Îro bi bikaranîna teknolojiyê gellek tiştên di demsala hâvinê û di demsalânen din de peyda dibin bi hêsanî ji bo demsala zivistanê têne veşartin, lê beriya teknolojiyê û hîn niha jî li herêma Licê dîsa metodêner berê têne bikaranîn. Beriya teknolojî bikeve gundan gellek amadehîji bo şert û mercen dijwar ên zivistanê dihatin kirin, ev amadehî di meha payiza ewil de dest pê dikir û heta meha dawî didomiya. Em ê bi vê berhevkarîyê çend ji van amadehiyênen zivistanê yên herêma Licê bi we re par ve bikin.

### Birrîna Şehîreyê

Karê yekemîn birrîna şehîreyê bû. Gava payîz dihat me di meha ewil de dest bi birrîna şehîreyê dikir. Birrîn bi alikariya cîranan dihat kirin. Ji bo ku cîran tev dibûn yek, birrîn dor bi dor dihat kirin. Gava dora me dihat, di serî de me tûrek ardê xwe dianî û diwêt<sup>(1)</sup>. Me her roj teştek hevirê xwe çêdikir. Gava dora me dihat me di nimêja sibê de hevirê xwe çêdikir. Me oberiya<sup>(2)</sup> xwe radixist. Cîranen me yek bi yek pişte nimêjê dihatin. Pêşî destêne xwe dişûştin û destmalênu ku bi cawê hatibû çêkirin bi wan destêne xwe ziwa dikirin û rûdiniştin ber hevîre xwe. Her yekê ji bo ku ciyê xwe diyar bike hinek şehîreyê dibirî û diçû mala xwe ji bo ku taştêya zarokên xwe amade bikin. Demek şûnde dîsa dihatin wê mala ku lê şehîre dihat birrîn. Me dest bi birrîna şehîreyê dikir ji bo ku şehîre bi hev ve nezelîqe me şehîreya xwe radixist heta ku ziwa bibe. Ev karê me sê çar rojan didomiya qasî ku pêdiyiwa wê malê, me şehîre dibirî. Gava me şehîreya xwe dibirî, me ji hev re çîrok an jî meselok vedigotin. Kesênu ku dengênu wan xweş bûn ji me re kilam digotin. Roja dawî ku êdî şehîreya wê malê diqediya xwedîya malê ji bo cîranen xwe yên ku hatine û alikariya wê kîrine ji bo wan danû çêdikir an jî nok şor dikirin. Ev tişt ji bo ku cîranen xwe bi dîlxweşî ji mala xwe bi rê bike dihat kirin. Heta ku şehîreya hemû cîranan biqedîya ev tişt di malan de didomiya.

### Kelandina Genimî

Paşê dor dihat li ser kelandina gênim. Me genimê xwe dikeland ji bo ku savarê çêkin. Di serî de li gor pêdiyiwa malan genim dihat amadekirin ji bo hinek malan welçek angô çar teneke ji bo hinek malan jî du welçek angô heşt teneke genim dihat stendin. Pêşî du kuçik dihat cîkirin sîtilen xwe yên ku me tije av dikir dida ser



kuçikan û agirê xwe pê dixist. Heta ku genimê me bipijiya me genimên xwe dikeland. Gava ku genimên me çêdibûn me cawê xwe dixist nav mekebê<sup>(3)</sup> û dora wî didirût, bi alikariya kevgîra xwe genimên xwe dixist nav mekebê ji bo ku bê nislandin.<sup>(4)</sup> Genimên me heta ku bînisiliya em diçûn li ser xanî me palasên xwe radixistin. Me genimê ku di nav mekebê de nisilibû me dixist nav teştan û dibir li ser xanî radixist. Ên ku di bin mekebê de diman ji me ji bo zarakan dixist nav sêniyeke biçük û me dida ber zarakan. Heta ku genimê me ziwa bibûna li ser xanî dima gava ku ziwa dibû, me dest bi kutandina gênim dikir. Cirna taxê he bû. Mêrên taxê dibûn yek dest bi kutandina gênim dikir. Qasî ku diket di nav cirnê dixistin nav cirnê û bi destiyan dikutand. Heta ku kutandina gênim biqedîya ev car me palasên xwe dibirin li ser xanî radixistin û me bi bêjingê li ba dikir ku sivilen<sup>(5)</sup> wî der kevin. Genim êdî ji bo hêrandinê amade dibû. Destara taxê jî he bû. Dîsa cîran dibûn yek û dest bi hêrandina gênim dikirin. Heta ku genimê me biqedîya dihat hêrandin. Ev car, dor dihat ji hev cudakirina savarê. Me bi bêjingan savarê xwe ji hev cuda dikir. Savara gir, savara navîn ji bo qisirê, hûrikên kufteyan û teftî<sup>(6)</sup> ji hev dihat cudakirin. Tûrên me yên caw he bûn. Me savarên ku cuda kiribûn yek bi yek dixist nav tûrên xwe. Karêne me yên çekirina savarê jî wisa diqedîya.

### Çûyîna Ser Rezan

Karekî me yê dora din jî çûyîna ser rezan bûn. Beriya çû-

(1) Moxilkirin.

(2) Cawê mezin ê spî ê ku li ser şehîre tê birrîn.

(3) Alava ku ji sîvîn zirav ên ter ji bo parastina nan û xwarinê tê çêkirin. Sepeta pîrikan.

(4) Nizilandin.

(5) Qasîlén genimî

(6) Cureyeke danî.



yîna ser rezan em diçûn gûzên xwe diweşandin. Em deh rojan di nav weşandina gûzan de diman. Me gûzên xwe dianin malê û me gûzên xwe radixistin ji bo ku ziwa bibin. Gava gûzên me ziwa dibûn me dest bi şikandina gûzan dikir. Gava şikandina gûzan diqediya me hinek av lê direşand ji bo ku nerm bibin û di dema bendvekirinê de neşkén. Me gûzên xwe bend ve dikirin. Gava bendvekirin diqediya êdî em diçûn ser rezan. Pêşî em diçûn nav bûtikê û me bûtika xwe paqîj dikir. Bûtik ciyê ku mirov gava diçûn ser rezan alavê xwe di nav de dihewandin e. Me nîvîn û firaqên xwe dibirin û li wir bi cî dikirin. Me mehsereye xwe dişûşt. Em êdî amade bûn ji bo civandina tirî. Me bi mehsekên<sup>(7)</sup> büyük tirî ji meşêlan jê dikirin û dixistin nav selekan an jî tenekeyan û me vala dikirin nav mehsereyê, heta ku mehsere tije dibûn ev kar didomiya. Di bin mehsereyê de cirnek he bû, di bin wî de jî çirikek he bû. Ji bo ku gava tirî bîhata ecican din şîre bê li wir. Ji malbatê yek diçû diket nav mehsereyê bi lingan tirî dieciqandin. Gava ku dieciqand şîre diherikîn nav cirnî. Di wê demê de hinekîn din jî kuçika xwe amade dikir, sîtila xwe dida ser kuçikê û agirê xwe pê dixist. Me bi tasa şîreya ku herikîbû nav cirnî, dixist nav tenekeyan û dibir, dixist nav sîtila ser êgir. Heta ku sîtila me tije bibe. Kevirê şîreyê he bû ji bo ku şîre kef bide. Me ev kevir jî dixist nav şîreyê û em li benda kefa şîreyê disekinîn gava ku kefa wî dihat me kefa wî digirt. Ev car me du teşt dianin şîreya xwe dixist nav teştan û me herîra xwe dixist nav şîreyê. Herîr arvan e. Ew şîre-

yên ku di nav teştan de bûn me dîsa dixistin nav sîtilan. Êdî ji bo meşlûlan<sup>(8)</sup> şîreya me amade dibû. Me şîrîtek di nav rezan de girêdida û me yek bi yek ew gûzên ku me bi benve kiribûn dixistin nav 'esîtê<sup>(9)</sup>. Çend qor me gûz dixistin nav 'esîtê ku meşlûlen me xweş 'esîta xwe bigirin, me yek bi yek meşlûlen xwe dadılıqandin. Ji bo ku zarok jî kêfxweş bibin me ji wan re jî ji şaxên darên bîhîvan lepik çedîkir. Me şax dixistin nav 'esîtê û derdi-xist her peşkên darê 'esît digirt û me dida zarakan kêfa wan jê re gellek dihat. Me ji bo ku kêfa zarakan bê ji wan re bi gûzan xirxar jî çedîkir. Me gûz dianin di nav teştekê de dixistin nav avê heta ku nerm bîbe gava ku nerm dibû me bizmerek dixist nav û me bi çakûcê qul dikir, gava ku qul dibû me dianî ew gûz benve dikirin, ev xirxar li gor qama zarakan dihat çekirin. Ji bo ku zarok bixin stûyê xwe. Ew 'esîta ku di bin sîtilê de dima, me ew jî dikir bastêq. Ji bo bastêqan çarşefen me yên caw he bûn. Me ew çarşef li erdê radixistin û me 'esîta xwe dikir elbê û dianî li ser çarşefan vala dikir bi maleyên textîn rast dikir. Heta ku bastêq zîwa dibûn wisa raxistî diman. Gava ku ziwa dibûn ji bo ku em bastêqê rakin me av dikir nav tiştek û me bi desmala xwe binê çarşefê şîl dikir ji bo ku bi hêsanî were rakirin. Her çarşefek dibû çar felq<sup>(10)</sup>. Ji bo zarakan jî me sempûsek çedîkir. Ji felqên bastêqen büyük re me digot sempûsek. Me du cure meşlûl çedîkir yek meşlûlê sor yekî din jî meşlûlen çalmê ango meşlûlen spî. Me dîsa tiriye xwe dicivand û dixist mehsereyê û dieciqand. Me dîsa şîreya xwe dike-land heta ku kefa wî were, piştî kef girtinê me vala dikir nav du teştan. Me du lître şîreyê re lîtreyek dew dixist nav û qasî kiloyek jî ard dixist nav û herî kêm bi aîkariya deh kesan bi daran diçeliqandin. Heta ku spî dibe. Dîsa me vala dikir nav sîtila ku li ser êgir bû, gûzên ku benve hatîbû kîrin me çend qoran dixist nav 'esîtê û yek bi yek bi wan benênu ku di nav rez de hatîbû vegirtin ve dieli-qand. Hinék zîwa dibûn dîsa me dixist nav 'esîtê bi vî awayî meşlûlen çalmê qalind dibûn. Me dims û kesme jî çedîkirin. Ji bo wan jî me tiriye xwe dicivand. Tirî die-sirand û dida ser êgir heta ku baş qalind dihat kelandin. Paşê dor dihat li ser çekirina kesmeyan. Me dîsa şîre dida ser êgir kefa wî digirt û me hûrikên savarê dixistin nav şîreyê û dikeland. Gerek ew savar pirr baş bi-hata kelandin ji bo wî jî du roj dihat kelandin. Gava ku

(7) Dasa büyük.

(8) Sincok, benî, meşlûr.

(9) Malêz, pelûl.

(10) Perçe.

baş çêdibû, me vala dikir ser du sêniyên sifir û du roj li ser sêniyan diman ji bo ku ziwa bibin. Piştî du rojan me şil dikir ev car li ser oberiyek dihat raxistin ji bo ku baş ziwa bibe û xerab nebe. Piştî çend rojan êdî karê me yê li ser rezan diqediya em vedigeriyan mala xwe. Gava em vedigeriyan malê me oberiya xwe di kîlerê de radixist, me meşlûl, bastêq û kesmeyên xwe dixist nav oberiyê û didan hev ji bo ku şekir bigirin û nerm bimînin. Piştî çend rojan me oberiya xwe vedikir û me didît ku tiştên me şekir girtine, wê carê me dixist nav deneyan <sup>(11)</sup>. Deneyên me yên ji bo meşlûl, bastêx, kesme û qeliyê he bûn. Rengên wan cuda bûn ji bo ku em tevlîhev nekin.

### Çêkirina Qeliyê

Karê dawî çêkirina qeliyê bû. Mezinên malbatê diçûn pezên xwe distendin. Êvarê pezên ku hatibûn stendin dihat serjêkirin. Me godtên xwe hûr dikirin û düşütin. Me dixistin nav çar pênc teştan û me xwê lê direşand ji bo ku godt bê şidandin ku zû bi zû hûr nebe. Em serê sibehê zû radibûn û me du kuçik pê dixistin û me sîtilen xwe didan ser êgir, me godtên ku ji êvarê de hatibû xwêkirin dixistin nav van du sîtilan. Me agirê xwe pêşî sist dikir ji bo ku godtên me hêdî hêdî ava xwe bide

derve. Gava ku dihat nêzî pehtinê mérêne malê bi xwe re çend mérêne taxê dianîn ji bo ku di navrojê de qeliyê bixwin. Gava ku godtên me ava xwe ziwa diqedand me rûnê xwe berdida ser godt û me godtên xwe diqelandin. Heta ku godtên me baş bihatina qelandin me diqelandin heke baş nehatina qelandin godt xerab dibûn. Wê rojê heta êvarê karê qeliyê didomiya. Gava çêkirina qeliyê diqediya me kezeb jî cuda diqelandin. Gava godtên me baş sar dibûn me dixist nav deneyan. Deneyên qeliyê cuda bûn ji bo qeliyan hatibûn amadekirin. Gava karê me yê çêkirina qeliyê jî diqediya êdî em ji bo zivistanê amade dibûn. Gava zivistan dihat şevbûhêrkan jî dest pê dikir. Her şev cîran di malekê de dicivîyan gava cîran dihatin me li ser sêniya sifir tije meşlûl, bastêq, kesme û gûz dikir û dianîn, didan ber mêvanen xwe. Di şevbûhêrkan de kesen ku kilam dizanîn kilam digotin kesen ku kilam nedizanîn jî çirok û meselok vedigotin, şevbûhêrkan me bi kêfxweşî diqedîyan.

**Çavkanî:** Fatma ŞAŞMAZ

**Temen:** 73

**Perwerdehî:** Nexwende


**Herêm:** Licê/Amed

**Sal:** 2015

(11) Kûpêñ mezin ên ji bo parastina bastîq, qelî, dimsê û hwd.



Kelandina Genimî



Mem  
MUKRÎYANÎ

# ÇÎROKÊN NAVLÊKAN<sup>(3)</sup>

**Çolo:** Rojekê ber êvarê dibe teq teq teqq, derî lê dikeve. Yek ji hundir radibe, hema şimikan bi serê lingên xwe dike û diçê derî vedike, lê dinihêre ku gedeyê cîranê wan e. Lawik dibêje: "Gelo hevalê min li malê ye? Ez dixwazim were bi me re bilize." Diya lêwik dinihêre ku gedeyê cîranê wan e, dibêje: "Temam qurbanê. Ez ê jê re bibêjim ku bixwaze bila bê." Bang li gedeyê xwe dike, jê re dibêje hevalê te Casim hatiye, wa ye li ber derî li benda te ye. Lawikê ku navê wî Yilmaz e, ji şûna xwe hiloz dibe û tê ber derî cem hevalê xwe. Dibêje: "Bise-kine ez ê solên xwe pêxim û werim." Casim û Yilmaz hev digirin û diherin qada lîstikê, ciyê ku hevalên wan lê ci-viyane. Bi hatina Yilmaz re kêfxweşîya hevalên wan li ser rûyê wan dibe bisîrîn û şadî. Roj li ber ava ye. Hewa ewr e. Ewrê berfê ye. Hingî ewr daketine xwarê mirov dibêje dê niha berf bibare. Zarok dest bi lîstika xwe dîkin. Bi lîstika çavkîşindorekê dilîzin. Di vê lîstikê de yek ji zarokan, çavên xwe digire û heta sedî bi dengê bilind dijmære. Yê din jî her yek xwe li cihekî vedişêre. Piştî yê ku mak e dibêje; sed, çavên xwe vedike û li der û dor, quncik û koxikan li hevalên xwe yênu ku xwe veşartine digere. Wê gavê jî berf dest pê dike. Hêdî hedî bi hemdê xwe dibare. Her der sipî dibe. Reşayî ne xuya ye. Yilmazê ku wî jî xwe weke hevalên xwe veşartiye, xwe si-partiye deriyê malekê, ber siya dîwêr. Her ku deng tê xwe bêtir bi dîwêr dimelisine. Dinihêre ku xelasîya wî tune ye. Hema ji ciyê xwe dipeke û direve da ku xwe li ciyekî din veşêre. Ji kelecan û sawa girtinê, xwe li ciyên teng û asê diqewimîne. Heta ku derdikeye ciyekî rast. Dinihêre ku ji nav malan dûr ketiye. Berf jî dibare, bûye êvar. Her der tarî ye. Tu nabêjî şev lê digere. Rêya malê û gund wenda dike. Nema dizane ku ew bixwe li ku ye û gund li ku maye. Li dora xwe dihere tê; dike nake ji hev dernaxe. Hema berê xwe dide aliyekî û diçê. Tu nabêjî berê xwe daye aliyê çolê. Saet di ser hev re derbas dibin, hevalên wî diçin li deriyê wan dixin. Dipirsin: "Bê Yilmaz cîma bêyî ku ji me re bibêje ez diçim malê, lê xistiye çûye. Diya Yilmaz'î derdikeye dibêje qey Yilmaz hat malê. Dinihêre ku ew nehatiye, lê hevalên wî li ber derîne. Him Casim him jî diya Yilmaz'î bi hev re bi carekê dibêjin: "Kanî Yilmaz?" Dê dibêje: "Nehatiye malê, ma ne bi we re bû?" Casim jî dibêje: "Ev nêzî du saet e ku ji me qetiyaye û wenda ye. Me got belkî hatibe malê." Îcar him malbat him jî hevalên wî dikevin tatêla Yilmaz'î. Radibin

herkes bi hev re derdikeyin û li nava gund, der û dora gund û newalan belav dibin. Yilmazê ku şev lê geriyye jî, ji aliyekî ji sermayê dike biqefile, ji aliyê din ve jî ji tırsa zûrezûra guran qutifiye. Xwe daye ser hev, bûye weke lepekî. Ga <sup>(1)</sup> diricife ga bi ıskëiskeke nizm digirî. Hingî ku qepiciye, <sup>(2)</sup> sor zepitiye. <sup>(3)</sup> Hêstirênu ku ji kanîka çavên wî diherikin, xwe bera kortika bin mijangên wî yên jêr didin û sar dibin mîna hebênen terezê. <sup>(4)</sup>

Malî li nava gund digerin, ji der û dor û cîranan dipirsin, lê mixabin xebera xêrê nabihîzin. Di nava xwe de bi hev dişêwirin. Gelo dikare biçe ku derê? Yê li nava gund digeriyan jî berê xwe didin çolê, Yilmaz jî ketiye berqefekê <sup>(5)</sup> tahtê ku zêde hukmê berfê lê neyê. Li kêleka berqefâ tahtê qulek devteng û dawîfireh lê he ye. Ji vîzewîza bayê û bapêşê dengê ku ji hundirê quîlê tê Yilmaz nabihîze. Hinekî din dadikeve digihê ber devê quîlê ya ku dawiya wê şikeft e. Piştî ku digihê daldeyê ya ku jê re dibe sitare, dibihîze va ye nûzenûz jî hundirê quîlê tê. Ew nûzenûz ya çêlikên guran bû. Çawa ku bêhna Yilmaz'î digirin bêtir dilebitin. Dêlegura diya wan jî çûye nêçîrê. Haya rebeno jî jê tune ye bê çi diqewime. Çêlikên gurî li hundirê quîlê, dêlegura diya wan a ku dê kengî vegere nediyar e li derive û hewara ku ji bo wî derketiye li çolê lê digire... Yek jî jê re nabe çarenûs, ne bi başî ne bi xerabî da ku ji wî ezabî rizgar bibe û bêhna wî bê ber wî. De û de û de... yênu ku ji gund çûne bi hewara wî de bang lê dîkin: "Yilmaz... ha Yilmazzz kuro tu li ku yî? Ku dengê me hat te, dengê xwe bike. Ku te em bihîstîn bi dengê bilind biqîre." Yênu ku lê digerin carcaran jî di nava xwe de diaxivin. Hinek dibêjin: "Kuro lawo ma karê vî rebenî li vê çola ha çi ye? Çi zû gihîştiye vê derê, van çol û çepelan. Welle gur li vê çolê naqedin." Hin gotin di devê wî de ye, pêjna gurekî tê û didin pey, heta digihê qula ku çêlikên wê lê ne. Nêzîkî quîlê dibin dîsa bang lê dîkin: "Looo Yilmazzz... Kuro tu li ku yî lawooo...?" Ji nişka ve dengek li wan vedigere. Lê jê nayê fêmkirin. Girî û deng tev li hev e. Dîsa dibêjin: "Yilmazzz... Yilmaz dibêje: "Haaa..." Guhê xwe baş didinê bê dengê wî ji ku tê. Yênu ku lê digeriyan hemû kes bi carekê dibêjin: "Bi navê Xwedê dengê wî ji hêla wê zinara beroj tê û gur jî ber bi wir ve çû. Divê em bilezînin da ku gur xwe berî me ne-gîhînê yan na dê wî perçê perçê bike." Dêlegur dike ku bigîhê ber devê quîlê çêlikên wê bêhna wê digirin û nûzenûz bi wan dikeve. Yilmaz çav li dêlegurê dike ji tırsa

(1) Geh

(2) Alîn

(3) Werimîna ji sermayê

(4) Zîpîk an jî teyroka hebmezin.

(5) Ciyê ji şikeftê biçüktir, navbera du zinaran..

saw wî digire û qêrîn pê dikeve. Hewariyên Yilmaz'î jî ji bo ku dêlegur bitirse û xwe nede ser wî dikin holehol û cahrîn<sup>(6)</sup>. Çend derb çifte jî diteqînîn. Lê dîsa jî dêlegur bi qasî werîsek du werîsan xwe berî hewariyên wî digihêne nik wî. Hema devê xwe dixe xenoqa wî. Hewarî çav lê dikinê û derbekê rasterast bera dêlegurê didin. Çi fêde êdî Yilmaz birîndar bibû lê ji mirînê jî xelas bûbû. Wî digirin û bi bayê bezê digihînin nexwêşaneyê. Birîn mirînê wî derman dikin heta çend hefteyan baş dibe. Li ser vê bûyerê heval û maliyên wî jê re dibêjîn: "Kuro ma tu şevreşkî bûbûyi, tu bi çolê ketibûyi. Qey kêfa te pirrr ji çolê tê?" Çoloo çolo û navlêka çolo lê dikinê. Édî ji bilî wan kêliyên ku li cem wî ne pê ve wekî din herkes bi navlêka Çolo qal û behsa wî dikin.

**Ebando:** Ebando mirovekî gavan bû, diçû ber dewaran. Ji xeynîgavantiyê tu karê din nedikir. Li wê herêmê jixwe du gavan hebûn, Her sal qewlê xwe nû dikirin û garan didan ber xwe diçûn ber naxirê. Lê Ebando mirovekî pir sernerm, belengaz û henûn bû. Hişê wî li ser kar û zarokên wî bû. Birrek zarokên wî hebû. Sekin li wan tune bû. Heta êvarê karê kî li ku derê hebûya, destê xwe diavêtin karê wan û alîkariya wan dikirin. Biaqil bûn, dizanîn cih ji xwe re çê bikin.

Sibehêkê Ebando piştî ku dewar li biniya gund berhev dan, ew dan pêşîya xwe û pişta xwe da gund, berê xwe da çiyayêng stargeh û henûn. Gellekî çû heta gîhîst pahnameke xweş, mexelekî bi çêre û palax. Bû xirme xirma wan, dest bi çêre kirin. Ew panava ku him mexel jî bû nézî rezên gundiyan bû. Gundiyekî jî li nava rezê xwe cot dikir, lê haya Ebando jê tune bû. Qederek derbas bû, dewarîn Ebando him têr bûn him jî moz kirin<sup>(7)</sup>. Lota wan hat. Ga lotekê li vir dixin, ga lotekê li wir dixin. Dikevin nava devî û dar û beran. Ebando bi wan çormîş bû. Îmana wî hat serê pozê wî. Xwêdanê di binê lingê wî de avêtibû. Hilkehîlk pê ketibû, bêhn lê çikiyabû. Ji qahra firnikên wî weke yên hespan fişefî bi wan ketibû. Çav lê sor bûbûn û hêstirêñ wî yên bêhemd, weke hebêñ te-rezê bi xwe ber ji kanîka çavêñ wî, li ser hinarîkên rûyê wî nizilîn. Diçû çêlekek dianî ya din diçû. Ya din dianî çend hebêñ din diçûn. Dikir nedikir serî bi wan dernedi-xist. Garana dewaran belawela bûbû. Gavanê belengaz,

darê wî di destê wî de û bi hêrs û pertaveke<sup>(8)</sup> xurt kîjan dewar biketa ber ew dida ber dar û şebotan<sup>(9)</sup>. Ku derê wan di ber biketa av lê venedixwar. Him bi daran li wan dide, him jî nifiran li xwedîyê wan dike û sixêfan<sup>(10)</sup> ji wan dide. Gava ku xeberan ji dewaran dide, cotkarê li nava rez jî guhdengê gavan Ebando ye. Guhê xwe baş pê dirêj kirîye û xwe bixwe dibêje: "Gelo Ebando ci xeberan dide wan."

Ebando jî daye navê. Ci tê devê wî dibêje. Aş û berbajar pê de diçe.

- Hey Xwedê bela xwedîyê we bide.

Hey stûyê we di ber we vebe.

Av negihê devê we.

Pişika we ziwa bibe.

...

...

Hooo, hoooo min di jina xwedîyê we ebandno!

Gava dibêje: "Min di jina xwedîyê we ebandno!" Cotkar dibihîze. Meraq dike. Ebandin ci gotin e gelô? Li ser zimanê wî ye û tê malê. Kê li rê dibîne ji wan dipirse: "Ebandin ci ye?" Kes nizane ku tê ci wateyê. Dibe êvar li benda gavan dimînin. Ku ne ew be kes dê nekare bî bersivîne.

Gavan tê jê dipirsin. Gavan dibersivîne paşê hîna nuh bi ber dikevin ku di ci wateyê de bi kar anîye. Ji ber ku gotineke xerîb e, bi wan gellekî seyr tê. Ji wê rojê û pê de bang lê dikin: "Ha! Ap Ebando..."

Wî jî ji yên ku ji wan hez nedikir re digot: "Ebando bie-bêne ...

**Feth'ê Çilxerz:** Berê fes hebûn mîran dida serê xwe û li dora fesî jî şemil an jî şahrî digerandin. Îcar Feth'ê me yê berî ku bibe çilxerz, ji rojan rojeke Xwedê ji bo qaçaxiyê berê xwe dide binxetê. Li bajarê Şam'ê çav li fesan dike û ji xwe re yekî dikire. Qaçaxa xwe jî bar dike û tê xwe li sînorê serxet û binxetê diqewimîne. Bi elf û du bîlêyan qaçaxa xelas dike, derbasî serxetê dibe. Li gor gotina yên ku wî nas dikin; Feth'ê Çilxerz mirovekî pirr

[6] Qareqar

[7] Têgeha demekê ye ku moz[mêş] bi dewaran vedidin.

[8] Şîyan, hêz

[9] Sîva ter û dirêj.

[10] Çêr

jêhatî û wêrek bû. Dî tayê wî de kêm kes hebûn. Pirr bi xwe bawer û zîrek bû. Dighiye gundê xwe, derbasî hewşa malê dibe. Yênu ku dibihîzin Feth'ê Çilxerz hatiye malê, ji meraqa ku bê ji binxetê ci bi xwe re anîye diherin mala wî. Herkes li bendê ye ku barê xwe veke. Barê xwe datîne, têrr û heqîba xwe vala dike. Tiştên ku bi qaçaxî anîne bera ber yênu ku li dorê civiyane dide. Herkes bi qaçaxa wî bawer e. Dibêjin Mam Feth qaçaxa herî baş diîne. Û li dora tiştik û miştikên ku anîye cilwazkan<sup>(11)</sup> didin. Pêdiviya kê bi ci he ye çav li wê digerîne. Çavên gişa li buxçikên Mam Feth'î maye. Hîn were fes bi ber çavên wan dikeve. Fes jî fese haaaa...

Ji wan kirîdarên ku ji cîran û şenîyên derdorê pêk tê yekî ji wan ku li dor heftê û pênc salî ye, destê xwe dirêjî fesî dike. Çavên wî bel, guhêن wî mîc in. Di ber xwe de gîrvedibe û bi bisirîn radihêje fesî. Dike ku bide serê xwe, Mam Feth xwe çeng dike û hişk bi zenda destê wî digire û dibêje: "Bisekin... ! Ev fes ne ji bo firotinê ye û ne yê serê te ye." Extiyarê me di şûna xwe de sar dibe. Behitî û heyirî maye. Çavên wî çûne nava serê wî û zîq li Mam Feth'î dinihêre. Dibêje: "Mam Feth bi gora bavê te min çawa çav lê kir hema bêhemd kêfa min jê hat, lê tu dibêji qey min xwariye. Ma wî fesê di destê te de malê dînyayê ye ku te wiha dilê min hîst." Mam Feth di ber xwe de digirnije û dibêje: "Lawo tu jî dizanî ku ji te ne çêtir e, lê min ew fesa ji bo xwe kiriye. Lewma ez nax-

wazim ji xeynî min kes bide serê xwe, lê ez dikarim ji te re qala vî fesî bikim. Ev fes, min li Şam'ê kirî. Fes ji cawê qedîfe hatiye dirûtin. Ev kêlén li kêleka fesî bi destan hatine avêtin û bi derziya hûr hatine qûnderzkirin. Van gulik û rêsîyên li derdora fesî yet bi yek bi destan hatine honandin. Ji her rêsîyeke ku li derdora fesî hatiye honandin û bi ser pêçavka fesî diherike re xerz tê gotin. Îcar li derdora vî fesî cil heb ji van xerzan he ye. Ji vî fesî re jî dibêjin fesê cilxerz. Fesê cilxerz belkî tu nizanî lê kesên weke sultan, xwedî erk û dewlemend didin serê xwe. Buhayê vî fesî pirr zêde ye. Hema tu dikarî bibêji ku bi qasî buhayê hemû qaçaxa min e. Encax ev fesa li gor serê min e. Yekî mîna min dikare bide serê xwe. Ma çiyê min ji sultan û dewlemandan kêm e? Yek ji wan na-gîhê neynûka min. Ez bi keda xwe ya helal, bi xwêdana eniya xwe vî diravî kar dikim, pê dikirim û didim serê xwe, lê sultan û dewlemendên ku vî fesî didin serê xwe wê hebûna xwe ji ku derê tînin? Ew hemû diravê ku pê hirbiqîyan û seyranê dîkin yê me belengaz, feqîr û fiqarayan e. Ew jî keda me dixwin, pê kîfa xwe dîkin. Yê wan heram e." Mam Feth fesê xwe digire, bi nazikî dide serê xwe û dibêje: "Ji niha û pê de êdî ez jî Feth'ê Çilxerz im. Ma dê qiyamet rabe? Êdî ji min re bibêjin Feth'ê Çilxerz. Ji wê rojê û şûnde ji ber Mam Feth'î bi xwe ev navlêka li xwe kiriye, xwestiye herkes jê re bibêje Feth'ê Çilxerz. Û bi wî awayî gîhiştiye heta roja me.




(11) Lotik

(12) Xaîîçe

(13) Banê kevir

# XACEPIRSA BAJERÊN KURDISTANË

Ronya Bewran



## Ji Çepê Ber Bi Rastê

3. Bi sükâ Cihûyan û bi mizgefta bi navê Umer navdar e.
4. Dîroka Kurdên Feyli ji şaristaniya vî bajarî dest pê dike. Bi Kelhûrî dipeyîvin.
6. Di 22'ye Çileya 1946'an de li vî bajarî li qada Çarcırayê komarek hat avakirin. Serokê vê komarê Qazî Mihemed'ê nemir bû.
7. Bi taxâ xwe ya dirokî ya bi navê Bostan navdar e. Li ser kevirên vê taxê nîşaneyen Ahura Mazda, Mîtra, Şapûrê Yekem, Şapûrê Duyem hwd. he ne.
9. Qesra İshaq Paşa li vê derê ye. Di nava salên 1926 û 1930'ı de serhildaneke bi rîberîtya Xoybûnê ku İhsan Nûri Paşa jî tê de bû, pêk hat.
11. Bajarê Xelî Brahem e. Tê de Gola Xelilürehman he ye. Bi isota xwe navdar e. Xerawreska di cihanê de bi diroka xwe navdar li vî bajarî ye.
13. wek Bajarê Nûh tê nasandin. Bi Çiyayê xwe yên Cûdi û Gabarê navdar e.
14. Navê vî bajarî bi zimanê Îbrankî tê wateya "erdîn avîn". Laleya xwe gellek delai e û navdar e. Çanda Asûriyan di xwe de dihewine. Wek Dengbêj Rese gellek dengbêjén vî bajarî he ne. Medreseye Oxînê li vî bajarî ye.
17. Di diroka Kurdistanê de bi berxwedana xwe dişibe Stalingrad'ê. Li Rojavayê welêt e.
18. Gora Şemsê Tebrîz li vî bajarî ye. Kurd û Ecem tê de dijin. Bazırganî pêşkeli ye.
19. Navê vî bajarî yê din Xerpêt e.
20. Bi Şerava Suryanî navdar e. Mîmariya xwe ya bi kevirên neqîşandî hêjâyî ditinê ye. Gellek çand û gelên rengin di vî bajarî de dijin.
23. Ev bajarê me yê dirokî di navbera salên 929 û 961' de paytexta Keyatîya Begrâfi ya Ermenan bû. Şopa Mîmariya Rûsan jî li vî bajarî tê xuyakirin.
27. Bi mismiş û sêvîn xwe navdar e. Siyasetmedar, wergér, nivîskar, bijîk Abdullah Cevdet jî vî bajarî ye.
29. Çiyayê Çarçela li Ava Shin li vê derê ye. Keledoş xwarina xwe ya navdar e. Kullika Guldexwîn nîşana vî bajarî ye.
30. Li vî bajarî di 12'ê Adara 2004'an de bi mehnaya fitbolê alîgîren rejîma Baas'ê êrif birin ser Kurdan û şer mezin bû û serhildana Kurdan li bajarén din jî belav bû.
32. Têkoşîna li diji El-Nûrsayê li vî bajarî dest pê kir. Li Rojavayê Welêt e.
34. Çiyayê Nemrûdê ya Kraterê li vî bajarî ye. Mele Selîm'ê ku di hereketa 1913'an de serîkî kiriye jî vî bajarî ye. Xwarina xwe ya navdar "avşor" e.
37. Zeûgma li vî bajarî hat ditin. Paytexta fistiqan e.
38. Navê xwe yê din Kanî Dara ye. Bi Şewata Sinemayê tê nasandin. Gellek helbetvanê navdar, ku Ehmed Huseynî, Helim Yusîv, Abdulkadir Musa, İsmail Küsa, Nezîr Melle, Yûnis Hakim û Joseph Hemîjî li vî bajarî ne.
40. Gola heri mezin a Kurdistanê li vî bajarî ye. Feqiyê Teyranê gewre jî vê derê ye.
41. Dora vî bajarî bi birc û bedenan hatiye pêçandin. Bîrcen vî bajarî di sala 2015'an de ket listeya mîrata UNESCO'yê. Zebraşa xwe navdar e.
44. Li Başûrê Kurdistanê bajarê heri mezin e. Li vî bajarî peykerî Şerefşanê Bedîsi hatiye çekirin.
45. Bajarê diplomatik yê Başûrê Kurdistanê ye. Li devê vî bajarî ji bo Şehîden Enfalê bîrdarıya Enfalê hatiye çekirin.

## Ji Jor Ber Bi Jêr

1. Bi Bazara xwe ya Haj Omer navdar e.
2. "Ku dil dilber be nexwe dilber kî ye Eger dilber dil be, navê dil ci ye Ez dil û dilber tevhîv dibînim Nizanîm ku dil kî ye dilber kî ye" Baba Tahîrê Uryan li vî bajarê Rojhîlatê Kurdistanê çêbûye.
5. Li herêma Serhêde ye. Li ser sînorê Ermenîstan û Azerbaycan'ê ye.
7. Bi petrola xwe navdar e. Li ser berava Çemî Dicleyê ye. Ev bajar, li kîleka Bajarê Çaxa Kevn Nînovâ'yê ye. Di sala 2014'an de piştî ku Mûsil ket destê DAIS'ê xetere hebû ku ev bajar jî bikeve destê wê, herwîha kurdan di warê leşkerî û rîvebirîyê de bajar bî temamî xistin bin kontrola xwe.
8. Derhîner Bahman Ghobadi û niviskar İbrahim Yusîv jî vî bajarî ne. Li rojhîlatê Kurdistanê.
10. Şaredarîya vî bajarî û Şaredarîya Wanê du şaredarîyen hevalbend û hevkar in. Di navbera Zaxo, Şêxan û Hewlîrê de ye. Bajareki giring ê Badîne ye.
12. Xwezaya xwe gellek balkêş û resen e. Her çar alyîn vî bajarî kendal in, li ser girekê ye. Mizgefta xwe gellek navdar e. Jî Çelê'ya Colemêngê tê xuyakirin.
15. Ev bajar navenda kaşûnê ye. Bajarê tûrzmê ye. Bi toraka xwe ya kufîk navdar e.
16. Di 16'ê Adara 1988'an de bombeyên gaza kimyewî bi ser vî bajarî de hatin barandin. Ji pênc hezâr zedetir Kurd hatin qetîkirin. Bêhna sêvî bû nîşaneyâ vê komkujiyê.
21. Bi dendikên xwe yên zebeşan û bi petrola xwe navdar e. Li Herêma Xerzanê ye.
22. Bajarê herî mezin û Zazayan e. Bi hemamên xwe û zozanên xwe navdar e. Çiyayê Şerefdinê li vî bajarî ye.
24. Koma Kamkaran a Muzîkî li vî bajarî dest bi xebatên xwe yên huneri kir.
25. Eziz Xan Mukîjî li vî bajarî ye.
26. Gola Nemrûdê ya Kraterê li vî bajarî ye. Mele Selîm'ê ku di hereketa 1913'an de serîkî kiriye jî vî bajarî ye. Xwarina xwe ya navdar "avşor" e.
28. Li quncîk welêt e. Zeytûnê vî bajarî gellek navdar in.
31. Bi feqî û medreseyên xwe navdar e. Çiyayê Herekol û Çemî Botan li vî bajarî ye. Xwarina xwe ya Parêvê (Buryan) û fistiqên xwe gellek xwes e.
33. Ev bajar li ser xeta Gurcistanê ye. Gola Çildare'yê li vî bajarî ye. Li hêla jîrin yê serhêde ye.
35. Di sala 1939'an de li vî bajarî erdhêjek gellek tund qewimî. Bi deh hezaran kesan jiyana xwe ji dest da. Ji ber vê erdhêjê ciyê bajarî hat guherlin.
36. Gola vî bajarê Kurdistanê di cihanê de duyem gola herî mezin ya xwê ye. Ü her ku diçe ziwa dibe. Ji alyî UNESCO'yê ve ketîye nava Rezerven Biyosfer û tê parastin.
39. Gola Zirêwar li vî bajarî ye. Xwezaya xwe gellek delai e.
42. Di 28'ê Hezîrana 1987'an de, di şerî İrak û Iranê de ji alyî rejîma Baas'ê ve rastî êrişâ kimyewî hat. Nivîskar û derhîner Qutbettîn Sadîqî di 28. salvergea vê komkujiyê de li Qada Serçawa'yê bi navê "Bê te başîr" şanoyek amade kir.
43. Ji alyî petrolê ve dewlemend e. Bi Pira Bafe navdar e. Navê xwe ji dîrê girtiye.

# BERSİVDANK

Ronya Bewran



